



**K.T.**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê**

**Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê**

**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**HEVALNAV DI NAVBERA ZIMANÊ KURDÎ  
(KURMANCIYA SERÎ) Û TIRKÎ DA**

**Berqee Taher Bazid**

**14711043**

**Şewirmend**

**Doç. Dr. Tahirhan AYDIN**

**Mêrdîn-2017**



**K.T.**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê**

**Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê**

**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**HEVALNAV DI NAVBERA ZIMANÊ KURDÎ  
(KURMANCIYA SERÎ) Û TIRKÎ DA**

**Berqee Taher Bazid**

**14711043**

**Şewîrmend**

**Doç. Dr. Tahirhan AYDIN**

**Mêrdîn-2017**

## TAAHHÜTNAME

### TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “HEVALNAV DI NAVBERA ZIMANÊ KURDÎ (KURMANCIYA SERÎ) Û TIRKÎ DA” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüteder, tezimin / projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisans üstü Eğitim – Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin / Projemin tamamı her yerdenerişime açılabilir.

Tezim / Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin / Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin / projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

20 / 7 / 2017

Berqee Taher Bazid

**JI BO RÊVEBERIYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYÊYÊ**

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Make zanista Ziman û Çandê de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok: Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

(îmze)

Endam: Yar. Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

(îmze)

Endam: Doç. Dr. Tahirhan AYDIN

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorînên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmze

Yrd. Doç. Dr. Memet Nesim DORU

Serokê Enstîtuya Zimanên Zîndî Yên Li Tirkîyeyê

(Mor)

## DIYARÎ

**Bo:**

- Dayk û bab, bira, kes û kar û hevalên min.
- Her kesekê xem ji zimanê Kurdî xarî û bixwet.
- Hemî hevalên harîkariya min kirî.
- Mamosta Nijyar Idrîs
- Dr. Tahirxan Aydın



## **SUPASNAME**

**Supas Bo:**

- **Malbata min ku harîkar bûne ji layê darayî, rohî û canî ve.**
- **Her mamostayekî wane daye min, bi taybet mamostayên wanên xandina masterê dayîn.**
- **Mamosta Nijyar Idrîs**
- **Wan hevalên pêdaçûna rastnivîsê tezê kirî.**
- **Dr. Tahirxan Aydın ku bi erkê şewermendiyê rabûy.**
- **Karmendên Pertokxana Adab û Binyatê li Zankoya Duhokê.**

## NAVEROK

DIYARÎ.....	III
SUPASNAME .....	IV
KURTE .....	VIII
ÖZET .....	IX
ABSTRACT.....	X
ملخص البحث.....	XI
KURTEBÊJE .....	XII
DESTPÊK .....	1
DERAZÎNK .....	3
PIŞKA ÊKÊ .....	7
HEVALNAV DI ZIMANÊ KURDÎ DA .....	7
1. Pênasa Hevalnavî .....	8
2. Cureyên Hevalnavî ji Layê Hebûnê ve .....	9
2. 1. Hevalnav ji Layê Watayê ve .....	9
2. 1. 1. Hevalnavên Çewayî (Wesfîn) .....	9
2. 1. 2. Hevalnavên Nîşaneyî .....	13
2. 1. 3. Hevalnavên Pirsyariyê .....	16
2. 1. 4. Hevalnavên Nediariyê .....	20
2. 1. 5. Hevalnavên Jimareyî .....	21
2. 1. 6. Hevalnavên Nisbî (Rêjeyî) .....	26
2. 1. 7. Hevalnavên Karî (Awelnavî Firmanî) .....	28
2. 2. Hevalnav ji Layê Binyadê (Pêkhatin) ve .....	34
2. 2. 1. Hevalnavên Sade (Xweru) .....	34
2. 2. 2. Hevalnavên Darêjtî .....	34
2. 2. 3. Hevalnavên Lêkdayî .....	48
2. 3. Hevalnav ji Layê Pileyê ve .....	51
2. 3. 1. Pileya Hevalnavên Taybet .....	51
2. 3. 2. Pileya Hevalnavên Hevberkirinê .....	51
2. 3. 3. Pileya Hevalnavên Bala .....	53
3. Biçûkkirina Hevalnavan.....	55
4. Xortkirina Hevalnavan .....	56

5. Bikarîna Hevalnavanî Wekî Nav.....	57
6. Erkê Hevalnavî di Ristê da.....	58
6. 1. Hevalnav Dibine Diyarkerên Navî.....	58
6. 2. Hevalnav Dibine Diyarkerên Cihnavî.....	59
6. 3. Hevalnav Dibine Diyarkerên Karên Bêhêz.....	60
PIŞKA DUWÊ.....	62
HEVALNAV DI ZIMANÊ TIRKÎ DA.....	62
1. Pênasa Hevalnavî (Ön ad- Önad) Sıfat.....	62
2. Cureyên Hevalnavî ji Layê Hebûnê ve (Varlıklar Açısından Sıfat Çeşitleri).....	62
2. 1. Hevalnav ji Layê Watayê ve (Anlam Açısından Sıfat).....	63
2. 1. 1. Hevalnavên Çewayî (Niteleme Sıfatları).....	63
2. 1. 2. Hevalnavên Diyarker (Belirtme Sıfatları).....	66
2. 1. 2. 1. Hevalnavên Nişaneyî (İşaret Sıfatları).....	67
2. 1. 2. 2. Hevalnavên Pirsyariyê (Soru Sıfatları).....	71
2. 1. 2. 3. Hevalnavên Nedyariyê (Belirsizlik Sıfatları).....	74
2. 1. 2. 4. Hevalnavên Jimareyî (Sayı Sıfatları).....	78
2. 2. Hevalnav ji Layê Binyadê (Pêkhatin) ve (Yapıları Bakımdan Sıfatlar).....	85
2. 2. 1. Hevalnavên Sade (Yalın-Basit Sıfatlar).....	85
2. 2. 2. Hevalnavên Darêjtî (Türemiş Sıfatlar).....	85
2. 2. 3. Hevalnavên Lêkdayî (Birleşik Sıfatlar).....	90
2. 3. Hevalnav ji Layê Pileyê ve (Sıfatları Derecelendirme).....	93
2. 3. 1. Pileya Hevalnavên Taybet (Derecesiz Sıfatlar).....	94
2. 3. 2. Pileya Hevalnavên Wekheviyê (Eşitlik Derecesi).....	94
2. 3. 3. Pileya Hevalnavên Hevberkirinê (Beriztiriyê) (Üstünlük Derecesi).....	96
2. 3. 4. Pileya Hevalnavên Bala (En Üstünlük Derecesi).....	97
2. 3. 5. Pileya Hevalnavên Zêdeyîyê (Aşırılık Derecesi).....	99
3. Biçûkkirina Hevalnavan (Küçültme Sıfatları).....	100
4. Xortkirina Hevalnavan (Pekiştirme Sıfatları).....	103
5. Hevalnavên Navdariyê (Nav û Nişan) (San, Unvan Sıfatlar).....	108
6. Bikarîna Hevalnavan li Cihê Navî (Sıfatların Ad Yerine Kullanılması).....	109
7. Erkê Hevalnavî di Ristê da (Cümle İçinde Sıfatın Görevleri).....	110
8. Hevalnavên Karî (Sıfat-Filler, Ortaçlar).....	113



PIŞKA SÊYÊ	120
HEMBERKIRINA HEVALNAVÎ DI NAVBERA ZIMANÊ KURDÎ	
KURMANCIYA SERÎ Û TIRKÎ DA	120
1. Pênaseyên Hevalnavî di Kurdî û Tirkî da	121
2. Cureyên Hevalnavan ji Layê Hebûnê ve	122
2. 1. Hevalnav ji Layê Watayê ve	122
2. 1. 1. Hevalnavên Çewayî	122
2. 1. 2. Hevalnavên Nişaneyî	125
2. 1. 3. Hevalnavên Pirsyariyê	128
2. 1. 4. Hevalnavên Nediariyê	129
2. 1. 5. Hevalnavên Jimareyî	131
2. 1. 6. Hevalnavên Nisbî (Rêjeyî)	138
2. 1. 7. Hevalnavên Karî	139
2. 2. Hevalnav ji Layê Binyadê (Pêkhatinê) ve	143
2. 2. 1. Hevalnavên Sade (Xweru)	143
2. 2. 2. Hevalnavên Darêjtî	144
2. 2. 3. Hevalnavên Lêkdayî	146
2. 3. Hevalnav ji Layê Pileyê ve	146
2. 3. 1. Pileya Hevalnavên Taybet	147
2. 3. 2. Pileya Hevalnavên Hevberkirinê	147
2. 3. 3. Pileya Hevalnavên Bala	148
3. 4. Hevalnavên Wekheviyê	149
2. 3. 5. Hevalnavên Pileya Zêdeyiyê	150
3. Biçûkkirina Hevalnavan	151
4. Xortkirina Hevalnavan	151
5. Hevalnavên Navdariyê	153
6. Bikarînana Hevalnavan Wekî Nav	154
7. Erkê Hevalnavî di Ristê da	155
7. 1. Diyarkerên Navî	155
7. 2. Diyarkerên Cihnavî	156
7. 3. Diyarkerên Karên Bêhêz	156
7. 4. Dibîte Diyarkiryên Navî	156

7. 5. Dibête pëveber .....	157
ENCAM .....	159
ÇAVKANÎ .....	162



## KURTE

“Hevalnav Di Navbera Zimanê Kurdî (Kurmanciya Serî) Û Tirkî Da.”

Ev vekolîne bi nav û nîşanê (Hevalnav di Navbera Zimanê Kurdî (Kurmanciya Serî) û Tirkî daye, li dîv rêbaza hemberî hatiye encamdan. Ev vekolîne ji bilî destpêk, derazînk û encaman sê pişikan bi xove digirt:

**Pişka Êkê:** Di vê pişkê da ku ya taybete bi zimanê kurdî ve behsê van teweran hatiye kirin: (pênasa hevalnavî, cureyên hevalnavî ji layê watayê ve, ji layê binyadê ve, pileyên hevalnavî, biçûkkirina hevalnavî, xortkirina hevalnavî, bikarînanana hevalnavî wekî nav û her wesana erkê hevalnavî di ristê da.

**Pişka Duwê:** Di vê pişkê da ku ya taybete bi zimanê tirkî ve behsê van teweran hatiye kirin: (pênasa hevalnavî, cureyên hevalnavî ji layê watayê ve, ji layê binyadê ve, pileyên hevalnavî, biçûkkirina hevalnavî, xortkirina hevalnavî, hevalnavên navdariyê, bikarînanana hevalnavî li cihê navî, erkê hevalnavî di ristê da û her wesana hevalnavên karî.

**Pişka Sêyê:** Di vê pişkê da hemberî ya hatiye kirin di navbera hevalnavî di her du zimanan da li dîv pişka êkê û pişka duwê ji vê namê, ew xalên wekî êk û xalên jêk cuda di her du zimanan da hatîne berçavkirin.

Di vê vekolînê da me bizav kiriye hemberiya hevalnavî di navbera zimanê kurdî û tirkî da bikeyn û çend encamekên girîng dest nîşan bikeyn.

**Peyvên Sereke:** Kurdî, Tirkî, Hevalnav, Riste, Berawird.

## ÖZET

"Kürtçe (Kurmanci Lehcesi) ve Türkçe Sıfatların Karşılaştırılması"

Bu çalışma karşılaştırmalı metodla yapılmıştır; Başlangıç, Giriş ve Sonuç haricinde üç bölümden oluşmaktadır.

Birinci Bölüm: Bu bölüm özellikle kürtçe ile ilgilidir, şu konuları içermektedir: Sıfatın tanımı, Anlam bakımından sıfat türleri, Yapı bakımından sıfatlar, Sıfatların derecelendirilmesi, Sıfatların küçültülmesi ve pekiştirilmesi, Sıfatların isim olarak kullanımı ve ayrıca Sıfatların cümledeki görevi.

İkinci Bölüm: Bu bölüm özellikle türkçe ile ilgilidir, şu konuları içermektedir: Sıfatın tanımı ve anlam bakımından sıfat türleri, Yapı bakımından sıfat türleri, Sıfatların derecelendirilmesi, Sıfatların küçültülmesi ve pekiştirilmesi, Ünvan sıfatları, Sıfatların isim yerine kullanımı, Sıfatların cümle içindeki görevi ve Sıfat-fiiller.

Üçüncü Bölüm: Bu bölümde birinci bölüm ve ikinci bölümde bahsedilen iki dildeki sıfatlar, her iki dildeki benzer ve farklı noktalar karşılaştırılmıştır.

Sonuç olarak bu çalışmada Türkçe ve Kürtçe sıfatların karşılaştırmasını yaptık ve birkaç önemli noktayı açığa çıkarmaya gayret ettik.

**Anahtar Kelimeler:** Kürtçe, Türkçe, Sıfat, Cümle, Karşılaştırma.

## ABSTRACT

"The Comparison between Kurdish (Kurmanj Dialect) and Turkish Adjectives"

In this study, comparative method was used. It was comprised of three parts together with the Introduction, preface and Conclusion.

First Part: This part focused on Kurdish which was included: The definition of Adjectives, adjectives in terms of meaning, adjectives in terms of structure, comparative and superlatives, personal titles as adjectives, the use of adjectives instead of nouns, the use of adjectives as nouns and function of adjectives in the sentence.

Second part: This part focused on Turkish which was included: The definition of adjectives, adjectives in terms of meaning, adjectives in terms of structure, comparative and superlatives, personal titles as adjectives, the use of adjectives instead of nouns, function of adjectives in the sentence and participles.

Third part: In this part, the adjectives in the two languages, which were given in two parts, were compared in terms of their same as well as different points.

In this study, we tried to compare Turkish and Kurdish adjectives and clarify some important points.

**Key words:** Kurdish, Turkish, Adjective, Sentence, Comparison.

## ملخص البحث

الصفة ما بين اللغة الكردية (الكرمانجية الشمالية) و اللغة التركية.

هذه الدراسة الموسومة بالعنوان (الصفة ما بين اللغة الكردية (الكرمانجية الشمالية) و اللغة التركية) نفذت وراء دراسة تقابلية و هذه الدراسة يتضمن ثلاثة اقسام عدا المقدمة، المدخل و الأهداف.

**القسم الأول:** في هذا الجزء المختص باللغة الكردية، يبحث عن هذه المواضيع. تعريف الصفة و انواعها من ناحية المعنى، ومن الناحية البنيوية، و درجات الصفة، تصغير الصفة، تقوية الصفة باستعمال الصفة مثل الاسم و مهمة الصفة في الجملة.

**القسم الثاني:** في هذا الجزء المختص باللغة التركية، تم دراسة هذه المواضيع (تعريف الصفة و انواع الصفة من حيث المعنى و البنية و درجات الصفة و تصغيرها و تقوية الصفة و صفة الشهرة و استعمال الصفة في مكان الاسم و مهمة الصفة في الجملة و صفة الفعل).

**القسم الثالث:** في هذا القسم تم المقارنة بين الصفة في اللغتين نحو القسم الأول و القسم الثاني في هذه الدراسة. النقاط المشتركة و المختلفة تم درستها في كلا اللغتين التركية و الكردية.

في هذه الدراسة حاولنا المقارنة بين اللغتين التركية و الكوردية و بيان عدد من الأهداف المهمة.

**الكلمات المفاتيح:** كوردي، تركي، صفة، جملة و مقارنة.

## KURTEBÊJE

<b>hwd.:</b>	Her wekî din
<b>v.b.:</b>	Ve benzeri
<b>h. b. d.:</b>	Hevalnavên bikerê darêjtî
<b>h. b. l.:</b>	Hevalnavên bikerê lêkdayî
<b>h. k. d.:</b>	Hevalnavên kirawê darêjtî
<b>h. k. l.:</b>	Hevalnavên kirawê lêkdayî
<b>h. d.:</b>	Hevalnavên darêjtî
<b>r.:</b>	Ropel
<b>j.:</b>	jimare
<b>h. b.:</b>	Heman berhem
<b>h. c.:</b>	Heman cih
<b>TDK.:</b>	Türk Dil Kurumu (Saziya Zimanê Tirkî)
<b>K. T.:</b>	Komara Tirkiyeyê
<b>T. C.:</b>	Türkiye Cumhuriyeti (Komara Tirkiyeyê)

# DESTPÊK





## DESTPÊK

Di vê vekolîna bi nav û nîşanê “Hevalnav di Navbera Zimanê Kurdî (Kurmanciya Serî) û zimanê Tirkî” da, taybet devoka bahdînan. Me behsê hemberkirina hevalnavî di navbera zimanê kurdî û Tirkî da kiriye. Nimûneyên zimanê tirkî ji çavkaniyan hatîne wergirtin û yên zimanê kurdî ji axaftina devoka behdînan hatîne wergirtin .

Ev vekolîn li dîv rêbaza hemberî ku hemberkirina hevalnavî di nav bera zimanê kurdî (kurmanciya serî) û zimanê tirkî da hatiye encamdan.

Heta niha ew namên akadîmî yên master û dîktorayê bi giştî li ser rêzimana kurdî bi şeweyekê berfireh di zimanê kurdî da bi kurmanciya xwarê hatîne pêşkêşkirin, lê belê eger em berawird bikeyn digel kurmanciya serî û devoka behdînan karê ekadîmî bi kêmî li ser vê diyalêktê hatiyekirin. Nexasim hemberkirina vê diyalêkta zimanê kurdî digel zimanên cuda yên dewr û ber bi taybetî zimanê tirkî.

Rêbaza hemberkirina zimanan di karên ekadîmî da ne wekî karên dîn e. Bi giştî dema mirov di pertokan da dibînît du ziman yan du zarav hemberî êk kirîn ji bo wê çendêye ku mirov pitir fêrî zimanê dîtir yan zaravê dîtir bibît, lê belê di karên ekadîmî da hemberkirina du zimanan yan zaravan bo wê çendê ye ku ew cudahî û wekhevîyên di her du zimanan da heyn bihêne aşkirakirin û di encamî da amaje bi wan xalên cuda û wekî êk dihêne dan. Hejiye bêjîn ku ev her du zimane jî ne ser bi êk xêzn vene.

Me bizav kiriye di vê vekolînê da hemberkirina hevalnavî di navbera zimanê kurdî (kurmanciya serî) taybet devoka behdînan û zimanê tirkî da layenên wekhev û yên cuda diyar û aşkira bikeyn.

Helbet her karekê mirov dest bo bibet nexasim karekê akadîmî bît hindek asteng dikeve pêşya mirovî da. Bi destêxistina çavkaniyên tirkî. pertokên rêzimanî yên zimanê kurdî (kurmanciya serî) bi giştî û devoka bahdînî bi taybetî çî bi tîpên aramî yan jî latînî weku pidvî bi dest min nekeftîne, ji ber ku gelek kar li ser rêzimana kurmanciya serî bi taybetî bahdînî nehatîne kirin.

Evê vekolînê ji bilî destpêk û encaman sê pişik bi xwe ve girtîne:

**Pişka Êkê:** Ev pişk ya taybete bi zimanê kurdî (kurmanciya serî). Di vê pişkê da behsa van teweran hatiye kirin: pênasa hevalnavî, cureyên hevalnavî ji layê watayê ve, cureyên hevalnavî ji layê binyadê ve, pileyên hevalnavî, biçûkkirina hevalnavî, xortkirina hevalnavî, bikarîna hevalnavî wekî nav û her wesana erkê hevalnavî di ristê da.

**Pişka Duwê:** Ev pişk ya taybete bi zimanê tirkî ve. Di vê pişkê da behsa van teweran hatiye kirin: (pênasa hevalnavî, cureyên hevalnavî ji layê watayê ve, ji layê binyadê ve, pileyên hevalnavî, biçûkkirina hevalnavî, xortkirina hevalnavî, hevalnavên navdariyê, bikarîna hevalnavî li cihê navî, erkê hevalnavî di ristê da û her wesana hevalnavên karî.

**Pişka Sêyê:** Di vê pişkê da me hemberiya kirî di navbera hevalnavî di her du zimanan da li dîv pişkê êkê û pişkê duwê ji vê namê, ew xalên weko êk û xalên jêk cuda di her du zimanan da hatîne berçavkirin.

Di vê vekolînê da me bizav kiriye hemberiya hevalnavî di navbera zimanê kurdî û tirkî da bikeyn û çend encamekên giring dest nîşan bikeyn.

**Peyvên Sereke:** Kurdî, Tirkî, Hevalnav, Sîfat, Riste, Berawird.

## DERAZÎNK

Weku ya diyar rêziman layenekê zor giring e di her zimanekî da, her zimanek ji komeka yasa û desturan pêk dihêt. Sereray wê çendê ku her zimanekî yasayên taybet bi xwe ve jî hene, lê belê digel zimanekê dîtir hemberî bihête kirin xalên wekhev û cuda dê hebin. Zimanvanên nû zimanvaniyê bi ser du pişkên serekî dabeş diken û her pişkek ji wan bi ser çend liqên dî yên zimanvanî da dabeş diken:

**Pişka êkê:** Bi zimanvaniya tîyorî (Theoretical Linguistics) nav diken, ku bi zimanvaniya giştî (General Linguistics) dihête niyasîn, ku ev pişka zimanî vekolîneka tîyorî bi şêwaz û ravekirineka zanistî li ser astên zimanî diketin. Armancên wê pêşvebirina şêwaz û bi zanistîkirina zimanî ye ji bo dest ve înana encamên hûrên zimanvaniyê.<sup>1</sup>

**Pişka duwê:** zimanvaniya piraktîkî ye (Applied Linguistics) ku zimanvaniya derûnî (Psycholinguistics) ew biwarên peywendî bi zimanvaniya derûnî ve heyn weku pirosa wergirtina zimanî, çî zimanê dayk yan zimanê duwê û ew fakterên kartêkirinê li vê wergirtinê diken weku fakterên baylocî, derûnî û çivakî bi xwe ve digrît. Her wesana vekolînên zimanî yên peywendî bi kêmasî û nexoşiyên dirkandinê ve hey û zimanvaniya civakî eva ku vekolînê li kartêkirina di navsbera zimanî û civakî û çînen komelayetî û vekolîna şêwezara û cografiya zimanvanî...htd bi xwe ve digrît. Zimanvaniya hemberî êke ji ber çavtirîn liqên zimanvaniya piraktîkî, ev liqê zimanvanî mifay ji gelek liqên her du pişkên zimanvanî werdigrît<sup>2</sup>.

Serheldana mêjoya zimanvaniya hemberî bo serdemê şerê duwê yê cîhanî dizivrît, lê belê eve wê çendê nagehînît ku berî vî serdemî çî vekolîn nebîne. Mêjoya serheldana zimanvaniya hemberî bo serdemê şerê duwê yê cîhanî (1939 – 1945) vedigerît, ku di vî serdemî da pêwîstiyeka baş bo fêrbûna zimanên biyanî hebû li ser binemayekê zanistî, bo vê meremê astengên mezin keftine ber singê wan

---

<sup>1</sup>el Bedrawî Zehran, *fî Ilim el Loxe el Teqabilî*, Çapa Êkê, Çapxana Dar el Afaq el Erebiye, 2008, el Qahîre, r. 7-9.

<sup>2</sup>hc.

kesên xwe fêrî zimanên biyanî diken. Di vê pêvejoyê da hizra vî zanistê zimanvanî weku pişkek ji zimanvaniya nû hate pêş, paş rê û rêbazên curawcur bo hatine danan<sup>1</sup>.

Zimanvanî jî ew zaniste yê vekolînê li ser zimanî diket. Zimanvaniya hemberî berhemekê gehiştî yê zimanvaniya nû ye, yê rêbaza vekolînên wesfî (Descriptive Linguistics) derkeftî, evro vekolînên hemberî şîkarî mifayekê mezin di biwarên curawcur da dibexşît, bo nimûne mifayekê mezin di biwarê wergeranê da heye çonkî wergeranê ji zimanekî bo zimanekê biyanî pêdvî bi zanyariyên baş heye li ser binemayên her du zimanan, zimanvaniya hemberî dibîte harîkarekê baş bo mebesta wergeranê<sup>2</sup>. Eve jî ya diyare ku biyavê wergeranê mifayekê baş daye çin û tuwêjên xelkî.

Hejiye bêjîn ku zimanvaniya hemberî bi nûtirîn rêbaza zimanvaniya nû dihête hijmartin<sup>3</sup>, û weku pişkek ji zimanvaniya piraktîkî hemberiyê di nav bera du zimanan ya pitir yên du xêzanên ji êk cuda diket, bo diyarkirina layenên wekhev û cuda di navbera her du zimanan da bo mebesta fêrbûn û fêrkirina zimanên biyanî û bi vê çendê rêya fêrbûna zimanên biyanî asan dibît<sup>4</sup>. Bi ramaneka dî zimanvaniya hemberî vekolînê li layenên wekhev û cuda yên zimanê êkê û zimanên biyanî da diket bo mebesta fêrbûn û fêrkirinê<sup>5</sup>.

---

<sup>1</sup>el Bedrawî Zehran, hb., r. 7-9.

<sup>2</sup>hb., r. 9-10.

<sup>3</sup>Menahic Ilim el Loxe el Hedîse, li vî lînkî:

[https://www.google.iq/search?source=hp&q=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&oq=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&gs\\_l=psy-ab.3..0i22i30k1l2.736101.736101.0.741615.1.1.0.0.0.879.879.6-1.1.0....0...1.1.64.psy-ab..0.1.878.fhOcNoUWadY](https://www.google.iq/search?source=hp&q=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&oq=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&gs_l=psy-ab.3..0i22i30k1l2.736101.736101.0.741615.1.1.0.0.0.879.879.6-1.1.0....0...1.1.64.psy-ab..0.1.878.fhOcNoUWadY)

<sup>4</sup>Ebde el Racihî, *Ilim el Loxe el Tetbîqî we Teilîm el Erebiye*, Dar el Meirîfe el Camie, 1995, el Eskenderiye, r. 35.

<sup>5</sup>Yukî Soryadarma, *el Miqarine beyn Ilim el Loxe el Teqabilî we Tehlîl el exta*, li vî lînkî: <https://www.google.iq/search?q=%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AA%D9%82%D8%A7%D8%A8%D9%84%D9%8A&oq=%D8%B9%D9%84%D9%85&aqs=chrome.2.69i57j69i61j69i59j69i6112j0.4564j0j4&sourceid=chrome&ie=UTF-8>

Aşkiraye ku zimanê kurdî êk ji zimanên ser bi xêzana zimanên Hind û Îranî ve, lê belê zimanê tirkî ser bi xêzana zimanên Altayî ve. Her weko diyar ev her du ziman ne ser bi êk xêzan vene jî, ji ber ku vekolîna me dikevîte di çarçuvê vekolîna hemberî ji ber vê êkê ev vekolîna giringiya xwe heye û mifayekê zor bo xandevanê her du ziman heye, welatê tirkiya weko cîranek digel kurdan giringiya xwe heye ji her layekî ve.

Helbet eger du mal cîranên êk bin yan du welat, xalên cuda yan xalên wek êk yan jî her du pêk ve dê hebin, min jî di vê namê da bi fer dît hemberkirina hevalnavî di navbera zimanê kurdî û zimanê tirkî da li dîv wê fehrîsta hatiye danan diyar bikem, çonkî hevalnav di her du zimanan da bi berfirehî di axiftinê da dihête bikarînan.

**PIŞKA ÊKÊ**  
**HEVALNAV DI**  
**ZIMANÊ KURDÎ DA**

## PIŞKA ÊKÊ

### HEVALNAV DI ZIMANÊ KURDÎ DA

Hevalnav di zimanê kurdî da beşek ji beşên serekî yê axiftinê dihête hijmartin. Ev beş wekî bikarînan di nava ristê da cihekê berfireh di zimanê kurdî da digrît. Belê ne ji beşên serekî ye di pêkînanana ristê da. Bo nimûne rista “Mamosta hat.” di şîyan daye hevalnavek li ser bihête zêdekirin. Wekî “Mamostayê **baş** hat.” peyva “**baş**” hevalnav e. Eger ev peyve di ristê da jî nebît, risteya diruste hem ji layê watayê ve hem jî ji layê rêzimanê ve.

Hevalnav herdem xasyet û çewayîya tiştî derdiêxît. Ji mercên bikarînanana hevalnavî di ristan da ewe ku herdem bi harîkariya amrazên palvedanê ligel navekî yan cihnavêkî dihête û herdem piştî navî yan cihnavî dihête bikarînan. Her wekî di rista serî da diyar bûy ku nav bêy hevalnavî dihête bikarînan. Lê belê hevalnav bêy nav yan cihnav di ristan da nahête bikarînan. Di zimanê kurdî da hevalnav herdem bi harîkariya amrazên palvedanê piştî navî yan cihnavî dihête bikarînan belê demê piştî navî dihête û hindek peyvên lêkdayî dirust diket pêdvî bi amrazên paledanê nabît, weko peyvên:

reş + mal ⇒ reşmal

baş + nivîs ⇒ başnivîs

sor + gul ⇒ sorgul

## 1. Pênasa Hevalnavî

Ji berê heta nûke boçûnên cuda cuda ji layê şareza û zimanzanê kurd ve derbarey pênaseya hevalnavî di zimanê kurdî da hene û pênaseyeka êkgirtî bo hevalnavî nehatiye darêtin û bi çend zaravên cuda cuda hatîne bikarînan: “Rengdêr, pesin, xesyetnav, rewş, awelnaw, nawnîşan û sîfe.”<sup>1</sup> Sadiq Amêdî jî “hevalnav” Fazil Omer jî “dirov” di kurmançî da bi kar îname. Bo diyarkirina pênaseyên hevalnavî di zimanê kurdî da çend pênaseyekên zimanzan û vekolerên di warê zimanî da kar kirîn hevalnav bi vî şêwey daye diyarkirin “Rengdêr ew bêje ye ko bi navdêrê ve dibe û wesfekî wê dide zanîn; an wê navdêrê di mana wê de tayîn dike û texsîs dike. Herwekî gava em “hespê reş, hespê beza, hespê xurt” dibêjin “reş, beza, xurt” rengdêr in; ji ber ku ew yek bi yek wesfekî navdêra hêsp didin zanîn. Dîsan di gotinên “ev hesp, çar hesp, kîjan hesp, hespê min” de bêjeyên “ev, çar, kîjan, hin, min” rengdêr in; çûnkî ev navdêra hêsp di mana wê ne dîxesisînin û dieyinên.”<sup>2</sup> Ji vê pênasê tete zanîn, ku hevalnav divêt digel navî da bihête bikarînan û çewayiya wî navî didete diyarkirin, belê di vê pênasê da û di nimûna “hespê min” da nivîserî peyva **min** kirye hevalnav, peyva **min** ne hevalnav e çonkî cihnav e. “Jî wan nawan ra dibêjin xesyetnav, yên ko core, reng û t’êherê navên heyinê nişan dîkin, xesyetnav rengê tiştan u xesyetê merivan, heywanan nişan dîkin, tînin ber çavan u e‘yan dîkin.”<sup>3</sup> Ji vê pênasê jî diyar dibêt ku hevalnav herdem digel navî da dihêt û cure û rengê navên tiştan diyar diken. Hevalnav rengê tiştan û taybetmendiyên mirovan û tiştan diyar û berçav û aşkira diken.

Her wekî di serî da amaje pêhatiye kirin ku gelek ji şehreza û vekolera pênase bo vê beşê axiftinê kirîne. Di nama xweya dîktorayê da Hîdayet Ebdulla Mihemed beşekê zor ji wan pênasan\* dayne diyarkirin û ji encamê xwandin û lêkdana wî bo van pênasan bi vî şêwey pênaseyek darêjtiye: “Awelnaw wek regezî ferhengî rewîşt û xesletî (naw) le xo degrêt û katî pêwe diyar niye û watay çûnyetî û taybetmendîtî ew nawe radegeyenêt, ke legelî da peywendî kirdey dirêj kirdinewe û

<sup>1</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, *Rêzmana Kurdî Kurmançiya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî*, Çapa Yekê, Çapxana Daru'ş-Şuûni'ns-Seqafî el-Amme, 1987, Bexdad, r. 265.

<sup>2</sup>Celadet Alî Bedir-xan, *Elfabêya Kurdî û Bingehên Giramera Kurmançî*, Çapa Êkê, Çapxana Ceylan, 1998, Stenbol, r. 89.

<sup>3</sup>Qenatê Kurdo, *Zimanê Kurdî Rêzman*, Weşanên Komkar, 1981, Frankfurt, r. 56., Qenatê Kurdo pîta(i) bê ku xal li ser bît bi kar îname ji bo dest karî nehête kirin min jî wek wî hêlaye.

\*Bo pitir xandina pênasan veşerî bo nama dîktorayê ya Hîdayet Ebdulla Mihemed r. 93-95.



teknişînî le firêz û riste de be encam degeyenêt û be tenya le ferheng da bûnêkî serbexoy niye, boye debît legel nawêk da bêt û goncandin be destewe biden le pênav wata bexşînda...”<sup>1</sup> Ji encamê şirovekirin û xandina vê pênasê jî diyar dibît ku hevalnav bêy navî neşet rolê hevalnavî bigêrît. Heta ew beşê axiftinê em bişêyn diyar bikeyn weko hevalnav pêdviye ligel navekî bihêt û çewayî û taybetmendiya wî navî diyar biket da watayekê bidet. “Hevalnav peyveke bo wesfa navekî yan cihnavêkî bi kar dihêt û dibîte diyarkerê navî yan cihnavî, her wesan hevalnav dibîte tamamkerê karê bêhêz.”<sup>2</sup> Di vê pênasê da diyar dibît ku eger hevalnav digel navekî nehat pidviye digel cihnavêkî bihêt çonkî di encam da cihnav li cihê navan bikar dihên, wekî: “korên zîrek, ewên zîrek”.

## 2. Cureyên Hevalnavî ji Layê Hebûnê ve

### 2. 1. Hevalnav ji Layê Watayê ve

#### 2. 1. 1. Hevalnavên Çewayî (Wesfîn)

Hevalnavê çewayî di zimanê kurdî da “Bew awelnawane dewitrêt ke çûnyetî xasyet û nîşane degeyenin, legel eweş da awelnawî çûnyetî heme core, le waneye watay reng nîşan dedat (zer, şîn, sor, sipî, kesk...), çemkî areste û dewr û ber degeyenê (rast, çep...), ya xod sîfet nîşan didat (rezîl, rûxoş, zîrek...), ya xod şêwe û qebare der debirêt (qelew, pan, berîn, lawaz...), ya xod tam kirdin degeyenêt (tîj, siwîr, şîrîn, tîrş, miz...), ya xod piley germî û keş û hewa be kar dêt (sar, germ, tezî...”<sup>3</sup> wekî van nimûnan (korê zîrek, kiça **ciwan**, xaniyê **mezin**, zarokên **şîm**, dewê **tîrş**, ava **şîrîn**,...htd) Cigerxwîn jêr navê pesin, pesnê rastî li ser çar parçeyan par ve diket:

- “1. Tam- sor, şêrîn, tîrş, tal,tøj...
2. Reng- sor, sipî, reş, zer, kesk...
3. Kêmasî- kin, kurt, kor, ker...

<sup>1</sup>Hîdayet Ebdulla Mihemed, *Rêkewtinî Watayî Naw û Awelnaw le Zimanî Kurdî da*, Namey Diktora , Kulîjî Ziman, Zankoy Silêmanî, 2002, Silêmanî, r. 96.

<sup>2</sup>Lijnek ji Wezareta Perwerdê, *Ziman û Edebê Kurdî*, bo Pola Heştê Bineret, Çapa Çarê, Çapxana el-Destur , 2012, Ordin, r. 59.

<sup>3</sup>Nerîman Xoşnaw, *Rêzmana Kurdî (Kirmancî Serû)*, Çapa Yekem, Çapxaney Rojhelat, 2015, Hewlêr, r. 77.

4. Zêday- dirêj, situr, qalind...”<sup>1</sup>

Bo pitir diyarkirina hevalnavên çewayî ev çend nimûnên xîwarê hatîne bikarînan:

1. Gula **sor** ji destê min keft.
2. Xeta **xîwar** ji gayê **pîr** e.                      Gotina mezinan
3. Ewa **ciwan** dilê mirovî xweş diket.
4. Mirovê **qelew** zî tuşî nexoşîyan dibît.
5. Ez gelek hez ji hinarên **miz** dikem.
6. Çaya **kel** venexon.

Di risteya (Gula sor ji destê min keft) peyva (**sor**) hevalnav e û navê (gol) wesfandiye û çewayîya rengê gulê daye diyarkirin. Di risteya (Xeta xîwar ji gayê pîr e.) da peyvên (xîwar û pîr) hevalnav in û hevalnavê (**xîwar**) wesfa navê (xet) û hevalnavê (**pîr**) wesfa navê (ga) kirîne. Di risteya (Kîça ciwan dilê mirovî xweş diket) da peyva (ciwan) hevalnav e wesfa navê (kiç) hatiye kirin. Di risteya (Mirovê qelew zî tuşî nexoşîyê dibît.) da peyva (**qelew**) hevalnav e û wesfa navê (mirov) kiriye. Di risteya (Ez gelek hez ji hinarên miz dikem.) da peyva (**miz**) hevalnav e wesfa navê (hinar) pê hatiye kirin û di risteya (Çaya kel venexon.) da peyva (**kel**) hevalnav e wesfa navê (ça) kiriye.

Ji nimûnên serî bo me diyar dibin ku hevalnavên çewayî hergav piştî navan tî. Belê çêdibît hindek caran jî berî navan bihêne bikarînan. “Hevalnavên çewaniyê her gav piştî navdêran tî, lê carinan di axiftina rojane, biwêj, helbest û gotinên pêşîyan de dibe ku beriya navdêran jî bî.”<sup>2</sup> Bo nimune “Hindî sipehî ye to xo dibêjî **sor** gul e.”<sup>3</sup> Belê merem ne ewe ku hevalnav piştî cihnavan jî nahêne bikarînan, hevalnav digel komela (ez, tu, ew, em, hûn-hîn, ew) wekî di rista jimare (3) ê da diyar bûy piştî cihnavên ser bixwe jî bikar dihên. Her wesan di wan nimûnên serî da bo me diyar dibît ku hem ji layê cihê û erkî ve bi du curan hatîne bikarînan ew

<sup>1</sup>Cigerxwîn, *Awa û Destora Zimanê Kurdî*, bi Arîkariya Cam'a Bexda Hatiye Çap kirin, 1961, Bexda, r. 30.

<sup>2</sup>Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çap berdand Metbe'sî, 2013, Îstanbul, r. 102.

<sup>3</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 267.

hevalnavên çewayî yên bi harîkariya amrazên palvedanê ku karê ristê karekê timam bît dikeve piştî navan. Ew jî li dîv regezên wan navan amrazên palvedanê dihêne bikarînan, eger nav ji regezê nêr bît û êk jimar bît amrazê (ê) dê kevîte piştî navî û hevalnav dê kevîte piştî amrazî wek (Mirovê qelew zî tuşî nexoşiyar dibît.) Eger nav ji regezê mê bîtin û êk jimar bît dê amrazê (a) kevîte dîv navî ra û dê hevalnav piştî hingê hête bikarînan wek (Gula sor bîne.) Eger nav du layen bît û pirjimar bin dê amrazên (ên, êd, êt) kevîne piştî navî û hevalnav jî dê kevîte piştî êk ji wan amrazan wek (Ez gelek hez ji qotabiyên (êd, êt) zîrek dikem.) Erkê van hevalnavan dibîte diyarker bo navî di ristên karê timam tê da hatî. Yên di ew in yên bi karê netimam ve yan digel dihêne bikarînan. Wek: (Xeta **xiwar** ji gayê **pîr** e.) Yan (Ev pertoke **mezin** in.) Di van cure ristan da erkê hevalnavî dibîte diyarkerê karê netimam “Ji ber ko rengdêr ji bêjeyên neguhêrbar e.”<sup>1</sup> Ji vê tete zanîn ku hevalnav nahêne guhorîn wekî di van nimûnên jêrî da diyar dibin:

1. Xortê **delal** hat.
2. Xortên **delal** hatin.
3. Kiça **nazdar** hat.
4. Kiçên **nazdar** hatin.

Ji van nimûnên serî diyar dibît ku çi gohurîn nekeftine hevalnavên (delal, nazdar) ên di ristan da. Nav çi nêr yan mê bît û êkjimar yan pirjimar bît hevalnavê çewayî weko xwe dimînît di zimanê kurdî da “Hevalnav nahêne tewandin.”<sup>2</sup> û “piştî navan dihên.”<sup>3</sup> Belê hevalnavê çewayî wekî hevalnav, nîşanên pileya hevberkirî û pileya bala (bilind) û “şêwê gerdenkirinê.”<sup>4</sup> Werdigrît anku cihnavên nisandî, ku digel guropê cihnavên xweru tene bikarînan, giropê xweru (ez, tu, ew, em, hûn-hîn, ew) ew cihnavên nisandî yên ku digel bi kar tên (m, î, e, î-n, n, n) ku pitir diyar bibît ev nimunên li xarê hatîne bikarînan :

<sup>1</sup>Celadet Alî Bedir – Xan, hb., r. 67.

<sup>2</sup>Captain R. F. Jardine, *Bahdînan Kurmanji*, Printed at the Government Press, 1922, r. 3.

<sup>3</sup>Kamuran Bedir - Xan : *Kolay Kürtçe (Kurmançî) Fransızcadan Türkçeye Çeviren Yakup Karademir*, 2. Baskı, Baskı Ceren Matbaacılık, Doz Basım, İstanbul, r. 17.

<sup>4</sup>Bavê Nazê, *Rêzmana Kurdî (Tiyurî û Piraktîk)*, Çapxana Hewar, 2012, Duhok, r. 97.

Bo pileya hevberkirî û pileya bala:

5. Qotabiyê **zîrek** hat.
6. Qotabiyê ji min **zîrektir** hat.
7. Nijyar di polê da **zîrektirîn** qotabî ye.

Di rista êkê da (zîrek) hevalnavê çewayî ye. Di rista duwê da (zîrektir) hevalnavê çewayî yê pileya hevberkirî ye. Di rista sêyê da (zîrektirîn) hevalnavê pileya bala ye.

Bo şêwê gerdankirinê:

- |                            |                          |                         |
|----------------------------|--------------------------|-------------------------|
| 1. Ez zîrek <b>im</b> .    | 2. Tu zîrek <b>î</b> .   | 3. Ew zîrek <b>e</b> .  |
| 4. Em zîrek <b>in-în</b> . | 5. Hîn zîrek <b>in</b> . | 6. Ew zîrek <b>in</b> . |

Eger ev peyve wesfa kiryarekê biken hingî dê bine hevalkar. Wek: (Şirînê mal **ciwan** paqij kir.) Peyva ciwan di vê ristê da hevalkar e.

Belê eger hevalnavan nîşanên dî wergirtin dê ji hevalnavî kevin û dê wekî nav di ristê da hêne bikarînan. Bo nimûne :

1. Kiça **ciwan** kezan înan. → Hevalnav
2. **Ciwanê** kezan înan. → Nav

Di rista (1) da peyva (ciwan) hevalnav e. Çonkî amrazê palvedanê di navbera navê (kiç) û ciwan da hatiye û bûye diyarkerê navê (kiç). Belê di rista (2) da peyva (ciwan) nav e. Çonkî ew bi xwe li cihê navî hatiye û nîşana regezê mê yê doxê tiyan wergirtiye.

Ev mijar dê pitir li babetê bikarînana hevalnavî wekî navî hête bikarînan.

Ew peyvên dibine bersiv bo peyva pirsyarî (**çewa**) bi hevalnavên çewayî dihêne hijmartin.

## 2. 1. 2. Hevalnavên Nîşaneyî

Ew hevalnav in yên di ristê da destnîşana nevekî diken “Ev rengdêr navdêran bi rêya nîşanê diyar dikin.”<sup>1</sup> Hevalnavên nîşaneyî di kurmanciya serî da “ev, ew”<sup>2</sup> in. Bo nimune:

- |  |  |                           |
|--|--|---------------------------|
| 1. Ev kiç geleka ciwan e.              | 2. Ev kor <b>nivist</b> .                | 3. Ev kiç <b>nahêt</b> .  |
| 4. Ew kor <b>dê çît</b> .              | 5. Ew kor <b>hatin</b> .                 | 6. Ew kiç <b>hatin</b> .  |
| 7. Ev kor wêney ciwan <b>dikêşît</b> . | 8. Ev kiç <b>dê</b> golan <b>ket</b> .   | 9. Ew kor <b>nivist</b> . |
| 10. Ew kiç geleka şîrîn e.             | 11. Ew kiç <b>nahêt</b> .                | 12. Ew kor <b>hatin</b> . |
| 13. Ew kor <b>dê</b> kar <b>ket</b> .  | 14. Ew kiç <b>dê</b> pezî <b>doşît</b> . | 15. Ew kiç <b>hatin</b> . |

Ev hevalnavên nîşaneyî (ev, ew) digel karê (bûn) û karên têneperên borî û neborî û digel karên têperên demê noke (êsta) û demê ayînde (dahatî) da, bi şewê (erê, nerê) dihêne bikarînan wekî di nimunên serî da diyar bîn. “Hevalnavên tewandî him bi xwe tewandî ne û him jî navdêrên piştî xwe ditewînin.”<sup>3</sup> Hevalnavên tewandî bi vî rengî hatîne darêtin. “Hevalnavên şanîdanê yên tewandî û nêzik evin (vê, vî, van) û yên dûr jî evin (wê, wî, wan)”<sup>4</sup>. Bo nimune:

- |  |  |
|--|--|
| 16. <b>Vê</b> kiçê nan <b>pat</b> .            | 17. <b>Vî</b> korî pez <b>neçerand</b> .     |
| 18. <b>Van</b> kiçan govend <b>xweş kir</b> .  | 19. <b>Van</b> xortan govend <b>şarand</b> . |
| 20. <b>Wê</b> daykê em <b>perwerde kirîn</b> . | 21. <b>Wî</b> kewî <b>bigre</b> .            |
| 22. <b>Wan</b> esmeran dil <b>sotin</b> .      | 23. <b>Wan</b> cotyaran zevî <b>kêlan</b> .  |
| 24. <b>Wan</b> mîhan <b>bidoşin</b> .          |  |

<sup>1</sup>Bahoz Baran, *Rêzmana Kurmancî*, Çapa Yekem, Kayhan Matbaacılık, 2012, İstanbul, r. 78.

<sup>2</sup>Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehcesi)*, Çapa Duwê, Berdan Matbaacılık, 2012, İstanbul, r. 257.

<sup>3</sup>Çetîn Taş, hb, r. 102.

<sup>4</sup>Çetîn Taş, hb, r.103.

Ji van ristan bo me diyar dibît ku ev hevalnavên tewandî digel “Karî rabirdûy têper û ferman da”<sup>1</sup> bi şewê (erê, nerê) di ristê da dihêne bikarînan, ev hevalnavên nîşaneyî yên tewandî her êk ji wan keftiye berî navekî û ew navên li dîv ra jî hatîne tewandin li dîv regez û jimara navan, navên kitê mêy nêzîk û dûr nîşana (ê) wergirtîne û navên kitê nêrê nêzîk û dûr nîşana (î) wergirtîne û navên komê nêr û mêy nêzîk û dûr nîşana (an) wergirtîne. Ji bilî van forman di zimanê kurdî kurmnciya serî da hindêk formên dîjî dihêne bikarînan. Bo nimune:

Ev → ligel navên nêr û mê yên kitê nêzîk dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ev** qotabî ji polê hate derêxistin.

Ev ... e → ligel navên nêr û mê yên kitê nêzîk dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ev** kore çendê zîrek e.

**Ev** kiçe geleka can e.

Ew → ligel navên nêr û mê yên kitê dûr dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ew** qotabî ji mal derkeft.

Evê – vê ... ê → ligel navên mê yên kitê nêzîk dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Evê** kiçe şî kir.

Evî – vî ... î → ligel navên nêr yên kitê nêzîk dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Evî** korî wane nivîsî.

Evan – van ... an → ligel navên nêr û mê yên komê nêzîk dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Evan** koran xarin nexar.

**Evan** kiçan mal paqij kir.

Ewan – wan ... an → ligel navên nêr û mê yên komê dûr dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ewan** (wan) mirovan xarin xwar.

---

<sup>1</sup>Hatem Wilya Mihemed, *Firêzî Nawî û Firêzî Karî le Kirmancî Jûrû da*, Namey Macistêr, Kolîjî Ziman, Zankoy Silêmanî, 2000, Silêmanî, r. 24.

Ewê – wê ... ê → ligel navên mê yên kitê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ewê (wê)** kiçê aman şoştin.

Ewî – wî ... î → ligel navên nêr yên kitê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ewî (wî)** beranî bigre.

Ew ... êhe → ligel navên nêr yên kitê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ew korêhe** ji mal **derkeft**.

Ew ... ahe → ligel navên mê yên kitê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ew kiçahe** ne ji gondê me **ye**.

Ew ... ênhe → ligel navên nêr û mê yên komê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Ew korênhe çûn.**                      **Ew kiçênhe** gelek şirîn **in**.

Wê ... ahe → ligel navên mê yên kitê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Wê kiçahe** xarin **çêkir bî**.

Wî ... êhe → ligel navên nêr yên kitê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Wî zelumêhe** sitiran digotin.

Wan ... ênhe → ligel navên nêr û mê yên komê dût dihêne bikarînan. Bo nimûne:

**Wan zelumêhe** şivanetî dikir.                      **Wan jinêhe** bêryatî dikir.

Hevalnavên nîşaneyî dema navekî di ristê da dest nîşan neken anku ew navê dihête destnîşankirin bi rêka hevalnavê nîşaneyî di ristê da nehate bikarînan wê gavê wekî hevalnavê nîşaneyî erkê xwe ji dest didet dê wekî cihnavên nîşaneyî erkê xwe di ristê da bînin “Rengdêrên îşarkî ji pronavên îşarkî ên pîvene »ev, ew« pêve, ne tu tişt in û gava navdêrên wan ji komekê dikevin ew vedigerin ser eslên xwe û wezîfeyên xwe ên bingehîn dibînin.”<sup>1</sup> Bo nimûne:

1. **Evan** kiçan mal paqij kir. → Hevalnavê nîşaneyî

---

<sup>1</sup>Celadet Alî Bedir-Xan, hb., r. 93.

2. **Evan** mal paqij kir. → Cihnavê nîşaneyî  
 3. **Ew** kiç gelek şîrîn diaxift. → Hevalnavê nîşaneyî  
 4. **Ew** gelek şîrîn diaxift. → Cihnavê nîşaneyî

Di rista jimare (1) da peyva (evan...an) hevalnavê nîşane ye çonkî navê (kiç) di ristê da yê dest nîşan kirî. Belê di rista jimare (2) da peyva (evan) cihnavê nîşane ye çonkî li cihê çend navekan hatiye bikarînan. Di rista jimare (3) da peyva (ew) hevalnavê nîşane ye û di rista jimare (4) da peyva (ew) cihnavê nîşane ye.

Ji xasyet û taybetmendiyan hevalnavên nîşaneyî ewe ku herdem li berî navî dihête bikarînan ca çî li destpêka ristê yan nîveka ristê bihête bikarînan. Bo nimûne:

Li destpêka ristê → **Ev** qotabî ye gelekê zîrek e.

Li nîveka ristê → Ez û to gelek ji **vî** korî hez dikeyn.

Ew ristên pirsyarî yên bi peyva hevalnavê pirs “**kîj(k)**” dihêne kirin hevalnavên nîşaneyî dibine bersiva wan.

### 2. 1. 3. Hevalnavên Pirsyariyê

Hevalnavên pirsyariyê ew cure hevalnav in ku pirsyarê bi navekî diket û bi rêka pirsyarkirina wî navî bo me didete nîyasîn yan diyarkirin demê ku bersiv bo wê pirsyarê tete dan ew bi hevalnavê dihête bersivdan. “Wişeyeke bo pirskindin le kesêk yan şitêk bekar dehênrê û le risteş da serbexo nabê, belku hemîşe dexirête pal nawêkewe.”<sup>1</sup> Ew hevalnavên pirsyarî yên bi şeweyekê berbelav tene bikarînan di kurmnciya serî govera behdînan da even e: (kîj – kîjk, kîjan, çî, çewa – çewan, çiqas, çend), hevalnavên pirs dema berî navî bihêne bikarînan amrazên palvedanê wernagirin. Wek:

- |   |   |
|---|---|
| 1. Te <b>kîj</b> beran <b>girt</b> ?        | 2. To <b>kîj</b> beranî <b>difiroşî</b> ?                 |
| 3. Ez <b>kîj</b> kiçê <b>dibînim</b> ?      | 4. <b>Kîj</b> beranan <b>bînim</b> ?                      |
| 5. Ew <b>kîj</b> beranin <b>naçerin</b> ?   | 6. <b>Kîjik</b> qotabî nehatibî?                          |
| 7. <b>Kîjan</b> korî jin <b>îmaye</b> ?     | 8. <b>Kîjan</b> kiçê şî <b>kirye</b> ?                    |
| 9. <b>Kîjan</b> mirovan nan <b>xariye</b> ? | 10. <b>Kîjan</b> kor <b>dê</b> li ber derî <b>mînît</b> ? |

<sup>1</sup>Tarîq Salih, *Çend Serencêkî Zimanewanî*, Çapî Yekem, Çapxaney Mukriyanî, 2008, Hewlêr, r. 178.



## 11. **Kîjan** kiç **dê** xarnê **înît**?

Dema karê ristê yê borî bît navên piştî hevalnavê pirs (kîj) nahêne tewandin wekî rista serî jimare (1, 6). Belê eger karê ristê neborî bît navê piştî hevalnavê pirs dêhêne tewandin. Wekî jimare (2, 3, 4). Hevalnavê pirs (kîjan) dema karê ristê borî bît navên piştî hevalnavê pirs dihêne tewandin. Wekî jimare (7, 8, 9) û eger karê ristê neborî bît navê piştî hevalnavê pirs (kîjan) nahêne tewandin. Wekî jimare (10, 11), navê piştî hevalnavê pirs bi nîşana (in) navî dikete kom jimare (5).

Hevalnavê pirs (**çi**) bo pirsyarkirin ji navê mirov, tişt, ajel û teyr û tewalan tête bikarînan. Bo nimûne:

1. **Çi** mirov li vêrê najîn?
2. Te **çi** dar birî?
3. **Çi** berx man bi rê ve?
4. **Çi** kew naqebin?

Di van ristan da jî nav piştî hevalnavên pirs hatîne lewma amrazên palvedanê nehatîne bikarînan.

Hevalnavê pirsyarî (**çewa** (**n**)) pirsyarê ji çewayiya navî diket di ristê da, dema bersiv li ser pirsyarê dihête dan ew bersiv bi hevalnavê çewayî dihête dan. Wek:

1. Nazdarê kirasekê **çewa** kirî?
2. Ewan hinarên **çewan** firotin?
3. Belgên dara gûzê **çewan** in?

Eger em berê xwe bideyne ew ristên di serî da diyar, hevalnavê (**çewa** (**n**)) piştî navî hatîne bikarînan. Anku ew hevalnavên pirs piştî navî dihêne bikarînan bi harîkariya amrazên palvedanê (a, ê, ên-êd-êt) dihêne bikarînan.

Hevalnavê pirsyarî (**çend**) pirsyarê ji jimarê û rêzbandî û çendêtiya wî navî diket ku pirsyar pê hatiye kirin. Hevalnavê pirs (**çend**), demê rêzbandiya navî di ristê da bidete diyarkirin dê piştî navî hête bikarînan û dê nav amrazên palvedanê wergirît. Wek:

1. To li pola **çendê** yî?

Belê eger hevalnavê pirsyarî (**çend**) pirs bi jimara navî kir wê gavê dê hevalnavê pirs (**çend**) berî navî hête bikarînan û bersivdana pirsyarê jî dê bi hevalnavê jimareyî bîtin. Wek:

2. Te **çend** nan kirîn?

Herwesan nav dişêt bête tewandin bi êk ji van (an, î, ê). Wek:

3. Ez **çend** pertokan bikirim?

4. Ez **çend** nanî bînim?

5. Ez **çend** savarê bikirim?

Yan jî em şeyn bi vî rengî dabirêjîn. Wek:

1. Min **çend** nan kirî?

Me **çend** nan kirî(n)?

2. Te **çend** nan kirî?

Hewe **çend** nan kirî(n)?

3. Wî **çend** nan kirî?

Wan **çend** nan kirî(n)?

4. Ez **çend** nanan bikirim?

Em **çend** nanan bikirîn?

5. To **çend** nanan dikirî?

Hûn (hîn) **çend** nanan dikirin?

6. Ew **çend** nanan dikirît?

Ew **çend** nanan dikirin?

Ew navên piştî hevalnavê pirs hatîn ligel komela cihnavên (min) nîşanên tewandinê wernegirtîne belê ew navên piştî hevalnavê pirs hatîn ligel komela cihnavên (ez) nîşanên tewandinê wergirtîne.

Lê belê hindek caran hevalnavê pirsyarî (**çend**) bi hevalnavê jimareyî nahêne bersivdan. Ew bi hevalnavên nediyar dihêne bersivdan. Wek:

1. Hewe **çend** nexweşî ditîne? Bo nimûne bersiv (**gelek**)

Hevalnavê pirsyarî (**çiqas**) digel nave nejimar dihêne bikarînan, bersivdana pirsyarê bi hevalnavê nediyar dihête dan. Bo nimûne:

1. Hewe **çiqas** xarin divêt?

Ev hevalnave dikevîte berî navî di ristê da. Hindek caran jî hevalnavê jimareyî dibine bersiv bo ristên hevalnavê pirsyarî (çiqas). Wek:

1. **Çiqas** dar hatin birîn? Deh dar hatin birîn.

Hevalnavên pirsyarî eger li berî navî hatin nav amrazên palvedanê wernagirin. Bo nimûne:

1. **Kîjan** qotabî ji hemiyar zîrektir e? 2. Te **çend** pêûs hene?

3. Te **çewa** name nivîsî?

Belê eger nav li berî hevalnavên pirsyarî hatin nav dê amrazên palvedanê wergirin. Bo nimûne:

1. Hewe pertokên **kîjan** qotabî birne mal? 2. Ew pertoka **çendê** ye to dixînî?

3. Wî beranekê **çewa(n)** dît?

Peyvên pirs dema wesfa navekî biken, dibine hevalnavên pirs û dema li cihê navekî bihên dibine cihnavên pirs û dema wesfa kiryarekê biken dibine hevalkarên pirs. Bo nimûne:

Te beranekê **çewa** kirî? Hevalnavê pirs

**Kî** hat? Cihnavê pirs

To **çewa** hatî? Hevalkarê pirs

Her wesana li dûmahîka her risteka pirsyarî nîşana pirsyarî (?) dihête danan.

## 2. 1. 4. Hevalnavên Nediariyê

Ev hevalnav ji layê zimanzan û rizmanzanên kurd ve bi çend peyvên cuda cuda hatîne binavkirin “Awelnawî nadiyar ew cure awelnawe ye, ke wa delalet le ser şitêkî diyarîkiraw naka û watay kewtuwete çîwar çêwey ehdêke we.”<sup>1</sup> Em dişêyn bêjîn hevalnavên nediya navan bi şêweyekê nediya nîşa me diden “Rewş ên nependî, bi awakî nexuya, veşirtî merovekî, heywanekî, tiştêkî pêş me dike.”<sup>2</sup> Ew hevalnavên nediya yên di kurmancî da dihêne bikarînan “her, hemî, kes, herkes, hemîkes, pir-gelek, bitinê /tenê”<sup>3</sup> ji bilî van hevalnavên Sadiq Behaedîn Amêdî diyar kirin gelek hevalnavên dîjî di kurmanciya serî da têne bikarînan wekî (hin, hinek, pîçek, hindek, he(r) çî, çend, çendek, filan /bêvan, din /dî)<sup>4</sup> û gelekên dîtir wekî (çi, ewqas, dîtir...htd). Bo nimûne:

1. “**Her** berek li cihê xwe yê bi qedr e.” → (gotina mezinan)
2. **Hindek** mamosta bi girêbest hatin damezrandin.
3. “**Kesê** negohdar hewar û sed hewar.” → (gotina mezinan)
4. **Herkes** mirovî dibîne.
5. **Hemîkes** welatî bi cih nahêlin.
6. **Pir** mirov di şerê sar da mirin.
7. **Gelek** mêrxas ji gondê me rabûn.
8. **Bitinê (tenê)** jinik ji mişkan ditirsin.
9. **Çend** gond wêran bûn.
10. **Hinek** bajêr ji hinek bajêran xweştir in.
11. Min **pîçek** xarin ya xarî.
12. **Hemî** mirovan xweştir divêt.
14. **Hin** qotabî ji zankoyê hatin derêxistin.
13. **He(r) çî** kiçka cane ew malê xortan e.
15. **Çendek** pare ji destan keft.
16. Wî **birek** pez firot.
17. Ewê **din (dî)** mala me xirab kir.
18. Te **filan (bêvan)** jinik dît.
19. Te **ewqas** pare xarin.
20. Min ewê **dîtir** dîtin.
21. Min mirovê **wesa** li bajêrî nedîtine.

<sup>1</sup>Ewrehman Hacî Marif, *Rîzmanî Kurdî*, Bergî Yekam (Wişesazî) Beşî Sêyem (Awelnaw) , Çapxaney Rojhelat, 2014, Hewlêr, r. 129.

<sup>2</sup>Reşîd Kurd, *Rêzman A Ziman Ê Kurmancî*, Çapxaney Kerem, 1956, r. 66.

<sup>3</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 293.

<sup>4</sup>Kadri Yıldırım, hb., r. 259.

Ji van nimûnan diyar dibît ku hevalnavên nediyar bara pitiriya wan dikevin berî navî hêdek ji wan dikevin piştî navî û amrazên danepal werdigirin. Hevalnavên “wesa, wisa, wisan”<sup>1</sup> ev hevalnavên nediyar watayên wan êk in û dirste li cihê êk bihêne bikarînan. Eger hevalnavên nediyar navek di nav ristê da bi awayekê nediyar nîşan nekir anku ew navê di nava ristê da nehate bikarînan wê gavê ew hevalnavê nediyar dê ji erkê hevalnavî kevît û dê rolê cihnavê nediyar di ristê da bînît. Bo nimûne:

**Hemî** mirovan azadî divêt. → Hevalnavê nediyar

**Hemiya** azadî divêt. → Cihnavê nediyar

## 2. 1. 5. Hevalnavên Jimareyî

Hevalnavên jimareyî “Ew hevalnav in yên ku ji bo hijmara kesekî yan jî tişteki berî navî tete danan.”<sup>2</sup> Ev hevalnavên jimareyî ji jimarnava zêdetir ne çî tişt in. “Rengdêrên jimarî ji hin jimarnavan pêve ne tu tişt in û gava bi navdêran ve dibin an mêjer û mîqdar an rêza wan didinzanîn.”<sup>3</sup> Hevalnavên jimareyî du cur in, ev jî ji layê rêzmannivîsên kurd ve bi çend navên jêk cuda hatîne binavkirin “jimarî û rêzî”<sup>4</sup>, “xurû, payedar”<sup>5</sup>, “jmarda û rêzda”<sup>6</sup> û “1- curê xurî (jimarey eslî) 2- curê payedar (tertîbî – rutbî).”<sup>7</sup>

### 2. 1. 5. 1. Hevalnavên Curê Xurî (Jimarey Esî – Bingehîn<sup>8</sup>- Bincî)

Hevalnavên jimarên bingehîn “Ev cure rengdêr beriya navdêran tên û mêjera wan bi riya hejmarên xwerû diyar dikin.”<sup>9</sup> Jimarên xurî. Wek: (êk, dû, pênc, deh, çil, sed, sed û sîh, hizar, milyon...hwd). Bo nimûne:

1. Duhî min **dû** kew girtin.

2. Evro min **şes** hinar xarin.

3. **Çar** korêd Ehmedî mamosta ne.

4. **Sê** zarokên Şirîne qotabî ne.

<sup>1</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r. 137.

<sup>2</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 293.

<sup>3</sup>Celadet Alî Bedir-Xan, hb., r. 94.

<sup>4</sup>Celadet Alî Bedir-Xan, hc.

<sup>5</sup>Reşîd Kurd, hb., r. 60.

<sup>6</sup>Kamran Bedir- Xan, *Rêzana Zmanê Kurdî*, 1971, Parîs, r. 20.

<sup>7</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 282.

<sup>8</sup>Samî Tan, *Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxane Gün Matbaacılık, 2011, İstanbul, r. 174.

<sup>9</sup>Nezîr Ocek, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Çapa Yekemîn, Kayhan Matbaacılık, İstanbul, r. 151.

## 5. Sê kiçên Nesrîne endaziyar in.

Ji van ristên serî diyar dibîtin ku hevalnavên xurî herdem li berî navan dihêne bikarînan. Her wesana "Di kurmancî da hijmara xurî navekê yekînî diket (wesfî nawêkî tak dekat) eger hat û nav nehête îzafekirin."<sup>1</sup> Wekî navên (kew, hinar) di ristên jimare (1, 2) da hatîne bikarînan ev her du nave êkîniya navî nîşan diden. Belê di ristên jimare (3, 4, 5) da nav yê hatîne îzafekirin di vî demî da pêdvî bi amrazê palvedanê (ên, êd, êt) heye bihêne bikarînan. Di vî barî da dê ew nav bi komê hête nîşandan wekî di ristên jimare (3, 4, 5) da hatî, navên (kor, zarok, kiç) bi navên kom hatîne diyarkirin. Her wesana eger navek bibîte timamker bo navê timamkirî yan bihête îzafekirin divêtin ew navê timamker bête tewandin her navek li dîv regezê navê xwe dê nîşana doxê tîyan wergirî eger nav nêr bît dê nîşana (î) wergirî wekî di rista jimare (3) ê da ku navê (Ehmed) nîşana (î) wergirtiye. Eger navê mê bît dê nîşana (ê) wergirî wekî di rista jimare (4) da ku navê (Şirîn) nîşana (ê) wergirtiye.

Her çende ku di zimanê kurdî da tişt ji duyê û pêhel bi komê tete hijmartin, belê her wekî di ristên serî da jimarên (du, şeş, çar û sê) hatîne bikarînan. Belê nav bi êkîni (tak) diyar kirîne ev e jî di demekî daye eger karê ristê di demê borî yê teper û teneper da bît nav nîşana komê (an) wernagirî "Di devokên botan û behdînanî da ji bilî nîv û êkê hevalnavên jimareyî navên piştî wan dihên di barê tewandinê da herdem bi harîkariya nîşana komê ya navî **-an** dihêne tewandin."<sup>2</sup> Bo nimûne

1. Evro **dû** berxan bijêrin.

2. Subehî **çar** gulan dê çînim.

Eve jî di demekî da çêdibî eger karê ristê neboriyê teper û daxaziyê teper bîtin ew navê piştî hevalnavên jimareyî yê xurî dihên dê nîşana komê (an) wergirin. Her wesana hevalnavên xurî (eslî), demê du jimare ji wan ligel êk bihêne bikarînan (lêkdan) bi rêka amrazê lêkdanê (**û**) dihêne lêkdan. Bo nimûne:

1. Şeveka dî çil **û** pênc dînanan bixwen.

2. Te bîst **û** çar dînar xarin.

Xandina hevalnavên jimareyî di zimanê kurdî da ji jimara mezin berev jimara biçîk dihêne xandin. Bo nimûne:

<sup>1</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 284.

<sup>2</sup>Emir Celadet Bedir Han & Rocer Lescot, *Kürtçe Grameri (Kurmanci Lehcesî)*, 1990, Paris Kürt-Enstitüsü, r. 221.

Me milyonek û hizar û çarsed û pêncî û şeş dînar wergirtin.

Hevalnavên jimareyî dibine bersiva peyva pirsyarî (çend). Wek:

Te **çend** pênivîs kirîn?

Min **çar** pênivîs kirîn.

## 2. 1. 5. 2. Hevalnavên Curê Payedar (Tertîbî – Rutbî) Rêzîn<sup>1</sup>- Rêkxistin

Ev curê hevalnavî “Curê payedar rêz û ser û ber û peyîska navan (çêşin û rîzî jimêrawekan) pê têne diyarkirin.”<sup>2</sup> Ev hevalnave rêzbendiya navan didene diyarkirin. Bo nimûne:

1. Ew qotabî li rêza çendê hat?

- Ew qotabî li rêza **êkê** hat.

- Ew qotabî li rêza **pêncê** hat.

Di van ristan da diyar dibît ku rêza ew qotabiyê behis jê hatiye kirin li kîj rêzê hatiye, ev hevalnavên payedar di kurmanciya serî devoka behdînan da bi ser ve berdana nîşana (ê) li ser hevalnavên xurî dihête berdan û hevalnavê payedar (rêzîn) jê dirust dibîtin “Hevalnavê jimareyî (pileyî) ji (jimare + (-ê)<sup>3</sup> dihête dirustkirin her wekî di ristên serî da diyar bîn. Her wesana ev curê hevalnavî li dîv navî ra dihêtin ev nav e “Divêt di awayê yekînî (tak) da bêt.”<sup>4</sup> Bo nimûne:

1. Kiça **çarê** li govendê hevala min e.      2. Yarîkerê **pêncê** ji yaryê hate derêxistin.

Di rista jimare (1) da navê (kiç) bi kitê hatiye diyarkirin. Di rista jimare (2) jî navê (yarîker) bi kitê hatiye diyarkirin. Ew navê berî hevalnavên rêzîn dihên amrazên danepal werdigrin.

Hevalnavên jimara rêzîn dibine bersiva hevalnavê pirsyarî (**çendê**). Ev cur Reşîd Kurd dabeşê sê beşa kirye: (jimara parker, jimara kumzîk, jimara piçjimar.)

<sup>1</sup>Bahoz Baran, hb., r. 78.

<sup>2</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 284.

<sup>3</sup>Segvan Cemîl Mihemed, *Morfîma (-a) û taybetmendiyên Wê di Kurmanciya Jorî da*, Nama Masterê, Kolîja Adabê, Zankoya Duhokê, 2008, Duhok, r. 104.

<sup>4</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 286.

## 2. 1. 5. 2. 1. Hevalnavên Jimara Parkir (Dabeşkirnê- Ducarkirî)

Hevalnavê jimara parkir “Hijmara lêkveker ew hijmar e ya ku di hijmartinê da wekî êk bê kê m û pêtir lêkve diken bi rêka ducarkirina hijmara bingehî.”<sup>1</sup> Ji vê dihête zanîn ku ew hijmarên bingehîn di ristê da du cara li dîv êk dihêne bikarînan “Di kurmancî da hevalnavên jimara parkir ji dubarekirina hevalnavên jimara bingehîn dirust dibin.”<sup>2</sup> Bo nimûne:

1. Gula **êk êk** biken.
2. Sêva **sê sê** raken.

Di ristên jimare (1, 2) yên serî da diyar dibin ku hevalnavên jimara ducarkirî wesfa navên (gul û sêv) yên kirîn. “Hindek cara paşpirta (**e**) bi ser hijmara duwê ya dûcarkirî (dûpat) ve dihête berdan.”<sup>3</sup> Bo nimûne:

1. Bizmara pênc pênce ji erdî raken.
2. Gula sê sêye jêken.

Di rista jimare (2) da pîta (y) kevtiye di nav bera dengên (ê, e) da ji ber ku her du dengên bizwên in “Hindek caran wekî peyvek **bi** ek dikevîte berî jimara duwê.”<sup>4</sup> Bo nimûne:

1. xoxa êk **bi** êk bişon.

Di kurmanciya serî da li cihê (êk êk, êk êke), ( ket ket yan ket kete) û li cihê (du du, du duwe), (cot cot yan cot cote) dihêne bikarînan. Bo nimûne :

1. Mamostaya **ket kete** silav ken.
2. Destên xwe **cot cote** bişon

Her wesan ev ristên xarê Sadiq Amêdî (êk êke û sê sêye) wekî hevalnavên jimara ducarkirî dayne diyarkirin:

1. “**Êk êke** (yek yeke) werin çu cara du dwe nehên.
2. **Sê sêye** neçine di jor ve.”<sup>5</sup>

Lê belê bi dîtina min eve wesfa karî diken ku divan ristan da dibine hevalkar.

<sup>1</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 287.

<sup>2</sup>Kemal Badıllı, *türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehcesi)*, Ankara Basım ve Ciltevi – Ankara, 1965, r. 55.

<sup>3</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 287.

<sup>4</sup>Kemal Badıllı, hb., r. 55.

<sup>5</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 287.



## 2. 1. 5. 2. 2. Hevalnavên Jimara Komzîk (Jimara Şikestî<sup>1</sup> - Kertî)

Ev hevalnave parçekirina tiştî diyar diketin “Ev cure rengdêr di warê hejmarî de beş û parçeyên navdêran nîşan didin.”<sup>2</sup> Mebest jê ewe ku ew navên dihêne saloxdan beş beş û parçe parçe dibin di bikarînanê da. Anku hevalnavên jimara şikestî “Ew hijmar e ya ku huyriya mewsuftî diyar û eşkera diket ku ji yekî pêdane neku jêhel didete diyarkirin û xuyakirin.”<sup>3</sup> Di dirustkirina evî hevalnavî da “Bi ser ve berdana paşpirta (paşgirî) (êk) bi ser hijmara bingehî durist dibît.”<sup>4</sup> Bo nimûne:

1. **Sêyêka (sê êka)** bajarî maye bê av.
2. **Wî çar êka** malê xwe da feqîran.

Eger em berê xwe bideyne wan navên di van ristan da hatîne bikarînan (bajar, mal) di van ristan da her êk ji van navan di bineret da tamam in lê digel bikarînanê beş beş bûne anku kêmasî yan jî beşek jê hatiye dabirîn. Di ristên jimare (1) da (bajar) bûye sê beş. Di rista jimare (2) da (mal) bûye çar beş û beşek jê hatiye dan bo feqîran.

Li dîv wan ristên serî hevalnavên jimara şikestî herdem berî navî dihêne bikarînan, Her wekî di nimûnên serî da diyar bîn.

## 2. 1. 5. 2. 3. Hevalnavên Jimara Piçjimar

Ev hevalnave “Piçjimar, her wekî ji navê wê xuyaye bi kêrî jimartin a piç û perçe yên nav tê.”<sup>5</sup> Hijmara piç piçiyê û pirt pirt bûna navê tiştî diyar diket, dirustkirina vî hevalnavî bi ser ve berdana “yek”<sup>6</sup> yan jî “ek yan yek”<sup>7</sup> li ser hevalnavên curê xurî wekî (nîvek, pêncyek, sêyek, anku ji wî tiştê hatiye diyarkirin nîvek ji pêncan, yek ji sêyan, yek...) bi dîtina min ev beşe çî cudahî digel hevalnavê jimara şikestî da nîne çunkî her du êk mebest digehînin (çarêk yan çaryek) her mebest ji çarê ewe ku bibîte çar beş û beşek jê vedibît, bo nimûne:

1. **Sêka** malî hate havêtin.
2. **Çarêka** zevyê min kêla.

<sup>1</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 287.

<sup>2</sup>Nezîr Ocek, hb., r. 152.

<sup>3</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 287.

<sup>4</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hc..

<sup>5</sup>Reşîd Kurd, hb., r. 61.

<sup>6</sup>Reşîd Kurd, hc.

<sup>7</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 288.

Eve jî ji layê dirustkîrnê ve wekî hevalnavê jimara şikestî dirust dibît.

## 2. 1. 6. Hevalnavên Nisbî (Rêjeyî)

Hevalnavê nisbî ji wan hevalnavan ra dibêjin yê ku peywendiya wan bi tiştêkê dî ve diyar dibît. “Awelnawî nisbî ew cure awelnaweye, kewa rastewxo delaletî şitêk ranageyênê, belko le rêgey pêwendiyewe be şitî diyewe wata dedatwate be hoy pêwendî be diyardeyekewe yan rûdawêkewe der dekwê.”<sup>1</sup> Dibîtin her ji ber hindê bîtin peywendiya vî curê hevalnavî bi tiştên dî ve watayê didetin nav lê kirye “hevalnavê pêwendiyê”<sup>2</sup> ew diyardên hevalnavê pêwendiyê pê diyar dibin hindek ji wan evin “cîh -û war, ’eşî, dîn, mezheb, zanist”<sup>3</sup> ku pitir diyar bibît ev nimûnên li xarê hatîne bikarînan:

1. Melayê Cizîrî helbestvanekê mezin bû.	→	Cîh û war
2. Celal Telebanî serokkomarê Îraqê bû.	→	Eşîr
4. Kurdên Cohî dewlemend in.	→	Dîn
5. Ew Henefî ne.	→	Mezheb
6. Şînwarên dîrokî ji nav diçin.	→	Zanist
7. Bilozekê pîvazî li ber azad bû.	→	Zewzewat
8. Kirasê pirteqlî li bejna te dihêt.	→	Fêqî

Her wekî em dibînin ji van ristên serî diyar hevalnavên nisbî ji navekî û paşgirê (î) hatîne darêjtin “Awelnawî lemerî le nawêk û emrazêkî paşgirî(yî) pêk yet, we peywendî kesêk ya şitêk be şiwînêkî zanraw yan be kesêk ya şitêkî tirewe pîşan edat.”<sup>4</sup> Herwesana dema diçite ser hindek navên fêqî û zewzewatî “Rengî di zimanê kurdî da – govera Behdînî dirust diket.”<sup>5</sup> Herwesana paşgirê (î) bi ser hindek (navên

<sup>1</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r. 126.

<sup>2</sup>Kadri Yıldırım, hb., r. 260.

<sup>3</sup>Kadri Yıldırım, hb., r. 259.

<sup>4</sup>Ehmed Hesên Ehmed, *Rîzmanî Kurdî*, Çapî yekem, Çapxaney Dar El – Cahiz, 1976, Bexda, r. 152.

<sup>5</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, *Taybetiyên Hevalnavî di Zimanê Kurdî da (Diyalêkta Serî – Govera Behdînî)*, Nama Masterê, Kolîja Adab, Zankoya Duhok, 2008, Duhok, r. 51.

taybet bi golan ve û navên werzên salê û navên giştî )<sup>1</sup> ve dihête zêdekirin hevalnavên nisbî jê dihête duristkirin. Bo nimûne:

1. Gula binefşî bide min.
2. Te qemîsekê biharî kirî.
3. Dara kirmî bi kêrî sotnê nahêt.

Paşgirê (î) di babetê hevalnavên darêjtî da li laperên (40, 41) da pitir hatiye diyarkirin.

Hevalnavên nisbî di zimanê kurdî kurmnciya serî da bi harîkariya paşgirên “î, -okî, -în) û pêşgirê (-bê) û amrazê **ne**”<sup>2</sup> dihêne dirustkirin.

Ew hevalnavên nisbî yên ji paşgirê (î) dihêne darêtin ramana esil û binaxeya wî navê hatiye wesfkirin digehînt. Ew hevalnavên nisbî yên ji paşgirê (în) dihêne dirustkirin curê wî babetî diyar diket yê tişt jê dihête dirustkirin. Wek:

1. Yariyên agrîn metirsîdar in.
2. Gostîrên zêrîn ji wan hatin xastin.

Ew hevalnavên ji paşgirê (okî) dirust dibin biçûkî û kêmasiya navî didene diyarkirin. Wek:

4. Mirovê xaz xazokî yê bê şerm e.
5. Ew korê xemokî hat.

Yên ji paşgirê (bê) dirust dibin bê beşî û bê behriya navê diyar kirî didene diyarkirin. Wek:

6. Mirovê bêmâl yê jar e.
7. Xarna bêxwê nahête xarin.

Ewên bi amrazê (ne) dirust dibin nerênî û dijayetiye nîşan diden. Wek :

8. Ew kiça nesax ji xestexanê derkeft.
9. Xiwarnê nebaş dibête egerê nesaxiyê.

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 51.

<sup>2</sup>K. K. Kurduyêf, *Rêzmanî Kurdî be Kerestey Diyalêktî Kirmancî û Soranî*, Wergêranî Kurdistan Mukriyanî, Çapxana el – Edîb el – Bexdadî, 1984, Bexdad, r. 108.

Paşgirên (anî, dar)<sup>1</sup> jî li ser navî dihêne zêdekirin û hevalnavên nisbî dirust diken. Wek:

10. Ew jinka zelam**kanî** hat.                      11. Pêşmerge birîndar çareserî bo hat kirin.

## 2. 1. 7. Hevalnavên Karî (Awelnawî Firmanî)

**Hevalnavên karî (Firmanî) dibine du beş: Hevalnavên Biker (Awelnawî Biker), Hevalnavên Kiraw (Awelnawî Kiraw)<sup>2</sup>**

Kanê çewa di bikarînanê da beşekê zor ji hevalnavan weko nav di ristan da bi kar dihên wesan jî beşekê zor ji navan wekî hevalnav bi kar dihên “Le zimanî kurdî da jimareyêkî zor le nawî kara û nawî berkar debine awelnaw.”<sup>3</sup>

### 2. 1. 7. 1. Hevalnavên Biker (Awelnawî biker- kara)

Hevalnavên bikerî ew peyv in ku sîfetekê berdewam didene helgirê xwe û delaletê ji bikerî diken “Ew awelnaweye ke le çawig (elmesder) wergîrê.”<sup>4</sup> Ev hevalnavê bikerî ne bitinê ji çawigî dihête wergirtin anku dirust kirin belkî hindek ji wan ji navan jî dirust dibin. Hevalnavên bikerî du cure:

1. Awelnawî Bikerî Sade (Hevalnavê Bikerê Sade)
2. Awelnawî Bikerî Lêkdiraw (Hevalnavê Bikerê Lêkdayî)<sup>5</sup>

Awelnawî bikerî sade dibît nivîserî merem jê ew bît ku ji peyvên sade dihête dirustkirin belê eger pêşgirek yan paşgirek, yan her du ligel peyva sade bihêne bikarînan wê gavê ew peyv ji çarçûvê sadeyî derdikevît û dibîte peyveka darêjtî, ji ber vê êkê li cihê hevalnavên bikerê sade dê (Hevalnavên Bikerê Darêjtî) bi kar înim.

### 1. Hevalnavên Bikerê Darêjtî

Ev curê hevalnavî bi şêweyekê giştî ji çawigan û navan dihêne dirustkirin, demê ji çawigan dihêne dirustkirin dê qedê çawigî yan regê çawigî wergirîn digel pêşgirekî yan paşgirekî yan jî herdukan. Navê sade jî digel paşgirekî dê vî curî dirust ket. Bo nimûne:

1. Mirovê **xîner** zo xwe pêşdiêxît.                      2. Mirovên **melevan** dixendiqin.

<sup>1</sup>Îbrahîm Remezani Zaxoyî, *Rêzmana Kurdî – Qewaid el – Loxe el – Kurdiye*, Çapa Êkê, Çapxan Xanî, 2008, Dohuk, r. 60.

<sup>2</sup>Nurî Elî Emîn, *Rêzmana Kurdî*, Çapa çuwarem, Çapxaney Rojhelat, 2014, Hewlêr, r. 134.

<sup>3</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r. 212.

<sup>4</sup>Nurî Elî Emîn, hb., r. 134.

<sup>5</sup>Nurî Elî Emîn, hb., r 134-135.

3. Qotabiyê **zana** mirovî xweş divêt.  
bi rê ve diben.

4. Mirovên **xandevan** miletan

Di van ristên serî da ew peyvên reştir diyar her êk ji wan saloxdana navekî kirye bûyne hevalnavên bikerê darêjtî. Di rista jimare (1) da peyva (xîner) bûye sîfetek bo navê (mirov). Di rista jimare (2) da peyva (melevan) sîfetek daye navê (mirov). Di rista jimare (3) da peyva (zana) sîfetek daye navê (qotabî) û di rista jimare (4) da peyva (xandevan) sîfetek daye navê (mirov).

**Hindek ji wan yasayên çewayiya dirustkirina hevalnavên bikerê darêjtî dirust diken evên li xarêne:**

**1. Qedê çawigê teneper + paşgir (î) → Hevalnavên bikerê darêjtî**

“mir + î → mirî

keft + î → keftî

hat + î → hatî”<sup>1</sup>

(nivistî, çuyî, mayî, bezî, borî,...hwd)

Eger qedê çawigê bi pîta bizwêna (a, û) bi dumahîk bihêt anku çawigê (elfî û wawî) bît wî demî dê navbenda (y) kevîte di navbera pîtên bizwên û paşgirê (î) da belê eger çawigê (yayî) bît “dê n çawigê hête havêtin.”<sup>2</sup> anku ladan.

**2. Qedê çawigê têper + paşgir (ewar, evan) → h. b. d**

“Xuwînd = xuwînd + ewar(evan) = → xuwîndewar (xuwîndevan)”<sup>3</sup>

(xandevan, xuwendewar, xandevan,...hwd)

**3. Qedê çawigê + paşgirê (e) → h. b. d**

xewt + e → xewte

bijart + e → bijarte

**4. Pêşgir + Qedê çawigê teneper + paşgir → h. b. d**

ve + mir + î → vemirî

(vebûyî, dahatî, hilketî, rahiştî, wergirtî,...hwd)

**5. Pêşgir + regê karî → h. b. d**

“ ne + mir → nemir

ne + zan → nezan

<sup>1</sup>Zêrîn Xorşîd Selîm, *Elomorî di Zimanê Kurdî da*, Çapa Êkê, Çapxaneyê Xanî, 2012, Duhok, r. 68.

<sup>2</sup>Emir Celadet Bedir Han & Rocer Lescot, hb., r. 153.

<sup>3</sup>Lijnek ji Wezaretê Perwerdê, *Ziman û Edebê Kurdî*, bo Pola Yazdê Amadeyî, Çapa Duwê, Çapxana Dar Lubnan, Lubnan, r. 45.

ne + tirs → netirs”<sup>1</sup>

(nebîn, bikir, helgir, helkêş, dagir, ragir, vegir,...hwd)

**6. regê karî + paşgir → h. b. d**

“lerz + ok → lertzok

ger + ok → gerok

nûs + ek → nûsek

zan + a → zana”<sup>2</sup>

“tirs + nok → tirsinok

girî + nok → girînok”<sup>3</sup>

“bijar + e → bijare

xwe+ re → xwere

ke+ re → kere”<sup>4</sup>

(beza, bîna, nivîser, bêjer, xwîner, birek,...hwd)

**7. Pêşgir + regê karî + paşgir → h. b. d**

“bi + ke + er = biker → neker”<sup>5</sup>

(dahêner, rahêner, bixor, nexor,...hwd)

**8. nav + paşgir → h. b. d**

Jimareka zor ji paşgiran dikevne ser navî û hevalnavên bikerê darêjtî dirust diken ew paşgirên dihêne ser navî (mend, bar, ger, gar, van, wan, ewan, ewa, nde, wer, wî, yar, rew, , ek, er,...hwd)\* bo nimûne :

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 50.

<sup>2</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r. 213.

<sup>3</sup>Lijney Ziman û Zanistekani le Korî Zanyarî Kurd, *Rêzmanî Axawîniî Kurdî*, Çapî Duwem, Çapxaney Aras, 2011, Hewlêr, r. 205

<sup>4</sup>Fazil Omer, *Gîrekên Zimanê Kurdî*, Çapî Êkem, Çapxana Wezareta Perwerdê – Hewlêr, 2005, Hewlêr, r. 39.

<sup>5</sup>Lijnek ji Wezareta Perwerdê, hb., r. 44.

\* ji van Serçawan mifa Hatiye Wergirtin :

<sup>1</sup>Lijnek ji Wezareta Perwerdê, hb.

<sup>2</sup>Fazil Omer, *Gîrekên Zimanê Kurdî*.

dar + van → darvan  
 hoş + mend → hoşmend  
 tawan + bar → tawanbar  
 dad + ger → dadger  
 ba + wî → bawî  
 zirt + ek → zirtek  
 kuç + er → kuçer

## 2. Hevalnavên Bikerê Lêkdayî

Hevalnavên bikerê lêkdayî bi vî rengê li xarê dirust dibin:

**1. nav + regê karî + paşgirê ( î ) → h. b. l**

“kor + mir + î → kormirî  
 zik + sût + î → ziksotî  
 hinavr + kuzir + î → hinavkuzirî”<sup>1</sup>

**2. hevalnav + regê karî**

geş + bîn → geşbîn  
 xoş + nûs → xoşnûs

**3. hevalkar + regê karî + paşgir → h. b. l**

kêm + xo + r → kêmxor  
 zor + xo + r → zorxor

(kêmker, zorker, pirker,...hwd)

**4. hevalkar + regê karî → h. b. l**

pir + bêj → pîrbêj

**5. nav + regê karî + paşgir → h. b. l**

mal + ke + er → malker  
 dil + be + er → dilber

<sup>1</sup> Sadiq Bihadedîn Amêdî, hb., r. 391.

**6. nav yan cihnavê xuweyî + regê karî** → **h. b. l**

dest + kird → destkird

xo + kird → xokird

**7. cihnavê xuweyî + regê karî** → **h. b. l**

xo + firoş → xofiroş

xo + ragir → xoragir

**8. dûbarekirina peyvê + paşgirê (-ok)** → **h. b. l**

xaz +xaz + ok → xazxazok

sil +sil+ ok → silsilok

(mijmijok, pispisok,...hwd)

## **2. 1. 7. 2. Hevalnavên Kiraw (Awelnawî Kiraw )**

Ew peyv in ku kiryarek serda hatibît û ji encamê wê kiryara bi ser da hafî sîfetekê berdewam didete wî navê keftiye pal bi harîkariya amrazên palvedanê (**a, ê, ên-êd-êt**).

Hevalnavên kiraw (Awelnawî kiraw ) dibine du beş: Hevalnavên Kirawê Darêjtî, Hevalnavên Kirawê Lêkdayî.

### **1. Hevalnavên Kirawê Darêjtî :**

Ew hevalnav in “ji çawigê têper û têneper biladana nûna çawigê û zêdekirina paşgirê (î) ”<sup>1</sup> dirust dibin. Bo nimûne:

1. Kewekê **koştî** li ser rêka me bû.

2. Ew dara **çandî** hate kezaxtin.

3. Dergehê **şikestî** hate zivrandin.

4. Diravê **xarî** nazivrite ve.

---

<sup>1</sup>Lijnek ji Wezaretê Perwerdê, hb., r. 61.



Di van ristên serî da peyvên (**koştî, çandî, şikestî, xarî**) kiryarek ya bi ser da hatiye xarê ne yadiyare kanê bikerê kiryarê kî ye, û sîfeteke berdewamiyê ya daye navê li berê hatiye bikarînan.

Yasaya dirustkirina wan:

**Qedê Çawigê Têper + paşgirê (î) → h. k. d**

nivîsî + î → nivîsî

xar + î → xarî

firoşt + î → firoştî

(birî, cemidî)<sup>1</sup>

**Qedê Çawigê Têneper + paşgirê (î) → h. k. d**

sot + î → sotî

şikest + î → şikestî

(keftî, mirî, hatî, nivistî,...hwd)

**2. Hevalnavê Kirawê Lêkdayî :** Ev hevalnave bi vî rengî dirust dibin:

**Nav + Qedê Çawigê Têper + paşgirê (î) → h. k. l**

ser + bir + î → serbirî

(destgirtî, destbirî, dilgirtî,...hwd)

**Nav + Qedê Çawigê Têneper + paşgirê (î) → h. k. l**

dil + sot + î → dilsotî

(cergsotî, jinmirî,...hwd)

---

<sup>1</sup>Emir Celadet Bedir Han & Roger Lescot, *Kürtçe Girameri (Kurmanci Lehcesi)*, 1990, Paris Kürt Enstutüsü, r. 276.

**Hevalnav + Qedê Çawigê Têper + paşgirê (î) → h. k. l**

reş + kir + î → reşkirî

sor + kir + î → sorkirî

(rastkirî, bilindkirî, xoşkirî,...hwd)

**Hevalnav + Qedê Çawigê Têneper + paşgirê (î) → h. k. l**

bihêz + keft + î → bihêzkeftî

şêlî + bû + î → şêlibûyî

**Nav + Qedê Çawigê Darêjtî + paşgirê (î) → h. k. l**

ser + jêkir + î → serjêkirî

dest + pêkir + î → destpêkirî

## **2. 2. Hevalnav ji Layê Binyadê (Pêkhatin) ve**

Derbarey pêkhatina hevalnavî her wekî babetên dî ji layê zimanzanên kurd ve bi şêweyên cuda cuda hatîne dabeşkirin:

**Hevalnav ji Layê Binyadê (Pêkhatin) ve: Hevalnavên Sade (Xweru), Hevalnavên Darêjtî, Hevalnavên Lêkdayî<sup>1</sup>**

### **2. 2. 1. Hevalnavên Sade (Xweru)**

Ew hevalnave yê ji peyveka serbixwe pêkhatî. Wek: can, sipî, şîrîn, bilind, reş, xweş...hwd.

### **2. 2. 2. Hevalnavên Darêjtî**

Ew hevalnav in yên ji peyveka ser bixwe û digel pêşgir yan paşgirekî yan jî digel her dûkan pêk dihên, merem ji pêşgir û paşgiran ew morfîm in (gîrek)in yên peyvan darêj in. “Em core gîreke pîruseyêke le rêgey gurînî beşe axawtin yan gurînî

---

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 47.

watawe wişey niwêy lê dirust debêt.”<sup>1</sup> Ev morfîmên peyvan darêjin, dema digel peyveka ser bixwe bi kar hatin yan divêt pişka axiftinê bigohorît yan jî divêt watayê bigohorît û peyveka nû dirust biket.

Pêşgirên hevalnavê darêjtî dirust diken hemî ne wekî êk çalak in di dirustkirina hevalnavên darêjtî da.

### a. Pêşgirên Hevalnavên Darêjtî Dirust Diken:

Ew pêşgirên di devoka behdînê da hevalnavên darêjtî dirust diken (**ne, bê, bi, çê, têk, hev, hem, hil, hel, da, ra, ve, wer...hwd**)

Pêşgirê (**ne**) her wekî di hevalnavên nisbî da jî amaje pê hatiye kirin digel (navî, hevalnavî, navê biker û navê kiraw) her wesan ji regên karî jî dihêne dirust kirin.

#### Pêşgirê (ne-)

1. “/ne<sup>-</sup>/ + nav → hevalnavên darêjtî”<sup>2</sup>

/ne<sup>-</sup>/ + yar → neyar

(nemêr, nemerd, neçar, nedar,...hwd)

2. /ne<sup>-</sup>/ + hevalnav → h. d

/ne<sup>-</sup>/ + rast → nerast

( nebaş, nesax, nexaş, netemam, nedirust,...hwd)

3. /ne<sup>-</sup>/ + regê karî → h. d

/ne<sup>-</sup>/ + bîn → nebîn

( nemir, nerev, nebez, netirs, nezan...hwd)

<sup>1</sup>Baziyan Yunis Mihyedîn, *Peywendî Astî Morfolocî be Astî Fonolocî û Sîntaks*, Piley Master, Zankoy Selahedîn, Kolîjî Ziman, 2008, Hewlêr, r. 16.

<sup>2</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 50.

**4. /nē/ + qedê çawigî + î → h. d**

/nē/ + kir + î → nekirî

(negirtî, neçûyî, nemayî, nemirî, nekirandî,...hwd)

### **Pêşgirê (bê-)**

**/bê̄/ + nav → h. d**

/bê̄/ + hiş → bêhiş

(bêmal, bêaqil, bêkes, bêhîvî, bêderd, bêfam, bêxem, bêdil, bêxêr, bêkêr,...hwd)

**/bê̄/ + hevalkar → h. d**

/bê̄/ + la → bêla

(bêbin, bêrex)

### **Pêşgirê (bi-)**

**1. /bī/ + nav → h. d**

/bī/ + mal → bimal

(birêz, bican, bidil, bixêr, bihîvî, bieqil, bişerm, bidar, bieşq,...hwd)

**2. /bī/ + regê karî → h. d**

/bī/ + kir → bikir

(bikuj, bibir)

### **Pêşgirê (çê-)**

**/çê̄/ + qedê çawigî + î → h. d**

/çê̄/ + kir + î → çêkirî

/çê̄/ + bû + î → çêbûyî

### **Pêşgirê (ve-)**

/ve<sup>-</sup>/ + qedê çawigî + î → **h. d**

/ve<sup>-</sup>/ + kir + î → vekirî

(vebûyî, veçemandî, vegirtî, vedayî, veşartî, .....hwd)

### **Pêşgirê ( ra )**

/ra<sup>-</sup>/ + qedê çawigî + î → **h. d**

/ra<sup>-</sup>/ + xist + î → raxistî

(rabûyî, rawestandî, rahiştî, rakirî, ragirtî, razayî,...hwd)

### **Pêşgirê (da-)**

/da<sup>-</sup>/ + qedê çawigî + î → **h. d**

/da<sup>-</sup>/ + xist + î → daxistî

(darizandî, dagirtî, dadayî, dakirî, damayî, dahatî,...hwd)

### **Pêşgirê (têk-)**

/têk<sup>-</sup>/ + qedê çawigî + î → **h. d**

/têk<sup>-</sup>/ + çû + î → têkçûyî

(têkdayî, têkbirî,...hwd)

### **Pêşgirên (hel-hil-)**

**Pêşgirên (hel-hil-)** bi êk wata dihêne bi kar înan.

/hel-hil<sup>-</sup>/ + qedê çawigî + î → **h. d**

/hel- hil<sup>-</sup>/ + girt + î → helgirtî

(helkeftî, helkirî, heldayî, helbûyî, helkêşayî, helhatî, helbijartî,...hwd.)

**/hel-hil̄/ + regê karî** → **h. d**

/hel- hil̄/ + gir → helgir

/hel- hil̄/ + kêş → helkêş

### **Pêşgirên (hev-hem-)**

**Pêşgirên (hev-hem)** bi êk wata dihêne bikarînan.

**/hev-hem̄/ + nav** → **h. d**

/hev- him̄/ + xem → hevxem

(hevsinor, hevdeng, hevpişk, hevvelat, hevderd, hevwest, hevdîn, hevwar,...hwd.)

### **Pêşgirê (wer-)**

**/wer̄/ + qedê çawigî + î** → **h. d**

/wer̄/ + girt + î → wergirtî

(werbadayî, werpêçayî,...hwd)

Her wesan (ber, ser, pêş, bin, jêr) wek pêşgir têne bikarînan û hevalnavên darêjtî jê dirust dibîtin.

(**ber**) wek pêşgir hevalnavên darêjtî dirust diketin

**/ber̄/ + nav** → **h. d**

/ber̄/ + çav → berçav

(berdad, berdest, bermal,...hwd)

### **(ser)**

**/ser̄/ + nav** → **h. d**

/ser̄/ + dest → serdest

(serkar, serêş,...hwd)

**(pêş)**

/pêş<sup>̄</sup>/ + nav → h. d

/pêş<sup>̄</sup>/ + çav → pêşçav

( pêşçax, pêşdem, pêşber, pêşkat, pêşwext,...hwd . )

**(bin)**

/bin<sup>̄</sup>/ + nav → h. d

/bin<sup>̄</sup>/ + dest → bindest

/bin<sup>̄</sup>/ + av → binav

**(jêr)**

/jêr<sup>̄</sup>/ + nav → h. d

/jêr<sup>̄</sup>/ + dest → jêrdest

(jêrerd, jêrxak, jêrav,...hwd)

### **b. Paşgirên Hevalnavên Darêjtî Dirust Diken:**

Dibît jimara bikarîna paşgiran pitir bin ji jimara bikarîna pêşgiran di kurmanciya serî devoka behdînan da di dirustkirina hevalnavên darêjtî da. Ew paşgirên di vê devokê da dihêne bikarînan çi digel (navî, hevalnavî, karî, ...hwd.) da li xarê dihêne bikarînan, paşgirên (dar, î, î, mend, van, evan-ewar, bar, baz, bend, yar, wî, a, gîn, ar, ane, kanî-anî, ewer-wer-awer, ezar, k, nok-ok, ek, e, n, eng, u, elu, ewî, kî, ekî, ger, er)

**paşgirê (-dar)**

nav + /<sup>̄</sup>dar/ → h. d

rêz + /<sup>̄</sup>dar/ → rêzdar

(bihadar, berhemdar, evîndar, maldar, nirxadr, jandar, nazdar, guhdar, dîndar, ...hwd)

### **paşgirê (-î)**

Ev paşgire gelek dihête bikarînan her wekî li jêr navê hevalnavên nisbî (rêjeyî) da amaje pê hatiye kirin, bi şeweyekê ber fireh digel navan dihête bikarînan. Ev paşgire digel navên cih û warî dihêne bikarînan û hevalnavên darêjtî dirust diken.

**nav + /î/ → hevalnavên darêjtî**

Bidlîs + /î/ → Bidlîsî

(Kurdî, Turkî, Erebî, Bajarî, Çiyayî, Gondî, Duhokî,... hwd)

Dikevîte ser navên (şev û roj) an bo pesindana xarnê. Wek:

şev + /î/ → şevî

roj + /î/ → rojî

Dikevîte ser navên giştî hevalnavên darêjtî dirust dibîtin. Wek:

birs + /î/ → birsî

(têhinî, depî, textî, darî, kirmî,...hwd)

Dikevîte ser navên hindek ji fêqî û zewzewatî û xarnê hevalnavên darêjtî dirust dibîtin. Wek:

pirteqal + /î/ → pirteqalî

(simaqî, pîvazî, kezanî, zeytonî, fisteqî, tehînî, narincî, hinarî,...htd)

Dikevîte ser navên werzên salê hevalnavên darêjtî dirust dibîtin. Wek:

bihar + /î/ → biharî

(havînî, payîzî, zivistanî)

Dikevîte ser hindek navan û rengî jê dirust diketin û dibine hevalnavê darêjtî. Wek:

esman + /î/ → esmanî



(axî, binefşî, risasî,...hwd)

Her wesan dikevîte ser karên têper û têneper hevalnavên darêjtî dirust diken her wekî di babetê hevalnavên (biker, kiraw) da hatiye diyarkirin. Bo nimûne: (çûyî, dakeftî,...hwd)

### paşgirê (-în)

nav + /<sup>ˈ</sup>în/ → h. d

dar + /<sup>ˈ</sup>în / → darîn

(agrîn, depîn, rengîn, direwîn, şîrîn, zêrîn,...hwd.)

### paşgirê (-mend)

“nav + /<sup>ˈ</sup> mend / → hevalnavên darêjtî”<sup>1</sup>

bawer + /<sup>ˈ</sup> mend / → bawermend

(zerermend, hoşmend, dewletmend, behremend, aqilmend, honermend,...hwd)

### paşgirê (-van)

nav + /<sup>ˈ</sup>van/ → h. d

aş + /<sup>ˈ</sup>van / → aşvan

(nêçîrvan, gavan, bilorvan, temborven, dilovan, darvan,...hwd)

Di peyva (dilovan) da “derkewtinê dengê [ o ] bo mebestî xo guncandinê morfolociyane (morfi boş”<sup>2</sup>

### paşgirê (-evan-ewar)

qedê çawigî + /<sup>ˈ</sup>evan- ewar/ → h. d

xand + /<sup>ˈ</sup>evan- ewar/ → xandevan- xandewar

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 53.

<sup>2</sup>Viyan Silêman Hacî, *Kereste Betalekan le Riwangey Tiyorî Deslat û Bestinewe ((Şêwezarî Kirmancî Serû ))*, Namey Diktora, Kolîjî Ziman, Zankoy Selahedîn, 2007, Hewlêr, r. 128.

nivîs + /evan- ewar/ → nivîsevan

### **paşgirê (-bar)**

**nav + /bar/ → h. d**

xem + /bar / → xembar

tawan + /bar / → tawanbar<sup>1</sup>

(gonehbar, daxbar, koçbar,...hwd.)

### **paşgirê (-baz)**

**nav + /baz/ → h. d**

fêl + /baz / → fêlbaz

hîle + /baz / → hîlebaz<sup>2</sup>

(sêrbaz, rimbaz, canbaz,...hwd)

### **paşgirê (-bend)**

**nav + /bend/ → h. d**

sol + /bend / → solbend

nal + /bend / → nalbend

### **paşgirê (-yar)**

**nav + /yar/ → h. d**

cut + /yar / → cutyar

(hişyar, hestyar, bextyar,... hwd)

---

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 54.

<sup>2</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hc.

**paşgirê (-yar)**

**regê karî + /yar/ → h. d**

kir + /yar/ → kiryar

(zanyar, firoşyar, diyar,...hwd)

**paşgirê (-a)**

**regê karî + /a/ → h. d**

zan + /a/ → zana

(beza, bîna,...hwd)

**nav + /a/ → h. d**

av + /a/ → ava

fam + /a/ → fama

**paşgirê (-wî)**

**nav + /wî/ → h. d**

ba + /wî/ → bawî

(tawî, rêwî,...hwd)

**paşgirê (-gîn)**

**regê karî + /gîn/ → h. d**

xaz + /gîn/ → xazgîn

**nav + /gîn/ → h. d**

xem + /gîn/ → xemgîn

lez + /gîn/ → lezgîn

### **paşgirê (-ar)**

**regê karî + /ar/ → h. d**

xew + /ar/ → xewar

(diyar, nivîsar, mirar,...hwd)

**hevalnav + /ar/ → h. d**

kevin + /ar/ → kevnar

### **paşgirê (-ane)**

**nav + /ane/ → h. d**

sal + /ane/ → salane

(rojane, mêrane, dostane,...hwd)

### **paşgirê (-anî- kanî)**

**nav + /anî- kanî/ → h. d**

mêr + /kanî- anî/ → mêrkanî

(qereçkanî, jinkanî, koçerkanî, hirçkanî,...hwd)

### **paşgirê (-ewer- wer- awer)**

**nav + /ewer- wer- awer/ → h. d**

bext + /ewer- wer- awer/ → bextewer- wer- awer

(serwer, cengawer, dilawer,...hwd)

**hevalnav + /wer/ → wer- awer**

keç + /wer/ → keçwer<sup>1</sup>

---

<sup>1</sup> Fazil Omer, *Çend Awirek li Zimanê Kurdî*, Çapa Êkê, Çapxana Wezaretê Perwerdê, 2004, Hewlêr, r. 102.

### paşgirê (-zar)

**hevalnav + navbend (e) + /zar / → h. d**

şerim + e+/zar / → şermezar

teng + e+/zar / → tengezar

### paşgirê (-ik)

**hevalnav + /ik / → h. d**

xweş + /ik / → xweşik

(kinik, zerik, reşik, ...hwd)

### paşgirê (-ok)

**regê karî + /ok / → h. d**

ger + /ok / → gerok<sup>1</sup>

(lerzok, revok, xazok, mijok, ...hwd)

**nav + /ok / → h. d**

şerm + /ok / → şermok

(tirsok, kenok, ...hwd)

**“hevalnav + /ok / → hevalnavên darêjtî”<sup>2</sup>**

şermîn + /ok / → şermînok

(xapînok, kirêtok, nermînok, cihêlok, ...hwd)

### paşgirê (-înok)

**regê karî + /înok / → h. d**

gir + /înok / → girînok

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 59.

<sup>2</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hc.

xap + / ʔ înok/ → xapînok

**nav + / ʔ ek / → h. d**

zirt + / ʔ ek/ → zirtek

(parsek, çilek, dizek, virek,...hwd)

**regê karî + / ʔ ek / → h. d**

bir + / ʔ ek/ → birek

(sojek, kojek, nosek, firek,...hwd)<sup>1</sup>

**hevalnav + / ʔ ek / → h. d**

reş + / ʔ ek/ → reşek

bel + / ʔ ek/ → belek

**paşgirê (-e)**

**nav + / ʔ e / → h. d**

bend + / ʔ e / → bende

**“hevalnavnav + / ʔ e / → hevalnavên darêjtî”<sup>2</sup>**

nerm + / ʔ e / → nerme

(sore, xirabe,...hwd)

**Qedê çawigî + / ʔ e / → h. d**

bijart + / ʔ e / → bijarte

(xare, xewte, xande,...hwd)

---

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 60

<sup>2</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 59

### **paşgirê (-in)**

**nav + /in / → h. d**

xew + / in / → xewin

(şermin, goştin,...hwd)

### **paşgirê (-u)**

**nav + /u / → h. d**

zik + / u / → ziku

(riku, şansu, zewqu, kilmîşu,...hwd)<sup>1</sup>

### **paşgirê (-elu)**

**(nav + /elu / → h. d**

xwîn + / elu / → xwînelu

kerb + / elu / → kerbelu)<sup>2</sup>

### **paşgirê (-ewî)**

**“nav + /ewî / → hevalnavên darêjtî”<sup>3</sup>**

xwîn + / ewî / → xwînewî

êş + / ewî / → êşewî

### **paşgirê (-kî)**

**“nav + /kî / → hevalnavên darêjtî”<sup>4</sup>**

helbest + / kî / → helbestkî

xwelî + / kî / → xwelîkî

---

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 57.

<sup>2</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 56.

<sup>3</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hc.

<sup>4</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 56.

### paşgirê (-ekî)

nav + /ekî / → h. d

ser + /ekî / → serekî

### paşgirê (-ger)

nav + /ger / → h. d

dad + /ger / → dadger

duz + /ger / → duzger

### paşgirê (-er)

regê karî + /er / → h. d

nivîs + /er / → nivîser

(xwêner, dahêner, bêjer,...hwd)

### paşgirê (-eng)

Diçîte ser navî û hevalkarî hevalnavê darêjtî dirust diken. Wek: (çeleng, pêşeng).

nav + /eng / → h. d

çel + /eng / → çeleng

hevalkar + /eng / → h. d

pêş + /eng / → pêşeng

## 2. 2. 3. Hevalnavên Lêkdayî

ji wan pênasên bo hevalnavên lêkdayî hatîne kirin ji layê wan kesên divî barî da kar kirîn di hemî pênasan da, weku merc hatiye diyarkirin divêtin ji du peyvan yan zêdetir pêk bihêt, hevalnavên lêkdayî bi rengekê giştî (serekî) em di şêyn bêjîn ew hevalnav in ku bi kêmî ji du peyvên (morfîmên) watarar yên ser bexwe yan



zêdetir pêk bihên yan jî êk ji wan morfîman helgirên wataya peyveka ser bexwe bîtin.

Hevalnavên lêkdayî di zimanê kurdî da ji encamê xandina min bo vê vekolînê bi kêm û zêdeyî xwe di van yasayên li xarê hatîne diyarkirin pêk dihên:

“**nav + nav** → **hevalnavên lêkdayî**”<sup>1</sup>

bejin + çinar → bejinçinar

(bejinrihan, gerdenbilûr, çavxezal, cegerxwîn, serşeî, devşekal, destêş,...hwd)

**nav + hevalnav** → **hevalnavên lêkdayî**<sup>2</sup>

çav + reş → çavreş

(destkurt, tamsar, şevkwîr, bejinzirav, destdirêj, gohbel, kezîzer, siyarçak,...hwd)

“**nav + reg** → **hevalnavên lêkdayî**”<sup>3</sup>

mêr + kuj → mêrkuj

(cigarkêş, dengbêj, çîrokbêj, dîrokzan, cergbir, xêrxaz, aştxaz, çavhavêj,...hwd)

“**nav + amraz + nav** → **hevalnavên lêkdayî**”<sup>4</sup>

dil + bi + kul → dilbikul

(derdeser,destbişol, çavliê, dilbiêş,...hwd)

**Dubarekirina pêyvê + paşgir** → **h. l**

Çi bi dubarekirina (navî, hevalnavî, regê karî,...hwd.) digel hindek paşgiran hevalnavê lêkdayî dirust diken.Wek :

gulgul + /î / → gulgulî

(xazxazok, pispisok, silsilok, mêjmêjok, hefhefî, sorsore, girgire, kerkere,...hwd.)

<sup>1</sup>Xazî Elî Xorşîd, Rêzmanz Fermî, Çapî Yekem, Çapxaney Serdem, 2013, Silêmanî, r.61.

<sup>2</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r. 106.

<sup>3</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., 63.

<sup>4</sup>Kadri Yıldırım, hb., r. 252.

**nav + regê karî + paşgir** → **h. l**

mal + ke + /er / → malker

(şolker, kormirî, hinavkuzirî, ziksûtî,...hwd)

**Cihnavê xweyî + regê karî** → **h. l**

xwe + firoş → xwefiroş

xwe + ragir → xweragir

**nav + qedê çawigê darêjtî + paşgir** → **h. l**

ser + jêkir + /î / → serjêkirî

**“jimore + nav** → **hevalnavên lêkdayî”<sup>1</sup>**

çar + çav → çarçav

(dudil, sêser, êkdil, êkçav, heftrih, dûrî, çargoşe,...hwd)

**hevalnav + nav** → **h. l**

xweş + mêr → xweşmêr

kêm + aqil → kêmaqil

**hevalnav + hevalnav** → **h. l**

reş + belek → reşbelek

reş + esmer → reşesmer

**hevalnav + amraz + nav** → **h. l**

pîr + e + jin → pîrejin

pîr + e + mêr → pîremêr

---

<sup>1</sup>Xazî Elî Xorşîd, hb., r. 61.

**hevalnav + amraz + hevalnav** → **h. l**

sor + û + sipî → sorûsipî

(têrûtejî, xirûxalî, sorûzer, reşûtari,...hwd)

### **Dubarekirina Navî**

(xelekxelek) → **h. l**

### **Dubarekirina Hevalnavî**

(hîrhîr, reşreş,...hwd)

## **2. 3. Hevalnav ji Layê Pileyê ve**

Di zimanê kurdî da bi giştî sê pileyên hevalnavî di pertokan da dihêne dîtin: Pileya hevalnavên taybet (çespayî), pileya hevalnavên hevberkirinê, pileya hevalnavên bala.<sup>1</sup>

### **2. 3. 1. Pileya Hevalnavên Taybet**

Her ew hevalnav in yên di zimanê kurdî da dibêjnê hevalnavên çewayî (ter, şîrîn, sipî, reş, xar, şil...hwd, ev hevalnav e dibine binaxe bo dirustbûna her du pileyên dî. Di vê pileyê da nav nahêne hevberkirin, dema em navekî yan cihnavêkî bi hevalnavêkê çewayî salox dideyn bo me çewayiya wî navî diyar dibît. Bo nimûne:

1. Çîmen kiçeka **can** e.
2. Min ewa **zîrek** dît.
3. Wan xiyarên **ter** kirîn.

Di van ristên serî da peyvên (can, zîrek, ter) hevalnav in û çî nav hevberî êk nekirine bo me diyar dibît ku (çîmen) ya (can)e (azad) yê (zîrek)e û (xiyar) di ter in, ev pileye çî nîşanan wernagirît,

### **2. 3. 2. Pileya Hevalnavên Hevberkirinê**

Ev pileya hevalnavî du navan yan zêdetir yan jî du tiştan yan zêdetir hevberî êk diketin ku di pileyê da yan zêdetiriyê navî yan kêmtiriyê navî yan tiştî didete diyarkirin. “Beramberkirina xeyset navan nişan dike, ku lî kurmanci- da reng, cûre,

<sup>1</sup>Ebdulselam Necmedîn Ebdula û Selwa Ferîq Salih, *Rêzmana Kurdî ( bo Zarokan )*, Çapa Êkê, Çapxana Hecî Haşim, 2010, Hewlêr, r, 70-72.

teherê tiştan u xeysetê merivan, heywanan hemberi hev dîkin.”<sup>1</sup> Şêweyê dirustkirina pileya hevberkirî bi giştî ji amrazê (**ji**)<sup>2</sup> ku dikevîte berî navê duyê, yan tiştê duyê yê hev ber kirî û paş pirtika hevberiyê (**tir**)<sup>3</sup> dikevîte ser pileya hevalnavê taybet û pileya hevalnavên hevberkirinê dirust diketin. Bo nimûne:

1. Zerî **ji** Keviyê law**tir** e.      2. Gareşên me **ji** yên we qelew**tir** in.
3. To **ji** me zîre**tir** î.              4. Hîn **ji** me kirê**tir** in.

Her wekî ji ristên serî diyar ku hevberkirina du tiştan hatiye kirin ji layê zêdetirîya wê yan kêmtirîya wê. Belê li hindek deveran weku “Akrê û surçiyên amrazê (li) li çihê(ji) dihête bikarînan. Wek:

To **li** awazê nesaxtir î.”<sup>4</sup>

Gelek caran jî navê hevberkirî yê duyê dikevîte piştî hevalnavên pila hevber. Wek:

1. Rastî rastî dew xwe**tir** e **ji** mastî.              2. Fîl me**tir** e **ji** şêrî.

Hindik caran jî “daçeka “ji” li gorî rewşê carinan tê bikaranîn, carinan nayê bikaranîn.”<sup>5</sup> Ew jî di axiftina rojane da demê êk ji nav yan tiştê hevberkirinê nehête ragehandin. Wek:

1. Me kîça ciwant**tir** xast.                              2. Qotabiyê zîre**tir** derkeft.

Xaleka dîjî ya hevberkirinê ya hey ya berbelav e û gelek dihête bikarînan. Ew jî her bo hevberkirina du navan yan tiştan belê ev hevberkirin e wekhevîya wan didete diyarkirin ew jî bi peyvên (hindî, temet) herwesan peyvên (Wek, mîna)<sup>6</sup> ev çend e jî Reşîd Kurd êxistiye jêr navê pila hevalnavên hevberkirinê da. Lê belê Kadri Yildirim peyvên (Bi qasî, wekî hev, yek e) bi pila hevalnavê wekhevîyê li cihê pileya hevalnavê taybet bi kar îname. Bi dîtina min jî peyvên serî û peyvên (wekî, hindî, mîna, temetî) di kurmancî da pileya wekhevîyê dirust diketin. Ji ber ku madem em

<sup>1</sup>Qenatê Kurdo, hb., r. 58.

<sup>2</sup>Qenatê Kurdo, hb., r. 59.

<sup>3</sup>N. Bedir-Khan, *Nvîsa Min*, Enistutya Kurd Parîs, 1965, Parîs, r. 48.

<sup>4</sup>Vîyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 98.

<sup>5</sup>Kadri Yıldırım, hb., r. 261.

<sup>6</sup>Reşîd Kurd, hb., r. 57.

behsê pileyan dikeyn di hevalnavî da, anko hevalnav di çî pileyekê daye pileya wan navan yan tiştan dihête diyarkirin yê nê bi rû êk dihêne kirin. Ew jî divêtin pileya wan navan û tiştan yan wekhevî yan hevberkrî yan bala bîtin. Wek:

1. Sefîn **wekî** metînî yê çeleng e.
2. Nazê **hindî** te ya bilind e.
3. Hevala min **mîna** hevala te yê bilind e.
4. Şêrko **temetî** te yê qelew e.

### 2. 3. 3. Pileya Hevalnavên Bala

Pileya hevalnavên bala di zimanê kurdî da pileya navê (kes, tişt, giyanewer,... htd) ji nav hev toxmên xwe bi pileyekê beriztir ji yê dîtir didete diyarkirin. (Ew nav yan cihnavê ku dihête wesifkirin, ji hemî corên dîyên wekî wî beriztir e.)<sup>1</sup> Derbareyê dirustkirina pileya bala "Payeya beriztirîn di kurmanciya gelêrî de bi alîkariya hokerên pileya "**herî û tewrî**" pêk tê."<sup>2</sup> Her wesana "Di diyalêkta serî da – devoka behdînî hiç morfîmeka taybet bo pila bala nîn e."<sup>3</sup> Belge jî ji bo bçûna wê ewe ew berhemên li ser kurmanciya serî ji layê rojhelatnasan ve hatîne nivîsîn. Belê her du dan bihindê diden ku morfîma (**tîrîn**) keftiyê di nav axiftina kurmancî da "Le beşî here gewrey diyalêktî kirmancî jûru da nîşaneyêkî morfolojî taybetî ni ye, ke piley balay pê rubinrê."<sup>4</sup> Belê her di heman ropel da li binê xêzikê (rîfrêns) ê amaje bi çavkaniyekê kirye ku ya (meksîmî xemo) ye "Le nawçey Badînanî Kurdistanî Îraq da nîşaney (tir + î n — î n) be kar dênrê."<sup>5</sup> Nav birî peyva "here" bo dirustkirina pileya bala bi rêkeka herî ber belav nav diket di zorbeya zora kurmanciya serî da dihête dîtin ku dikevîte berî pileya taybet. Her wesana "Le nawçey badînan" her yê' her ya' her yêd" le pêş awelnawî piley berawirdewe be kar dênin û piley bala dirust debê."<sup>6</sup> Belê bi dîtina min formên " her yê' her ya' her yêd" li devoka behdînan da nahêne bikarînan, jêr navê "Cûrê (teherê) beramberkîna here zêdetir bî arik'ariya xeberên "hê", "dîha" u bî arik'ariya xeberên "jî hemûyan", "jî gîşkan" u paşp'irtîka "tîr" tê gotinê."<sup>7</sup> li gorî Kamuran Bedir- Xan pila bala bi vî rengên li xarê dihêne dirustkirin:

<sup>1</sup>Ebdulselam Necmedîn Ebdula û Selwa Ferîq Salih, hb., r. 72.

<sup>2</sup>Samî Tan, hb., r. 169.

<sup>3</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 100.

<sup>4</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r. 189.

<sup>5</sup>Ewrehman Hacî Marif, hc.

<sup>6</sup>Ewrehman Hacî Marif, hc.

<sup>7</sup>Qenatê Kurdo, hb., r. 59.



6. Bajêr **ji** bajêrê me **xweştir** nîn in. ( Bajêrê me **ji hemî** bajêran **xweştir** e).

7. Kor **ji** elindî **lawtir** nîn in. ( Elind **ji hemî** koran **lawtir** e ).

Ji van nimûnên serî diyar dibît ku ew peva pileya hevalnavên bala dirust diketin bi giştî di kurmanciya serî devoka behdînan da peyva (**ji hemî**) ye, ewa Qenatê Kurdoy diyar kirî û Sadiq Amêdî jî peyva (**ji hemîyan**)<sup>1</sup> weko çêkera pila bala daye diyarkirin “Bi pêş û paşkirina pişkdarên êk nifş û regez û nerêkirina karê ristê, dê teknîka pila bala dihête dirustkirin. Wek:

6. Bajêr ji bajêrê me xweştir nîn in. ( Bajêrê me ji hemî bajêran xweştir e.)

7. Kor ji elindî lawtir nîn in. ( Elind ji hemî koran lawtir e.”<sup>2</sup>

Ji bilî vê çendê morfîma (**tirîn**) dema dikevîte ser hevalnavê pila taybet pileya bala dirust diketin. Bo nimûne:

8. Baştirîn kes bo mirovî daybab in. 9. Daybab baştirîn kes in bo mirov î.

10. Mamostayên me zîrektirîn mamostan e li bajêr î.

Peyva (**herî**) jî di axiftina rojane da dihête bikarînan.

11. Kiça **herî** can li dîlanê Zozan bî. 12. Zarokê **herî** xort Şêro ye.

Cihnavên xweyî jî (**yê, ya, yên**) digel pila hevberkirinê pila bala dirust diketin û dihête bikarînan. Wek:

Şêro qotabiyekê zîrek e, Çeto zîrektir e, Yê zîrektir siyar e.

Ya zîrektir Şîlan e.

Yên zîrektir Siyar û Şîlan in.

### 3. Biçûkkirina Hevalnavan

Di zimanê kurdî da biçûkkirin, nazandin û kêmbiçûkkirina navan û tiştan dihête bikarînan, hevalnav jî di vî barî da bi harîkariya hindêk paşgiran wekî “-ek, -

<sup>1</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 277.

<sup>2</sup>Vîyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 103.

**ik, -ok, -kok**<sup>1</sup> dirust dibin çunkî “Ew nav yan hevalnav ji evan morfîman dihête darêtin.”<sup>2</sup> Ev paşgîre dikeve ser (regên karî û navî). wek:

### Regên karî:

**Regê karî + -ek, -ik, -ok, -kok** → **biçûkkirina hevalnavan**

koj + ek → kojek

soj + ek → sojek

**hevalnav + -ek, -ik, -ok, -kok** → **biçûkkirina hevalnavan**

şîrîn + ok → şîrînok

xoş + kok → xoşkok

hîr + ik → hîrik

(zirtek, kinik, zerik, reşik,...hwd)

1. Zarokên **xoşkok** bi jor ketin.

2. Ewê **hîrik** li dîv xo nîn e.

3. “Ji van şagirdan evê **huwîrkoke** xelat ket.”<sup>3</sup>  
nakem.

4. Ez hez ji mirovê **zirtek**

## 4. Xortkirina Hevalnavan

Mebest ji xortkirina hevalnavan ewe ji layê watayê ve dema peyvên radê digel hevalnavî bi kar dihên wetaya hevalnavî xortir û bi hêztir diken. Peyvên radê (zor, pir, hind, hinde, gelek, zehif, pîçek, çend, çî,...hwd). Wek:

(**zor ciwan, gelek bilind, pîçek nizim, çend delal**,...hwd) peyvên radê jî “Dema ku dihên beriya hevalnavan wateya wan ji hêla zêdebûnê ve xurtirdikin.”<sup>4</sup>

5. Tolazên gondê me **zîrek** in.

6. Tolazên gondê me **gelek zîrek** in.

<sup>1</sup>Emir Celadet Bedir Han & Roger Lescot, hb., 214.

<sup>2</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 59.

<sup>3</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 243.

<sup>4</sup>Mikail Bûlbûl, Waneyên Rêzmana Kurdî, Zanîngeha Mardîn Artuklu, Xandina Masterê, Mardîn, 2015.



7. Xarna tûj ya xweş e.

8. Xarna **zor tûj** ya ne xweş e.

Peyvên radê dikevne berî hevalnavên çewayiyê û ramana wan bihêztir diketin wekî di nimûnan û ristan da diyar bûn. Her wesana hevalnav têne xortkirin “Behoy dupatkirdinewey awelnawekew e”<sup>1</sup>. Wek: (sor sor, ter ter, sipî sipî,...hwd)

9. Min sêvên **sor sor** kirîn.

10. Wî xiyarên **ter ter** jêkirin.

Her wesana hevalnav xortir û bihêztir dibît bi egerê lêkdana peyveka watadar digel peyveka bê wata bi pêş û paşkirina her dukan “Di kurmançî de perçînkirin bi peyvên dubestî jî çêdibe.”<sup>2</sup> Wek: (**rep û rît, sist û pist**,...hwd)

11. Mirovê **rep û rît** çî jênahête wergirtin. 12. Ew korekê **sist û pist** e.

Bi rêka du peyvan ku wataya wan nêzîkî êk bin yan jî êk bin. Wek: (**nerm û helîm, sax û selîm**,...hwd)

13. Welat pêdvî bi serkirdên **nerm û helîm** e.

14. Ew mirovekê **saxû selîm** e.

## 5. Bikarînan Hevalnavanî Wekî Nav

Her demê hevalnav wekî navî di ristan da hate bikarînan pêdviye wan taybetmendiya werbigrît yên nav werdigrît. “Awelnaw le rûy şêwewe hîç çiyawaziyêkî legel naw da nî ye û hoy bineretî çiyabûneweyan tenya wata ye.”<sup>3</sup>

Demê hevalnav wekî navî dihête bikarînan ew jî “Be hoy rêgey morfolojî û sîntaksiyewe ye, be wate behoy xistine ser û nîşaney doxiyewe ye.”<sup>4</sup> Demê hevalnav wekî navî bikar hat dê “Nîşan û erkên navî wergirît. Di vî barî da erkê hevalnavî ji dest det.”<sup>5</sup> Mebest pê ewe ku dê nîşanên nasyarî, nenasyarî, nîşanên nifşî, gazîkîrnê,...htd kevne ser hevalnavî (biçîkek, biçîka (ê, ên, êd, êt), vî biçûkkî, biçûkan, biçûkî, biçûko, biçûkîjî,...) dê wekî navî erkê xwe di ristê da gêrît çî (nîhad, biker, berkar,...htd.) Bo nimûne:

1. Wî **biçûkek** girt.

→ berkar

<sup>1</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r, 194.

<sup>2</sup>Mikail Bûlbûl, hb.

<sup>3</sup>Ewrehman Hacî Marif, hb., r, 27.

<sup>4</sup>K. K. Kurduyêf, hb., r. 104.

<sup>5</sup>Kadri Yıldırım, hb., r. 264.

2. Min rastek ji **biçûkî** wergirt → timamkerê beyarîde
3. **Biçûkek** ji mal derkeft. → biker

Eve ji layekî ve û ji layekê dî ve gelek ji hevalnavên çewayî weko navên taybetên mirovan dihêne bikarînan. Wek: (zîrek, ciwan, esmer, delel, nazik, şîrîn,....hwd). Wek:

**Esmer** kiçeke zîrek e.

Ji bilî ku wek navên taybet eger hat ew hevalnavê wekî navî bikar bihêt çî ji wan nîşanên nav werdigîft wernegirî. “Weku navekê giştî reftarê diket. Wek:

**Nî** hatin, **kevin** xelatin.”<sup>1</sup>

Hevalnavên çewayî piştî navî dihên dibine diyarker bo navî. Wek:

Kiça **esmer** bejna xwe law xemiland.

Demê nîşanên doxê tiyan diçine ser hevalnavî demê diyarker bî wî demî dê “Wekî navekê diyarker lêhêt çavê reşan”<sup>2</sup>

çavên pitê reş in.

## 6. Erkê Hevalnavî di Ristê da

Her wekî di pênasa hevalnavî da jî hatiye diyarkirin hevalnav peyveke wesfa navekî yan çend navekan yan jî cihnavekî diketin. Hevalnav erkê diyarkerî bo navî û cihnavî dibînî bi harîkariya amrazên xistine palê û dibîte diyarkerê karê bêhêz di ristê da:

### 6. 1. Hevalnav Dibine Diyarkerên Navî

Hevalnav bi giştî piştî navî dihêne bikarînan ew jî bi harîkariya amrazên palvedanê (**a, ê, ên, êd, êt**). Wek:

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 75.

<sup>2</sup>Kemal Badîllî, hb., 48.

1. Kiça **bejinzirav** dilê min sot.

2. Korê **simbêlreş** xwe mezin diket.

Belê merem ne ewe ku hevalnav berî navî nahêne bikarînan, hindek caran hevalnav berî navî dihêne bikarînan belê “Bêy hîç nîşaneka xistine palê”<sup>1</sup> werbigirît her wekî di babetên hevalnavên (çewayî, nediyar, pirs,...hwd.) Wek:

3. Dohî min **du** kew girtin.

4. **Zîrektirîn** qotabî yê di pola me da.

Her wesana nav dişêt çendîn hevalnavan li dîv êk ra werbigirît ew jî eger navê (diyarkirî) takê mê bîr dê nîşana dane pal (a) wergirît û dê hevalnav li dîv rahên bi harîkariya amrazê lêkdanê (û) êk li dîv êk dêhên û eger navê (diyarkirî) kitê nêr bîr dê nîşana dane palê (ê) wergirît hevalnav li dîv rahên bi harîkariya amrazê lêkdanê (û). Wek:

5. Pertoka mezin **û** kevin **û** diryayî digel xwe bîne.

6. Min kiçeka bejinzirav **û** nazik **û** ciwan divêt.

Eger navê (diyarkirî) kom bîr dê nîşanên xistine palê (ên, êt, êd) wergirît dê hevalnav “Bi rêya morfîma lêkdanê (û)”<sup>2</sup> dihête bikarînan êk li dîv êkî. Wek:

Qotabiyên paqij **û** zîrek **û** baş **û** jêhatî hatine xelatkirin.

Yan jî li cihê amrazê lêkdanê (û) kome (,) bihête danan, ji bilî (û) ya li dumahîkê dihête bikarînan. Wek:

Qotabiyên paqij, zîrek, baş **û** jêhatî hatine xelatkirin.

## 6. 2. Hevalnav Dibine Diyarkerên Cihnavî

Cihnav ew peyv in yê li cihê navekî yan çend navekan dihêne bikarînan. Ew desteya dibine diyarkirî bo diyarkerî desteya (**ez, to, ew, em, hûn-hîn, ew**)in ku bi desteya (subjektîv)<sup>3</sup> dihêne niyasîn.

7. Ewên **destdirêj** hatine paşvebirin.

8. Ewa **bilind** hevala min e.

<sup>1</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 77.

<sup>2</sup>Viyan Îbrahîm Elî Îbo, hb., r. 84.

<sup>3</sup>Samwêl Odî Rey, Zimanê Kurdî Devoka Hekariya, Vegohaztin ji Elfa Bêya Latînî: Evraz Hisîn, Çapa Êkê, Çapxana Hecî Haşim, Hewlêr, 2007, R. 47.

### 6. 3. Hevalnav Dibine Diyarkerên Karên Bêhêz

Hevalnav çewayî dibine diyarker bo karên bêhêz her wekî Sadiq Bihaedîn Amêdî jî di pertoka xwe da diyarkirî hevalnavên çewayî di kurmancî da dibine:

1. Hevalnavê navî

2. Dibine karayê (failê) kirina buyînê<sup>1</sup> : Demê karê ristê ji karê bêhêz bîtin, wî demî hevalnav dibîte diyarkerê karê bêhêz. Bo nimûne:

1. Gol geş bû.

2. Korê çetoy **fêlbaz** e.



---

<sup>1</sup>Sadiq Bihaedîn Amêdî, hb., r. 280.



**PIŞKA DUWÊ  
HEVALNAV DI  
ZIMANÊ TIRKÎ DA**

## PIŞKA DUWÊ

### HEVALNAV DI ZIMANÊ TIRKÎ DA

#### 1. Pênasa Hevalnavî (Ön ad- Önad) Sıfat

Hevalnav di zimanê tirkî da ji layê bikarînan zaravî ve bi giştî du zarav dihêne bikarînan. Ji wan (sıfat) , (ön ad – önad) û herdû ber belav in. “Hevalnav wesf û diyarkerên navîne, tiştî wesfên curawcur û diyarkerên curawcurên heyn.”<sup>1</sup> Mebest ji wesfên curawcur wekî reng, tam û qebare...hwd. Mebest ji diyarkerên curawcur ji layê destnîşankirî, hijmarê, nediyariyê...hwd. “Ew peyvî yên ku hebûna tişteki wesf diken yan diyar diken, anku ew peyv in rengê tiştî, rewş, dirûvî didene zanîn û cihî, hijmarê, rêzbandiyê yan jî pirsyarê diyar diken. Piştî hevalnavî teqez divêt navek bihêt.”<sup>2</sup> Di nama xwe ya masterê da (Ömer Yılmaz) diyar kiriye li dûr hevalnavî ku ji encamê wan vekolînên li ser zimanê tirkî hatîne kirin çî bi kurtî û çî bi berfirehî hemî wekî êk in, ew jî bi vî rengî daye diyarkirin “Hevalnav, ew peyv in ku çewayiya navî, ka di çî rewş daye, gelek caran hijmarên wê, çendêtiyê, pirsyarê yan jî diyarkirinê didene diyarkirin.”<sup>3</sup> Ji van pênasan diyar dibêt di zimanê tirkî da hevalnav wesfa navekî diketin yan jî navekî diyar diketin. Anku pêdviye herdem navek digel hevalnavî bihête bikarînan. Di zimanê tirkî da bi giştî hevalnav herdem dikevîte berî navî. Hevalnav ew peyvî yên taybetmendiyên navan dene diyarkirin û wan bi şêweyekê diyar dene aşkirakirin.<sup>4</sup>

#### 2. Cureyên Hevalnavî ji Layê Hebûnê ve (Varlıklar Açısından Sıfat Çeşitleri)

Bi giştî di pertokên tirkî da hevalnav ji layê hebûnê û erkî ve li ser du beşan dihêne dabeşkirin:

---

<sup>1</sup>Muharrem Ergin, *Türk Dil Bilgisi*, Bayrak Basım/Yayın/Tanıtım, Umut Matbaası, İstanbul, 2013, r. 244.

<sup>2</sup>Deniz Meric, *Temel Türkçe Dilbilgisi*, Fono Yayınları, Ekosan Matbaacılık, İstanbul, 2011, r. 105.

<sup>3</sup>Ömer Yılmaz, *Kelime Türleri ile İlgili Yaklaşımlar ( Akademik Eserler-Üniversite Hazırlık Kitapları)*, Sakarya Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yeni Türk Dili, Yüksek Lisans Tezi, 2008, r. 67.

<sup>4</sup>Süleyman Efendioğlu, *Vâhidî Cinânü'l-Cenân(Giriş, Dil İncelemesi, Metin, Dizinler)*, Fenomen Yay., Erzurum, 2013, r. 130.

## 2. 1. Hevalnav ji Layê Watayê ve (Anlam Açısından Sıfat)

### 2. 1. 1. Hevalnavên Çewayî (Niteleme Sıfatları)

Hindek jî (karşılaştırma, küçültme, pekiştirme ve unvav sıfatları) di êxine jêr sernavê hevalnavên çewayî ve.

### 2. 1. 2. Hevalnavên Diyarker (Belirtme Sıfatları)

Hevalnavên diyarker jî li ser çend beşekan dabeş dibin, ew jî (işaret sıfatları, soru sıfatları, belirsizlik sıfatları, sayı sıfatları) her êk ji wan dê li cihê bo hatiye diyarkirin hêne şirovekirin.

## 2. 1. Hevalnav ji Layê Watayê ve (Anlam Açısından Sıfat)

### 2. 1. 1. Hevalnavên Çewayî (Niteleme Sıfatları)

Hevalnavên çewayî ew hevalnavin yên “Tiştên can û bêcan reng, şekil, awa, tam, bên, navber, xislet, hînbûnî, behre û taybetmendiyên curawcurên wekî jêhatîbûnê hem ji layê ji der ve û ji navdayîya tiştî dene diyarkirin.”<sup>1</sup> Bo nimûne: (**büyük** ev, **küçük** oda, **güzel** kız, **boş** kutu, **yeşil** yaprak)<sup>2</sup> hevalnavên çewayî “Taybetmendiyên curawcurên tiştî diyar diket û wî navî ber çav diket.”<sup>3</sup> Bo diyarkirina hevalnavên çewayî di zimanê tirkî da ev çend nimûneyên li xarê hatîne bikarînan. Wek:

(**kara** tavuk, **güzel** çocuk, **tatlı** elma, **uzak** ev, **kör** Hamdi, **çabuk** iş)<sup>4</sup>

Di nimûnên serî da ew peyvên reştir hemî hevalnav in, her êk ji wan bi rengên curawcur çewayîya navên piştî xwe dayne diyarkirin,. Hevalnavê (**kara**) rengê navê (tavuk), hevalnavê (**güzel**) çewayîya navê (çocuk), hevalnavê (**tatlı**) tama

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, 4. Baskı, TDK Yay., Ankara, 2014, r. 356.

<sup>2</sup>Miray Banu Doğan, *Bolvadin İlçesi Merkez İlköretim Okullarındaki 7. Sınıf Öğrencilerinin Yazlı Kompozisyonlarında Kullandıkları Sözcük türleri Üzerine Bir araştırma*, Afyon Kocatepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, Türkçe Eğitimi Anabilim Dalı Türkçe Öğretmenliği, Afyonkarahisar, 2008, r. 14.

<sup>3</sup>Mehmet Gülsün, *A1-A2-b1 Yabancılar İçin Türkçe Dil Bilgisi*, Gazi Üniversitesi, Türkçe Öğrenim, Araştırma ve Uygulama Merkezi, Gazi Üniversitesi Tömer, 2. Basım, kalkan Matbaacılık, Ankara, 2014, r. 276.

<sup>4</sup>Mustafa Altun, *Sözcük / Kelime Türleri*, www. Dilbilimi. Net, 4 Mayıs 2009, r. 7.

navê (elma), hevalnavê (**uzak**) roberê navê (ev), hevalnavê (**kör**) kêmasiya bedenî û hevalnavê (**çabuk**) curê navê (iş) dayne diyarkirin, ev nimûnên hatîne şirovekirin piştrastkirina pênasan e. Wekî ya diyar ji van nimûnan hevalnav di zimanê tirkî da bi giştî herdem berî navî dihêne bikarînan. Dema hevalnav piştî navî hatine bikarînan dê ristê dirust ken “Hevalnavên çewayî demê piştî navan hatin bi harîkariya nîşanên karî dê bandûrekê diyarket û ristê pêk dînin, belê pêkînana hindek ristan bi vî awayî nîşanên karî diyar nabin, veşartî dimînin.”<sup>1</sup> Bo nimûne:

<u>Sıfat tamlaması (Raveka hevalnavî)</u>	<u>Cümle (Riste)</u>
“büyük ev	Ev büyük.
küçük oda	Oda küçük.
güzel kız	Kız güzel.” <sup>2</sup>

Her wekî di nimûnên serî da diyar bi tinê cih gohurîna hevalnavên (**büyük, küçük, güzel**) di gel navên (ev, oda, kız) riste dirust kirîne, belê çi nîşanên karî têda nehatîne bikarînan. Her wesan “Hevalnavên çewayî demê piştî navî hatin ristê pêk dînin hindek ji wan nîşanên karî bi aşkirayî bi kar dihên:

Ev büyüktür. Ev büyüktü. Ev büyükmüş. Ev büyük değil.”<sup>3</sup>

Di van nimûnan da bi aşkira nîşanên karî yên hatîne bikarînan. Hevalnav hindek caran piştî navî jî dihên bi taybetî di mijara helbestan da. Bo nimûne:

“Bir şarkısın sen ömür boyu sürecek. Di vî nimûnê da “**ömür boyu sürecek**” ku piştî navê “şarkı” hatiye: ömür boyu sürecek şarkı.”<sup>4</sup>

Çi hevalnavên çewayî çi jî diyarkirî dema berî navî hatin her du pêk ve dê raveka hevalnavî (sıfat tamlaması) pêk dînin. Wek:

“sıfat unsuru + isim unsuru = Sıfat tamlaması

verimli + topraklar = verimli topraklar

<sup>1</sup>Mehmet Hengirmen, *Türkçe Temel Dilbilgisi*, V. Baskı, Engin Yayın Evi, Ankara, 2006, r. 132.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 133.

<sup>3</sup>Hengirmen, hc.

<sup>4</sup>Mehmet Seylan - Feyzullah Çelikbağ, *Türkçe (Dil ve Anlatım) EL Kitabı*, Ertem Matbaası, LMT Limit Yayınları, Ankara,(tarihi yok), r.175.



bütün + insanlar = bütün insanlar”<sup>1</sup>

Hindî hevalnav berî navî bihête bikarînan û riste pêk nehatbît weko erk her hevalnav e belê heke riste pêkhat weko erk digel navî ku raveka hevalnavî pêk dihêt pêkve dibine biker (Di tirkî da, hindî riste nehête pêkînan, anku hindî mijara çewayıya rîdanê nebîtin, awayê bê nîşane ,ew awa hevalnave, riste pêk bihêt, ew pêkhêna sade , dê bîte biker.)<sup>2</sup> Bo nimûne:

(**kırmızı** gül, **doğru** söz, **temiz** oda , **şapkalı** adam)<sup>3</sup>,

Ev nimûne ravekên hevalnavîn e, ne ristene yên xetê reştir diyar hevalnav in, belê eger riste pêk hat dê bine biker wekî vê rista xarê:

“**Siyah şapkalı kız** biz-e bakıyor.”<sup>4</sup>

Di vê ristêda ewa bi xetê reştir hatiye diyarkirin hemî biker e. Bo zanîna hevalnavê çewayî di zimanê tirkî da, anku ka dê çewa zanîn hevalnavê çewayî kîjk e, pirsyarkirin bi peyva “**nasıl**”<sup>5</sup> ku bi navî dihête kirin û ew peyva dibîte bersiva wê pirsyarê dê bîte hevalnavê çewayî. Wek:

“**uzun saçlı**                      **nasıl saçlı?**                      **uzun saçlı.**  
**genç kız**                      **nasıl kız?**                      **genç kız.**”<sup>6</sup>

Ew peyvên dibine hevalnavên çewayî bi tinê digel navî di awayê raveka hevalnavî da bîtin dibine hevalnavên çewayî, belê eger “Wesfa karekî kir dê bîte hevalkar yan jî eger nîşanên tewandinê wergirtin dê bîte nav. Wek:

**Tatlı** sözlerle beni kandırdı.

sıfat

<sup>1</sup>Leyla Karahan, *Türkçede Söz Dizimi*, 16. Baskı, Erek Matbaası, Akçağ Yayınları , Ankara, 2011, r. 48.

<sup>2</sup>Günay Karağaç, *Türkçenin Dil Bilgisi*, 1. Baskı, Erek Matbaası, Akçağ Yayınları., Ankara, 2012, r. 496.

<sup>3</sup>Meric, hb., r. 106.

<sup>4</sup>Yüksek Göknel, *Türkçe Dilbilgisinin Yeni Tertibi*, 2014, r. 12.

<sup>5</sup>Tufan Demir, *Türkçe Dilbilgisi*, 3. Baskı, Kurmay Yay., Ankara 2013, r. 294.

<sup>6</sup>*Yabancılar İçin Türkçe Dil Bilgisi*, Gazi Üniversitesi, Türkçe Öğretim, Araştırma ve Uygulama Merkezi, Gazi Üniversitesi Tömer. Ankara, r. 108.

**Tatlıy** çok severim.

isim

Benimle **tatlı** konuştu.”<sup>1</sup>

Zarf

Di rista êkê da (**tatlı**) hevalnav e çonkî wesfa navî ya kirî, di rista duwê da (**Tatlıy**) nav e; çonkî nîşanekê navî yê wergirtî anku yê hatiye tewandin “Hevalnav nîşanên tewangê wernagirin”<sup>2</sup> anku nahêne tewandin, di rista sêyê da jî (**tatlı**) hevalkar e çonkî wesfa karî ya kirî.

Hindek caran hevalnav wekî nav dihête bikarînan dema nav ji ristê dikevît ew hevalnav hem cihê navî digrît hem jî çewayiyê dete diyar kirin, eger navî nîşane pêve bin dema ji ristê dikevît ew nîşane diçine ser hevalnavî. Bo nimûne:

“**Akıllı** insanlar kendine güvenir.

Sıfat

**Akıllılar** kendine güvenir.”<sup>3</sup>

İsim

Di rista êkê (**akıllı**) hevalnav e wesfa navê (insan) ya kirî, di rista duwê da (**akıllılar**) nav e çonkî nîşanê ko (**lar**) yê wergirtî “hevalnav nîşanên komê wernagirît.”<sup>4</sup>

## 2. 1. 2. Hevalnavên Diyarker (Belirtme Sıfatları)

Hevalnavên diyarker di zimanê tirkî da “Ew hevalnav in yên tiştî diyar diken, ev hevalnave çewayîya binyata tiştî nîşan nadet, tiştî bi vî yan bi wî awayî didete diyarkirin. Di şiyar daye tiştî ji çend layan ve diyar biket. Yan dê cihê tiştî dest nîşan ket, yan dê hijmarê nîşan det, yan tiştî bi awayê pirsyarê diyar ket yan jî bi awayê

<sup>1</sup>Meric, hb., r. 106.

<sup>2</sup>Tahsin Banguoğlu, *Türkçenin Grameri*, 9. Baskı, TDK Yay., Ankara 2011, r. 341.

<sup>3</sup>www. Edebiyat Öretmeni. Org, *Türk Edebiyatı-Dil ve Anlatım Derseri için Kaynak site*, 10. Sınıfdil ve Anlatım Ders Notları, r. 8

<sup>4</sup>Banguoğlu, hb., r. 341.

nediyariyê der birît.”<sup>1</sup> Pênasên dî jî yê hevalnavê diyarker her li dûr vê pênasê kom dibin “Hevalnavên diyarker ew hevalnav in yê navî dest nîşan diken, jimara wan, çendêtiya wan diyar diken, yan jî ji layê diyarkirî ve weko pirsyarkirî û nediyariyê anku ew hevalnav in yê navî diînine berçav.”<sup>2</sup> Ji van pênasan diyar dibît ku hevalnavên diyarker dabeşî ser çar beşan dibin. Di zimanê tirkî da çî boçûnên cuda cuda li ser dabeşkirina hevalnavên diyarker nîn in. Ew kes û senterên di vekolînên xoda behsî hevalnavî kirî hevalnavên diyarker dabeşî ser çar beşan kirine: (Belirtme sıfatları: İşaret (Gösterme) Sıfatlar, Soru Sıfatlar, Belgesiz Sıfatları, Sayı Sıfatlar)

### 2. 1. 2. 1. Hevalnavên Nîşaneyî (İşaret Sıfatları)

Hevalnavên nîşaneyî ew hevalnav in yê navî destnîşan diken “Cihê tiştan bi rêka nîşankirî diyar diket”<sup>3</sup> yan “Hevalnavên nîşaneyî, ew hevalnav in yê cihê navê diyarkirî diyar diket û dema ev peyve li cihê navî hatine bikarînan cihnavên nîşaneyîne (**bu, şu, o**) û dema navek destnîşan kir cihnavên nîşaneyî ji karê xwe dikevin û erkê hevalnavên nîşaneyî dibînin.”<sup>4</sup> Bo nimûne:

“1. **Bu** paketi postaneye götürebilir misin?

2. **Şu** sözlük senin mi?

3. **O** mektubu okumadım.”<sup>5</sup>

Di van ristên serî da peyvên (**bu, şu, o**) hevalnavên nîşaneyî e ku dest nîşana navên (paket, söz, mektub) di ristan da kirîne û berî navên dest nîşankirî hatîne bikarînan. Her wekî di pinasê da jî hatiye diyarkirin dema nav ji ristê keft ew peyv dibine cihnavên nîşaneyî yan jî bi şeweyekê dîtir bêjîn “Hevalnavê nîşaneyî yê li berî navî hatîn, nav rabibît hevalnavê nîşaneyî, dê bine cihnavên nîşaneyî.

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 247.

<sup>2</sup>Galip Güner, *Kıpçak Türkçesi Grameri*, Kesit Yay., İstanbul 2013, r. 277

<sup>3</sup>Meric, hb., r. 106

<sup>4</sup>Esra Çorbacı, *Babürname’de Sıfatlar*, Adnan Menderes Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, yüksek lisans tezi, Aydın, 2012, r. 49.

<sup>5</sup>Margarete I. Ersen-Rasch; Erdoğan Onası, *Yabancı Dil Olarak Türkçe Dilbilgisi*, Papatya YayıncılıkEğitim, İstanbul, 2015, r. 77.

Sıfat (Hevalnav)

Adıl (Cihnav)

**Bu** adam resamdır.

**Bu** resamdır.

**O** çocuk çok çalışkandır.

**O** çok çalışkandır”<sup>1</sup>

Her wekî di ristên serî da jî diyar ewên beramberî êk hafîne kirin navên (adam, çocuk) hatîne destnîşankirin bi peyvên (**bu, o**) di wan ristan da hevalnavên nîşaneyîn e û di ristên beramber da navên (adam, çocuk) nehatîne bikarînan peyvên (**bu, o**) di wan ristan da cihnavên nîşaneyî ne. Ev peyve “Di bineret da cihnav in.”<sup>2</sup>

Peyvên “bu, şu, o, öteki, beriki, öyle, böyle, şöyle, karşı, karşı, öbür, oradaki, şuradaki, buradaki, aşağı, yukarı...”<sup>3</sup> weko hevalnavên nîşaneyî dihêne bikarînan. Bo nimûne:

“**Öteki** elbiseyi ben daha çok beğendim.

**Beriki** sokakta her gün bir olay çıkıyor.

**Öbür** gazete de bu konuyla ilgili ilginç bir makale okudum.

**Diğer** pakette kardeşime aldığım hediye var.”<sup>4</sup>

“**Böyle** sırlıklar gerekiyor bize.

**Şöyle** bir arabam olsa ne iyi olurdu.

**Öyle** evlerin kirası çok yüksek olmalı.”<sup>5</sup>

Her wesan “Di zimanê nivîskî yê kevin da dihête dîtin cihnavên **ol şol < iş ol iş bu < iş bu** pitir wekî hevalnavê nîşaneyî dihête bikarînan:

«**ol** mahkemenin hükmüne derler mi adalet »?”<sup>6</sup>

Di van ristên serî da hevalnavên nîşaneyî (**öteki, beriki, öbür, diğer, böyle, böyle, öyle, ol**) dest nîşana navên (elbise, sokak, gazete, paket, sırlık, arabam , ev,

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r. 158.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 375.

<sup>3</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 177.

<sup>4</sup>Yılmaz, hb., 105.

<sup>5</sup>Demir, hb., r. 295.

<sup>6</sup>Banguoğlu, hb., r. 352.

mahkeme) yê kirîn û berî navî hatîne bikarînan. Her wesa (Hevalnav hindî ku weko hevalnav bin ji ber ku çî nîşanên rêzimanî wernagirîtin hevalnavên nîşaneyî nake awayê komê, tinê bi awayê kit bi kar tîn. Yê ku nîşaneyê komê dest nîşan diket, diyar diket tişte anku nav wergirî: **şu dağlar, şu denizler, şu yollar**)<sup>1</sup> di van nimûnan da hevalnavên nîşaneyî nîşanên komê (**lar, ler**) wernegirtîne yê çûyne ser navên (dağ, deniz, yol) hevalnavên nîşaneyî bi kitê û nav bi komê hatîne diyarkirin. “Hevalnavên nîşaneyî heke hatine tewandin dê bine cihnavên nîşaneyî.

1. **Bu** kitaplar senin mi? (sıfat)
2. **Bunlar** senin mi? (zamir)
3. **Şu** kalemi uzatabilir misin? (sıfat)
4. **Şunu** uzatabilir misin? (zamir)
5. **Diğer** yolcular da üzgün. (sıfat)
6. **Diğerleri** de üzgün. (zamir)”<sup>2</sup>

Her wekî ya diyar di ristên (1, 3, 5) da (**bu, şu, diğer**) hevalnavên nîşaneyî e navên (kitap, kalem, yol) wesf kirîne û di ristên (2, 4, 6) da (bunlar, şunu, diğerleri) cihnavên nîşaneyîne çonkî yê hatîne tewandin. “Peyvên dibine hevalnavên nîşaneyî (bu, şu, o, öteki, beriki...) beriya navekî nehên nabine hevalnav.

Bo nimûne:

**Bu** benim mi?

**Şunu** ozatır mısın?

**Ötekini** isterim.

**Berikini** adı nedir?”<sup>3</sup>

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 375.

<sup>2</sup>*Yabancılar İçin Türkçe Dil Bilgisi*, r. 109.

<sup>3</sup>Merici, hb., r. 107.

Di van ristan da peyvên (bu, şunu, ötekini, berikini) cihnavên nîşaneyîn e çonkî li cihê navekî hatîne bikarînan.

Hevalnavên nîşaneyî bi tinê li serê ristê nahêne bikarînan. Bo nimûne:

“Buraya **öbür** yoldan geldim.

Arkadaşlarım **öteki** otobise binmiş.

Belediye, geçen yıl **şu** yolu asfaltadı.”<sup>1</sup>

“Bari, **şu** hastalık olmasaydı.”<sup>2</sup>

Eve jî weko diyar di ristan da hevalnavên nîşaneyî di nîveka ristan da hatîne bikarînan.

Ji bilî van hevalnavên nîşaneyî (morfimên darêjtinê (-ki, -deki) demê dikevne dumahîka navî cihî diyar diken û hevalnavên darêjtî dirust diken.

Bo nimûne:

“Bahçedeki çocuklar, akşamki yemek, sokaktaki çöp...”<sup>3</sup>

Ev paşgire yêne keftîne ser navan û hevalnavên darêjtî dirust kirîne û weku hevalnavên nîşaneyî rolê xwe dîtîne di nimûnan da, peyv dikevne di navbera hevalnavên nîşaneyî û ew navê dihête destnîşankirin. Bo nimûne:

“Şu güzel kız, bu gördüğümüz ev...”<sup>4</sup>

Her wesan peyva “işte” weku hevalnavê nîşaneyî dihête bikarînan. Bo nimûne:

“İşte hendek, işte deve; ya asarsın, ya düşersin.”<sup>5</sup>

<sup>1</sup>Gökhan Ulukan, *Türk Dili ve Edebiyatı Öğrt*, r. 3.

<sup>2</sup>Korkmaz, Zeyneb, *Grammer Terimleri Sözlüğü*, TDK yay., Ankara, 1992, r. 91.

<sup>3</sup>Meric, hb., r. 107.

<sup>4</sup>Yılmaz, hb., r. 105.

<sup>5</sup>Yılmaz, hc.

Di vê nimûnê da peyva (**işte**) dest nîşana cihê navan kiriye, belê Korkmaz weku nîşana (gazîkîrnê) berê xwe didetê û gelek caran weko xortkirina wataya hevalnavên nîşaneyî tete bikarînan. Bo nimûne:

“**İşte** kağıt, **işte** kalem yaz bakalım.”<sup>1</sup>

Hindek caran jî dikevîte berî hevalnavên nîşaneyî wataya wê bihêztir diket. Bo nimûne:

“**İşte bu** yerde; **işte şu** adam; **işte o** ev...”<sup>2</sup>

Di zimanê tirkî da peyvên cihê û arastey diyar diken wekî hevalnav dihêne bikarînan, wekî “ön”, “arka”, “üst”, “alt”, “iç”, “yan”, “karşı”, “bitişik”, “orta”, “ara”, “sağ”, “sol”<sup>3</sup>

“Kasaba **karşı** sırtın **öbür** tarafındaydı.”<sup>4</sup>

Hevalnavên nîşaneyî nabine kom û nahêne tewandin “Hevalnavên nîşaneyî nabine kom. Çi caran jî nîşanên tewandinê wernagirî.”<sup>5</sup>

Bo çewayiya zanîna hevalnavên nîşaneyî “Peyva pirsyarî **hangi** dê hête berî navî, bersiva dihête dan dê bîte hevalnavê nîşaneyî.”<sup>6</sup>

## 2. 1. 2. 2. Hevalnavên Pirsyariyê (Soru Sıfatları)

Di şewê pirsyarî da navî didene diyarkirin bi rêka hindek peyvên pirsyarî pirsyar bi navî dihête kirin. “Hevalnavên pirsyarî ew hevalnav in yên tiştî bi awayê pirsyariyê dene diyarkirin.”<sup>7</sup> Hemî ew pênasên bo hevalnavên pirsyarî hatîne kirin xwe li dewr û berên êk dibînin ew jî ew e navî bi rêka pirsyariyê didene diyar kirin\*, ew peyvên dibine hevalnavên pirsyariyê “**kaç, kaçar, kaçınıcı, hangi, ne, nasıl**”<sup>8</sup> ji bilî van peyvên hindek peyvên dîjî dibine hevalnavên pirs (**ne kadar, nice, ne gibi,**

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 376.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 376.

<sup>3</sup>Göknel, hb., r. 121.

<sup>4</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 177.

<sup>5</sup>Meric, hb., r. 123.

<sup>6</sup>Demir, hb., r. 295.

<sup>7</sup>Ergin, hb., r. 252.

\* bo pitir pêzanînan li ser hevalnavî berê xwe bidene nama masterêya (ömer yılmaz).

<sup>8</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 381.

**ne biçim, ne türlü**<sup>1</sup> û hindekên dijî (**neden**)<sup>2</sup>, (**neredeki**)<sup>3</sup> bi giştî hevalnavên pirs di zimanê tirkî da ev in evên li serî hatîne destnîşankirin.

Hevalnavê pirsyarî (**kaç**) ev hevalnav hijmara tiştî bi awayê pirsyariyê didete diyarkirin. Bo nimûne:

“**Kaç** liralık makbuz kesilecek?

**Kaç** kişi gelecek?”<sup>4</sup>

Hevalnavê pirsyarî (**kaçar**) ew hevalnave ku pirsyar bi çendêtiya tiştî dihête bikarînan. Bo nimûne:

“**Kaçar** tane bölüştünüz?

**Kaçar** gün izinlisiniz?”<sup>5</sup>

Hevalnavê (**kaçıncı**) pirsyarê bi rêzbendiya curê tiştî dihête kirin. Bo nimûne:

“**Kaçıncı** sınıfta okuyorsunuz?”<sup>6</sup>

Hevalnavê (**hangi**) ew hevalnavê pirsyariyê ye ji du tiştan yan zêdetir tişteki ji wan jê digrîtin. Bo nimûne:

“Bugüne kadar **hangi** kitapları okudunuz? ”<sup>7</sup>

Hevalnavê pirsyarî (**ne**) ew hevalnav e yê ku pirsyara awayê tiştî diket kanê yê çewa ye. Bo nimûne:

“Sen buraya **ne** gün geldin? ”<sup>8</sup>

Hevalnavê (**nasıl**) ew hevalnavê pirsyariyê ye yê ku pirsyara çewayî û taybemendiya navî diketin. Bo nimûne:

---

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r.139.

<sup>2</sup>Yılmaz, hb., r. 106.

<sup>3</sup>Ergin, hb., r. 254.

<sup>4</sup>Yılmaz, hb., r. 107.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 382.

<sup>6</sup>Hengirmen, hb., r. 139.

<sup>7</sup>Hasan Kolcu, *Türk Dili*, 4 Baskı, Umuttepe Yayınları, Koceli Üniversitesi, 2013, r.145.

<sup>8</sup>Hasan Kolcu, hb., r. 145.



“Köyde **nasıl** bir evde oturuyordunuz? ”<sup>1</sup>

“Bu **nasıl** bir milleti? ”<sup>2</sup>

Hevalnavê (**nice**) ew hevalnav e yê pirsyara çendêtiya navî yan hijmara navî diketin. Bo nimûne:

“Kötü günlerimde **nice** arkadaşlarım beni yalnız bıraktı? ”<sup>3</sup>

Hevalnavê (**ne kadar**) ev hevalnav pirsyarê ji çendêtiya navî diketin. Bo nimûne:

“**Ne kadar** öğrenci sınava girdi? ”<sup>4</sup>

“Paranın **ne kadarını** yedin? ”<sup>5</sup>

Di vê nimûnê da (Paranın ne kadarını yedin?) hevalnavê pirsyarê paş navî hatiye bikarînan.

Hevalnavê (**ne gibi**) pirsyara navî tête kirin wekî çi, pitir eve saloxdana tiştekî bi tiştekê dî diyar diketin. Bo nimûne:

“Sizin **ne gibi** sorunlarınız var? Lütfen bize anlatın.”<sup>6</sup>

(**Ne biçim**) ev hevalnav pirsyarê ji şiklê navî diketin. Bo nimûne:

“Sizler **ne biçim** insanlarla çalışıyorsunuz?”<sup>7</sup>

Hevalnavê (**ne türlü**) pirsyarê ji curê navî dihête kirin. Bo nimûne:

“Siz **ne türlü** işler yapıyorsunuz?”<sup>8</sup>

---

<sup>1</sup>Ulukan,hb., r. 6.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 383.

<sup>3</sup>Hengirmen, hb., r. 139.

<sup>4</sup>Yılmaz, hb., r. 108.

<sup>5</sup>Gülsün, hb., r. 288.

<sup>6</sup>Hengirmen, hb., r. 139.

<sup>7</sup>Doğan, hb., r. 17.

<sup>8</sup>Doğan, hc.

(**Neredeki**) ev jî pirsyara cihê navî diketin. Bo nimûne:

“**neredeki** (ev), **neredeki** (ağaç), **neredeki** (taş)”<sup>1</sup>

Hevalnavê (**neden**) pirsyarê ji egerê diketin. Bo nimûne:

“**Neden** haberiniz olacak?”<sup>2</sup>

“**Kimin** ve **neyin** masrafını kapattı?”<sup>3</sup>

Peyvên “**Neden, kimin, neyin**” Ergin û Banguoğlu wekî cihnavên pirs dibînin.<sup>4</sup>

Peyvên pirs dema wesfa navekî biken dibine hevalnavên pirs û dema li cihê navekî bihên dibine cihnavên pirs û dema wesfa kiryarekê biken dibine hevalkarên pirs. Bo nimûne:

“**Kaç** çocuk var?”

hevalnavê pirs

**Hangisi** senin?

cihnavê pirs

Orayı **nasıl** gittin?”<sup>5</sup>

hevalkarê pirs

Her wekî xoya û diyar dibît ji van nimûnan û ristên serî hevalnav weko bikarînan li serê ristê û nîveka ristê dihêne bikarînan. Her wesan hevalnavên pirsyarî her dem li berî navî dihêne bikarînan û bêy nîşan û navî birêka peyvên pirsyarkirinê çewayî, çendêti û rêzbandyê...htd, didene diyarkirin. Ew pirsyara bersiva wê hevalnavek bît ew peyv dibîte hevalnavê pirs. Li dûmahîka her risteyeka pirsyarî nîşana pirs(?) dihête danan ku eve jî êk ji mercên rista pirsyariyê ye.

## 2. 1. 2. 3. Hevalnavên Nediariyê (Belirsizlik Sıfatları)

Ew hevalnav in yên navî ne bi şeweyekê diyar û berçav diyar diken belkî bi awayekê nepenî didene diyarkirin. Ev hevalnav navekî wesif diken bi nediariyê di rista da diyar dibît “Hevalnavên nediariyê, ew hevalnav in yên hebûna hijmar û

<sup>1</sup>Ergin, hb., r. 254.

<sup>2</sup>Yılmaz, hb., r. 106.

<sup>3</sup>Yılmaztürk Tutku, Sözcük Türleri Sıfatlar ve Zamirler, 05/12/ 2012, Bilgisayar, Gedik, Nuray, r. 4.

<sup>4</sup>Yılmaz, hb., r. 108.

<sup>5</sup>Meric, hb., r. 107.

çendêtiya tiştî bi awayekê nediyar û nevebir bi alozî û nediyarî didene diyarkirin.”<sup>1</sup>  
Bo nimûne:

“**Bir** adam dün bize geldi”<sup>2</sup>

Wekî di vê nimûnê da diyar dibît ku peyva (**bir**) wesfa navê (adam) kirye ew jî ev nav e bi nediyarî daye diyarkirin. “Hevalnavên nediyar ew hevalnav in yê tiştî bi nediyarî didene diyarkirin. Ev hevalnave çewayiya serveya tiştî, bi taybetî hijmarê, çendêtiya tiştî bi nediyarî didete xoyakirin, bi şêweyekê nediyar didene derbirîn.”<sup>3</sup>

Peyvên di bine hevalnavên nediyar “az, azbuçuk, başka, bazı, belli başlı, bir, biraz, birçok, birkaç, bir hayli, birtakım, bir sürü, bir yığın, bunca, bütün, çok, çoğu, fazla, her, hiç, hiçbir, hudutsuz, kaç, kimi, nice, sınırsız, yığın yığın...”<sup>4</sup> ji bilê van peyvên ev peyve jî berçav dikevin wekî (herhangi, filan, tüm, herhangi bir...hwd) bo pitir hevalnavên nediyar di tirkî da bihêne diyarkirin, ev ristên li xarê hatîne bikarînan. Bo nimûne:

1. “Elbet **bir** gün bulaşacağız.”<sup>5</sup>
2. “**Bazı** insanlar saygısız oluyorlar.”<sup>6</sup>
3. “**Her** aslan kendi pencesiyle.”<sup>7</sup>
4. “**Çok** kitap okudum.”<sup>8</sup>
5. “**Birkaç** öğrenci üniversiteden geldiler.”<sup>9</sup>
6. “**Birçok** seven kavuşamıyorlar.”<sup>10</sup>
7. “Misafirhanede **bir sürü** insan vardır.”<sup>11</sup>

---

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 383.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 140.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 254.

<sup>4</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 383

<sup>5</sup>Yılmaz, hb., r. 110.

<sup>6</sup>Yusuf Yıldırım, *Türk Dili ve Anlatım Türleri*, Der Yayınları, İstanbul, 2010, R. 147.

<sup>7</sup>Bedirhan & İskot, hb., r. 302.

<sup>8</sup>Meric, hb., r. 108.

<sup>9</sup>Yıldırım, hb., r. 259.

<sup>10</sup>Yıldırım, hc.

<sup>11</sup>Yıldırım, hb., r. 259.

8. “**Tüm** insanlar kardeştir.”<sup>1</sup>
9. “**Birtakım** insanlar dün gece olay çıkarmışlar.”<sup>2</sup>
10. “Bu işi **herhangi bir** adam yapmış olabilir.”<sup>3</sup>
11. “Gün gelecek **bütün** insanlar dostça yaşamayı öğrenecek.”<sup>4</sup>
12. “Bizim ülkemizde **nice** insan bu güzel günü bekliyordu.”<sup>5</sup>
13. “**Hiçbir** zaman onu anlayamadık.”<sup>6</sup>
14. “Dün **kimi** üyeler gelmediler.”<sup>7</sup>
15. “Yabancı turist **az buçuk** türkçesiyle meramını anlatmaya çalıştı.”<sup>8</sup>
16. “**Falan** arkadaş **filan** arkadaş fark etmez.”<sup>9</sup>
17. “**Biraz** yemek daha alır mısınız?”<sup>10</sup>
18. “**Bunca** senedir bu cennet ülkede yaşıyoruz.”<sup>11</sup>
19. “Engellilere **pek çok** konuda yardımcı oluyoruz.”<sup>12</sup>
20. “**Çoğu** zaman güneş doğmadan kalkar.”<sup>13</sup>

Eger serenceka hîr bideyne van ristên li serî hafîne bikarînan dê bînîn her êk  
ji van ristan hevalnavekê nediyar yên têda hatîn ew hevalnavên li berî navî hatîn û  
bêy ku nîşanek bi ser ve hatbîte berdan wesfa wan navan ya kirî û bi nediyarî dayne

---

<sup>1</sup>Yıldırım, hb., r. 259.

<sup>2</sup>Yusuf Yıldırım, hb., r. 147.

<sup>3</sup>Hengirmen, hb., r. 140.

<sup>4</sup>Hengirmen, hc.

<sup>5</sup>Hengirmen, hc.

<sup>6</sup>Yılmaz, hb., r. 111.

<sup>7</sup>Hasan Kolcu, hb., r. 146.

<sup>8</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 383.

<sup>9</sup>Yıldırım, hb., r. 260.

<sup>10</sup>A. Necip Hatiboğlu, *Türk Dili Dersleri Yazılı ve Sözlü Anlatım*, 9. Baskı, Akademi Kitabevi ,  
Ankara, 2005, r. 129.

<sup>11</sup>Gülsün, hb., r. 286.

<sup>12</sup>Gülsün, hc.

<sup>13</sup>Hasan Kolcu, *Türk Dili*, hb., r.146.

diyarkirin û li cihên cuda yên ristê hatîne bikarînan “Navên piştî hevalnavên nediyarî dihên (**az, biraz, birkaç, hiçbir, bir, her, herbir, herhangi bir** nabine kom.”<sup>1</sup> Wek:

“Elbet **bir** gün bulaşacağız.”

Ku navê (**gün**) piştî hevalnavê nediyarî hatiye û bi kit hatiye bikarînan, belê “Navên piştî hevalnavên nediyarî tèn **tüm, bütün, birtakım** bi giştî bi komê dihêne bikarînan.”<sup>2</sup> Wek:

“Gün gelecek **bütün** insanlar dostça yaşamayı öğrenecek.”

Di vê ristê da navê (insan) piştî hevalnavê nediyarî hatiye û bi ser ve berdana nîşanê komê (**lar**) nav kiriye navekê kom.

Belê “navên piştî hevalnavên nediyarî tèn **çok, birçok, nice, nice nice, çoğu, fazla, yarı buçuk, yarım yamalak, başka** hem bi komê hem jî bi kitê dihêne bikarînan.”<sup>3</sup> Wek:

“**Çok** kitap okudum.

Bu savaşlar **nice nice** ocaklar söndürdü.”<sup>4</sup>

Di rista êkê da peyva (kitap) bi kit hatiye bikarînan piştî hevalnavê nediyariyê (**çok**). Di rista duwê da peyva (ocak) piştî hevalnavê nediyariyê (**nice nice**) hatiye bikarînan û bi serve berdana nîşanê komê (lar) nav bi kom hatiye bikarînan. “Peyvên nediyar dema wesfa navekî biken dibine hevalnavên nediyar û dema li cihê navî bihêne bikarînan dibine cihnavên nediyar û heke wesfa karekî kir dê bîte hevalkar.”<sup>5</sup> Bo nimûne:

“Fuarda **kimi** kitaplar pahalı, **kimi** ise ucuzdu. ”<sup>6</sup>

Peyva “**kimi**” ya êkê hevalnavê nediyar e wesfa navê (kitap) kirye ji ber hindê dibîte hevalnavê nediyar û peyva “**kimi**” ya duwê cihnavê nediyar e li cihê

---

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 300.

<sup>2</sup>Demir, hc.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 299.

<sup>4</sup>Demir, hb., r. 300.

<sup>5</sup>Meric, hb., r. 108.

<sup>6</sup>Ulukan, hb., r. 5

navekî hatiye bikarînan ji ber hindê dibîte cihnavê nediyar. Her wesana (peyva“**bir**” dişêtu weku cihnavê nediyar, amrazê peywendî, hevalkar, amrazê lêkder, hevalnavê nediyar û hevalnavê jimareyî bête bikarînan.)<sup>1</sup> Bo nimûne wekî di van ristên jêrî da dihêne bikarînan:

“Oradan **bir**i gelsin. (cihnavê nediyar)

Siz **bir** kendinizi dîsûnûrsûnûz. (amrazê peywendî)

Her şeyden **bir bir** ayrılıyorz. (hevalkar)

Bir size **bir** bize anlatıyormus. (amrazê lêkder)

Dışarıda güzel **bir** araba duruyor. (hevalnavê nediyar)

Sınav **bir** saat sürecekmış.(hevalnavê jimareyî”<sup>2</sup>

Di van ristên serî da peyva “**bir**” di şêş ristan da hatiye bikarînan her carê jî evê peyvê rolek di ristê da gêraye.

#### 2. 1. 2. 4. Hevalnavên Jimareyî (Sayı Sıfatları)

Hevalnavên jimareyî “Ew hevalnav in yên bi rêka jimara navî dene diyarkirin.”<sup>3</sup> Ev hevalnavên jimareyî ji bilî jimarnavan pêve ne çî tişt in “Eve di bineret da û bi serê xwe navên jimaran e.”<sup>4</sup> Dema ku keftine berî navan dê jimara wan yan rêza wan yan dabeşkirina wan yan pîça wan dene diyarkirin. Hevalnavên jimareyî ji lay dabeşkirinê ve hindek dikene çar beş hindek jî dikene pênc beş wekî (Ergin, Banguoğlu, Korkmaz).

##### 2. 1. 2. 4. 1. Hevalnavên Jimara Bingehîn (Asıl Sayı Sıfatlar)

Ev hevalnave jimara didete diyar kirin û hemî jimarên siroştî wekî hevalnavên jimara bingehîn dihêne bikarînan. “Navên jimara, dema dikevne berî navekî dê hevalnavên jimareyî pêk înin.”<sup>5</sup> Bo nimûne:

“Karadenizde havalar **on iki** ay yağışlı geçer.”<sup>6</sup>

<sup>1</sup>Yılmaz, hb., r. 111.

<sup>2</sup>Yılmaz, hc.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, s. 377.

<sup>4</sup>Muharrem Ergin, *Türk Dil Bilgisi*, s. 249.

<sup>5</sup>Hengirmen, hb., r. 140.

<sup>6</sup>Hengirmen, hc.

Peyva (**on iki**) keftiye berî navê (ay) wesif kiriye û biye hevalnavê jimareyî. Hevalnavên jimara bingehîn yan weku peyv (bir, iki...)yan di awayê timamkirina hevalnavî da, lêkdana jimarana (beş yüz, üç bin, sekiz yüz milyon...) yan jî weku kom (on üç, elli yedi, yüz on beş...)<sup>1</sup> dihêne bikarînan. Bi giştî dema hevalnavên jimara bingehîn berî navî tèn çî cara nav nabîte ko yan nîşanên kom wernagirin. Bo nimûne:

“üç çocuk      √                      sekiz otobüs      √  
 üç çocuklar    ×                      sekiz otobüsler    ×”<sup>2</sup>

Di zimanê tirkî da ji bilî jimare êk jimarên dî ji layê ramanê ve hemî derbirînê ji komê diken di raveka hevalnavî da ku nav yekeya binerete nakevîte di awayê kom da, belê di tirkîyê da berê jî nawêze hebûn, yan jî hidek navên taybet dikevîne ji dervey vî çarçovey. Bo nimûne:

“Beşevler                                      (semt adı)  
 Ali Baba ve kırk haramiler              (masal adı)  
 Üç Silahşörler                              (hikaye adı”<sup>3</sup>

Hevalnavên jimara bingehîn weko jimare jî dihêne bikarînan. Bo nimûne:

“15. Metre”<sup>4</sup>

Hindek caran peyveka diyarkirî di navbera navî û hevalnavê jimareyî dihête bikarînan. Wek:

“beş **adet** kalem, bir **demet** gül, bir **saksı** çiçek”.<sup>5</sup>

Dema du hevalnavên jimareyî êk li dîv êk li berî navî bihên pena bo texmînî dihête birin li cihê jimareka vebir. Bo nimûne:

“Bu sıkıntıya **beş altı** gün katlanabilecek misiniz?”<sup>6</sup>

<sup>1</sup>Meric, hb., r. 108.

<sup>2</sup>Gülsün, hb., r. 281.

<sup>3</sup>Gülsün, hb., r. 281.

<sup>4</sup>Meric, hb., r. 108.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 378.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 378.

Her wekî di vê ristê da diyar dû hevalnavên jimereyî ku (**beş, altı**) li berî navî êk li dîv êk hatîne bikarînan ew jî li cihê jimareka vebir hatîne bikarînan.

Hevalnavên (**ilk, son**) ku bi aşkirayî jimareyekê diyar diket û ji layê diyarkirina jimarên ve wekî hevalnavên jimara bingehîn dihêne bikarînan. Wek:

“Züleyha günlerden beri **ilk** defa iştahla yemek yedi.”<sup>1</sup>

Xandina jimarên di tirkî da ji mezin berev biçûk dihête xandin. Wek:

“İki yüz elli beş milyon beş yüz yirmi altı bin üç yüz on iki türk lirası aldı.”<sup>2</sup>

Bo zanîna hevalnavên jimara bingehîn peyva pîrsyarî “kaç”<sup>3</sup> dikevîte berî navî û pîrsyar pê dihête kirin, ew peyva dibîte bersiva wê hevalnavên jimara bingehîn e.

#### **2. 1 .2. 4. 2. Hevalnavên Jimara Rêzîn (Sıra Sayı Sıfatlar)**

Hevalnavên jimara rêzîn ew hevalnav in yên rêz û pileya navî di ristê da didene diyarkirin. “Ew hevalnav in yên rêza navên diyarkirî didene diyarkirin.”<sup>4</sup> Bi ser ve berdana paşgirên “-**ıncı(-inci, -uncu, -üncü)**”<sup>5</sup> li ser jimara bingehîn ve dihêne berdan û hevalnavên jimara rêzîn dirust diken. Bo nimûne:

“Bu yılın **birinci** adamı sen oldun.

Engin **üçüncü** sınıfa gidiyor.”<sup>6</sup>

Di van her du ristên serî da paşgirên (**inci, üncü**) keftîne ser jimarên bingehîn (bir, üç) hevalnavên jimara rêzîn dirust kirîne, ev paşgirên li serî diyar çêkerên hevalnavên jimarên rêzîn in.

Hevalnavên jimara rêzîn ji hevalnavên jimarên bingehîn dirust dibin. Peyvên wekî “**ilk, son, sonucu**”<sup>7</sup>.

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 379.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 378.

<sup>3</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 178.

<sup>4</sup>Yılmaz, hb., r. 120.

<sup>5</sup>Hengirmen, hb., r. 140.

<sup>6</sup>Hengirmen, hc.

<sup>7</sup>Meric, hb., r. 109.



Her wesan “**ortanca**”<sup>1</sup> jî wekî hevalnavên jimara rêzîn dihêne bikarînan.  
Wek:

“Bu gün **ilk** dersimiz kimya.

**Son** kabinede dört yolcu var.

Okuldaki **sonucu** senemiz evlendik”<sup>2</sup>

Peyvên (ilk, son, sonucu) di van ristên serîda rêza navên hatîne wesifkirin diyar kirîne. Hevalnavên jimara rêzîn diruste navên piştî xwe bi komê bidene diyarkirin, anku ew navên piştî hevalnavên jimara rêzîn dihên diruste nîşanên komê werbigirin. “Ew navên piştî hevalnavên jimara rêzîn dihên, eger pêdvî bît dibît dişewê komê da bêtin. Wek.:

İkinci sınıflar, üçüncü şahıslar”<sup>3</sup>

Navên (sınıf, şahıs) nîşana ko (**lar**) wergirtîne û nav êxistîne di şewê komê da. Bo vedîtina hevalnavên jimara rêzîn peyva pirsyarî (**kaçıncı**)<sup>4</sup> li berî navî dihête danan û peyva dibîte bersiva wê peyva pirs hevalnavê jimara rêzîn e.

## 2. 1. 2. 4. 3. Hevalnavên Jimara Dabeşkirnê (Üleştirme Sayı Sıfatları)

Ev hevalnav tiştî bi jimarê beş beş diket “Ew hevalnav in yên tiştî wekî êk beş beş didene diyarkirin.”<sup>5</sup> Ji vê tete zanîn ku ew navê dihête wesifkirin bi hevalnavên jimara dabeşkirnê bi jimarê wekî êk tete lêkvekirin. Hevalnavên jimara dabeşkirinê bi paşgirên “-ar(-er), -şar(-şer)”<sup>6</sup> dihêne dirustkirin ev paşgir e dikevne ser jimara bingehîn û hevalnavên jimara dabeşkirnê jê dirust dibin. Bo nimûne:

“Çocuklar üçer kişilik sıralar halinde dizildiler.

Bütün çocuklara beşer elma veriniz.

---

<sup>1</sup>Gülsün, hb., r. 282.

<sup>2</sup>Gülsün, hb., r. 282.

<sup>3</sup>Ergin, hb., r. 251.

<sup>4</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 178.

<sup>5</sup>Meric, hb., r. 108.

<sup>6</sup>Hengirmen, hb., r. 141.

Her bahçeye dokuz**ar** ağaç dkiniz.”<sup>1</sup>

Di van ristên serî da bo me diyar dibît ku hevalnavên jimarên dabeşkirnê çewa dirust bûne ew jî bi ser ve berdana paşgirê (-er) bo ser jimara bingehîn (üç) û paşgirê (-şer) bo ser jimara bingehîn (beş) û paşgirê (-ar) bo ser jimara bingehîn (dokuz).

Eger jimarên bingehîn bi pîteka nebizwên bi dumahîk bihêt dê paşgirên (-ar (-er)) bi serve dihêne berdan û eger jimarên bingehîn bi pîteka bizwên bi dumahîk bihêt dê paşgirên (-şar(-şer)) bi ser ve dihêne berdan wekî di nimûnên serî da diyar bûn belê “Bitinê di hevalnavê dabeşkirnê da (yarımşar) ji derveyê vê yasayê dimînît û paşgirê (-şar) piştî pîta nebizwên dihêt. Bo nimûne:

“Annesi çocuklarının önüne yarımşar simitle birer dilim peynir koydu.”<sup>2</sup>

Hevalnavên jimara dabeşkirî dema navî wesif diken û xwe di wataya komê da bibînît navê digel dihêt nakevîte di şêwê komê da. Wek:

“Her sınıfta on beşer **öğrenci** var.”<sup>3</sup>

Hevalnavên jimareyî yên lêkdanê bi du curan dirust dibin:

a. beş yüz –er, elli bin –er...

b. beş-er yüz, elli –şer bin... ”<sup>4</sup>

peyvên “**yarımşar, azar, çifter, teker, birkaçar**”<sup>5</sup> wekî hevalnavên dabeşkirinê dihêne bikarînan. Bo nimûne:

“**Yarımşar** şeftali yedik.

Kaçar lahmacun yediniz?- **Öçer**.”<sup>6</sup>

---

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r. 141.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 380.

<sup>3</sup>Gülsün, hb., r. 282.

<sup>4</sup>Tahir Nejat Gencan, *Dilbilgisi*, 4. Baskı, TDK Yayını, Ankara, 1979, r. 176.

<sup>5</sup>Demir, hb., r. 296.

<sup>6</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r.79.

Ev hevalnave jî dibine bersiva pirsyarî “**kaçar**”<sup>1</sup> anku peyva pirsyarî dê kevîte berî navî û dithête bikarînan û peyva dibîte bersiv hevalnavê jimara dabeşkiriye.

Her wesana “Ew navên piştî jimara dabeşkirî dihên nabine kom.”<sup>2</sup>

#### 2. 1. 2. 4. Hevalnavên Jimara Şikestî (Kesir Sayı Sıfatları)

“Hevalnavên jimara şikestî, ew hevalnav in yê navên diyarkirî hijmara wan bi şikestî nîşan didetin.”<sup>3</sup> Anku ew navê bi hevalnavê jimareyî dihête wesifkirin beşek ji wê jimarê navî diyar diketin. Ev hevalnave ne bi awayê peyvê diyar dibî bi awayê kome peyv diyar dibin “Hevalnavên hijmara şikestî ne di awayê peyvekê daye. Di awayê kome peyvê da dihête dîtin:

Üçte **bir** (ekmek), dörtte **üç** (elma)”<sup>4</sup>

Hijmara şikestî piştî hijmara bingehîn dihê û her du pêkve di şewê kome peyvê da dihêne bikarînan. Hevalnavên jimara şikestî jî berî navî dihên, eger piştî navî hatine bikarînan dê wekî nav hêne bikarînan. Bo nimûne:

“paranın yarısı

elmanın çeyreği

arsanın yüzde beşi”<sup>5</sup>

Di van nimûnan da nav berî jimarên hatîne û wekî nav erkê xwe dibînin. “Ew navên piştî hevalnavên jimara şikestî dihên nabine kom.”<sup>6</sup> Peyvên (**çeyrek, yarım, tam**) jî dihêne bikarînan, ev hersê ye di bikarînanê da cudane ji nimûnên berê. Bo nimûne:

“tam gün

yarım elma

<sup>1</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 178.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 296

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 380.

<sup>4</sup>Ergin, hb., r. 252.

<sup>5</sup>Meric, hb., r. 108.

<sup>6</sup>Demir, hb., r. 298.

çeyrek ekme<sup>1</sup>”

Hevalnavên jimara şikestî ji bilî (**çeyrek, yarım, tam**) ji jimara bingehîn û jimara şikestî pêk dihên di şewê ravekê da dihêne bikarînan û jimara bingehîn dihêt û paşan paşgirên (**te, ta, de, da**) paşî jimara şikestî dihtêt wekî di nimûnan da hatiye bikarînan û bi vî şewey hevalnavên jimara şikestî dihêne bikarînan, ji vê dihête zanîn ku hevalnavên jimara şikestî bi paşgirên (te, ta, de, da), dihêne dirustkirin. Ev hevalnave dibine bersivên peyvên pirsyarî “**kaçta kaç, ne kadar**”<sup>2</sup> dema pirsyar ji navî dihête kirin.

#### 2. 1. 2. 4. 5. Hevalnavên Jimara Komê (Topluluk Sayı Sıfatları)

“Ew hevalnav derbirîna tiştê komê diden, eve di navbera ew tiştê diyar kirî da nêzîkiyek, yekêtiyek ya hey nîşan diden.”<sup>3</sup> Hevalnavên jimara komê dirustkirina wan ji “jimara bingehîn + ((i) z / (u) z)”<sup>4</sup> pêk dihêt û hevalnavên jimara komê dirust diket, belê boçûna (Demir<sup>5</sup>, Banguoğlu<sup>6</sup>) herdukan ewe paşgirê (**iz**) ligel jimara bingehîn hevalnavên jimara komê dirust diken. Bo nimûne: “**ikiz çocuk, üçüz oğlan**”<sup>7</sup>

Ew navê piştî hevalnavê jimara komê dihêt dişê nîşana komê jî werbigrît (**lar, ler**). Bo nimûne:

“**üçüz kardeşler, beşiz çocuklar**”<sup>8</sup>

Anku navê piştî hevalnavên jimara komê hem bi kit û hem jî bi komê dihêne bikarînan. Hindek caran jî bi paşgirê **-li** dihête dirêjkirin (ikizli badem), hindek caran jî raste rast paşgirê **-li** dihêt û hevalnavên jimara komê dirust dibêt:

Beşli tabanca                      üçlü anlaşma<sup>9</sup>.

<sup>1</sup>Gülsün, hb., r. 283.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 297.

<sup>3</sup>Ergin, hb., r. 252.

<sup>4</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 381.

<sup>5</sup>Demir, hb., r. 298.

<sup>6</sup>Banguoğlu, hb., r. 355.

<sup>7</sup>Ergin, hb., r. 252.

<sup>8</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 381.

<sup>9</sup>Banguoğlu, hb., r. 356.

## 2. 2. Hevalnav ji Layê Binyadê (Pêkhatin) ve (Yapıları Bakımdan Sıfatlar)

Di zimanê tirkî da hevalnav ji layê pêkhatinê ve da beşî ser sê beşan dibît:

### 2. 2. 1. Hevalnavên Sade (Yahn-Basit Sıfatlar)

Ew hevalnav in yên di binyatê xwe da çi pêvekên çêkîrnê wernegirîtin, anku ji wişeyeka sade pêk hatibît û çi paşgira wernegirîtin, çonkî di tirkîyê da “pêşgir û nîvgir nîn in.”<sup>1</sup> Wek:

(ak, beş, yeşil, kara, kırmızı, çok, az,...vb)

### 2. 2. 2. Hevalnavên Darêjtî (Türemiş Sıfatlar)

Hevalnavên darêjtî “Ew hevalnav in yên ji binyatê navî yan jî karî û pêvekên çêkîrnê dirust dibin.”<sup>2</sup> mebest ji Pêvekên çêkîrnê paşgir in, ewên dikevne ser peyvê û hevalnavên darêjtî dirust diken her wekî di hevalnavên sade da hatiye diyarkirin ku di tirkîyê da pêşgir û nîvgir nîn in. Ew paşgirên di tirkîyê da dihêne bikarînan li ser du xalan dihêne dabeşkirin ya êkê ew paşgirên dikevne ser navan û hevalnavî dirust diken ya **duyê** jî ew paşgirên dikevne ser regên karan û hevalnavên darêjtî dirust diken, ew paşgirên li ser navan dihêne zêdekirin. Wek:

(+II/+IU, +IIk/+IUk, +CI/+CU, +sIz/+sUz, +CA, +Cık/Cuk, +Cıl/+Cul, +sI/+sU, +(I)msI/(I)msU, +(I)mtırak, +şIn, +mAn, +rAk, -Ar/-şAr, +(I)ncI/(U)ncU, +(I)z/(U)z, +sAl, +DA, +Dan, +CA, +DA+ki)<sup>3</sup> ew paşgirên li ser regên karan dihêne zêdekirin wekî: -(A)k, -(I)k/-(U)k, -Gan, -AgAn, -AğAn, -Gın/-Gun, -I/-U, -mA, -(I)nç, -a/-e, -Dık/-Duk, -mİş/-mUş, -An, -r, -Ar> -Ir/-Ur, -mAz, -AcAk, -IcI)<sup>4</sup> ji bilî van paşgiran gelek paşgirên dî jî hevalnavên darêjtî dirust diken, bo her êk ji van paşgiran û yên mayîn jî dê bi nimûne dê hêne behskirin.

1. Ew paşgirên li ser navan dihêne zêdekirin û hevalnavên darêjtî jê dirust dibin:

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r. 114.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 311.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 40-42.

<sup>4</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 43-44.

**Paşgirên (+II/+IU):** “yaş-**lı**, köy-**lü**, kök-**lü**, lise-**li**”<sup>1</sup> kollu, perdeli, tohumlu, karlı, tath, tozlu,...vb.

**Paşgirên (+III/+IUK):** (turşuluk, tohumluk)<sup>2</sup> yüzlük, kışlık, dolmalık, elbiselik,...vb.

**Paşgirên (+CI/+CU):** (demirci, boyacı, kumarci, oyuncu,...vb.)<sup>3</sup>

**Paşgirên (+sIz/+sUz):** (görgüsüz, akılsız, cansız, bilgisiz, huysuz,...vb.)<sup>4</sup> sınıfsız, çocuksuz, parasız....vb.

**Paşgirê (+CA):** (yiğitçe, askerçe, insanca, erkekçe,...vb.)<sup>5</sup> Rusça, Farsça,...vb.

**Paşgirên (+Cık/Cuk):** (incecik, küçücük, sıcacık, azıcık,...vb.)<sup>6</sup>

**Paşgirên (+Cıl/+Cul):** (kırçıl, akçıl, gökçül, ölümcül, bencil,...vb.)<sup>7</sup> otçul, insançıl, evcil,...vb.

**Paşgirên (+sI/+sU):** (kadınsı, erkeksi, çocuksu,...vb.)<sup>8</sup>

**Paşgirên (+(I)msI/+(I)msU):** (beyazımsı, yeşilimsi, sarımsı, mavimsi,...vb.)<sup>9</sup> morumsu,...vb.

**Paşgirê (+(I)mtırak):** (yeşilımtırak, mavımtırak, kırmızımtırak, ekşimtırak,...vb.)<sup>10</sup>

**Paşgirê (+şIn):** (akşın, göksun, karaşın, sarışın,...vb.)<sup>11</sup>

**Paşgirê (+mAn):** (evcimen, egemen, delişmen, göçmen, kocaman,...vb.)<sup>12</sup>

---

<sup>1</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 279.

<sup>2</sup>Banguoğlu, hb., r. 194.

<sup>3</sup>M. Kaya Bilgegil, *Türkçe Dilbilgisi*, 3. Basım, Salkımsöğüt Yayınları, Erzurum, 2009, r 191.

<sup>4</sup>M. Kaya Bilgegil, hb., r 191.

<sup>5</sup>Demir, hb., r. 121.

<sup>6</sup>I. Ersen - Rasch; Onası, hb., r. 31.

<sup>7</sup>Gencan, hb., r. 200.

<sup>8</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 279.

<sup>9</sup>Demir, hb., r. 126.

<sup>10</sup>Demir, hc.

<sup>11</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 341.

<sup>12</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 341.

**Paşgîrê (+rAk):** (bozrak, acırak, küçürek, ufarak,...vb.)<sup>1</sup>

**Paşgîrên (-Ar/-şAr):** (beşer, üçer, altışar, yirmişer, onar,...vb.)<sup>2</sup>

**Paşgîrên (+(I)ncI/+(U)ncU):** (altıncı, beşinci, dokuzuncu, kaçıncı, üçüncü,...vb.)<sup>3</sup>

**Paşgîrên (+(I)z/(U)z):** (beniz, üçüz, ikiz, dördüz, beşiz,...vb.)<sup>4</sup>

**Paşgîrê (+sAl):** (dinsel, cinsel, tarihsel, siyasal, duygusal,...vb.)<sup>5</sup>

**Paşgîrê (+DA):** (gözde, yerinde,...vb.)<sup>6</sup>

**Paşgîrê (+DAn):** (gönülde, sudan, candan, uzaktan, toptan, sıradan,...vb.)<sup>7</sup>

**Paşgîrê (+CA):** (yiğitçe, dostça, askerçe, insanca, kardeşçe, kahramanca,...vb.)<sup>8</sup>

**Paşgîrê (+DA+ki):** (ağaçtaki, eldeki, evdeki, karşıdaki, üstteki,...vb.)<sup>9</sup>

Eve jî hindek paşgîrên dîne ku dikevne ser navan û hevalnavên darêjtî dirust diken. Wek:

**Paşgîrê (-lek):** (ödlek, torlak, dazlak, çıplak)<sup>10</sup>

**Paşgîrê (-imser):** “iyimser, kötümser, karamsar,...vb.”<sup>11</sup>

**Paşgîrê (-ki):** (akşamki, yarınki, dünkü,...vb.)<sup>12</sup>

**Paşgîrê (-lez):** (haylaz, oflaz, üflez,...vb.)<sup>13</sup>

**Paşgîrê (-deş):** (arkadaş, çağdaş, sınırdaş,...vb.)<sup>14</sup>

<sup>1</sup>Gencan, hb., r. 198.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 125.

<sup>3</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 279.

<sup>4</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 279.

<sup>5</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r. 35.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 342.

<sup>7</sup>Gencan, hb., r. 105.

<sup>8</sup>Gencan, hb., r. 201.

<sup>9</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 342.

<sup>10</sup>Banguoğlu, hb., r. 187.

<sup>11</sup>Banguoğlu, hb., r. 176.

<sup>12</sup>Gencan, hb., r. 206.

<sup>13</sup>Banguoğlu, hb., r. 191.

<sup>14</sup>Erol Öztürk,....., Hüseyin Taş, *Üniversiteler İçin Türk Dili Yazılı ve Sözlü Anlatım*, 1. Baskı, Aköğ Yayınları, Ankara, 2013, r. 63.

**Paşgirê (-eç):** (kıraç, kulaç, topaç, vb.)<sup>1</sup>

**Paşgirê (-eği):** (kılağı, iteği, öneği,...vb.)<sup>2</sup>

**Paşgirê (-il):** (usul, kırtıl, güdül, kumul,...vb.)<sup>3</sup>

**Paşgirê (-eri):** (uçarı, göçeri, aşarı, tutarı,...vb.)<sup>4</sup>

**Paşgirê (-ili):** (ekili, sürülü, dikili, dürülü,...vb.)<sup>5</sup>

**Paşgirê (-nez):** (tıknaz, kurnaz, eğenez,...vb.)<sup>6</sup>

2. Ew paşgirên li ser regên karan dihêne zêdekirin û hevalnavên darêjtî jê dirust dibin:

**Paşgirê -(A)k:** (korkak, dönek, ürkek,...vb.)<sup>7</sup>

**Paşgirê -(I)k/-(U)k:** (açık, yırtık, bozuk, öksürük,...vb.)<sup>8</sup>

**Paşgirê -GAn:** (unutkan, konuşkan, çalışkan, alıngan,...vb.)<sup>9</sup>

**Paşgirê -AgAn, -AğAn:** (gezegen, yatağan, süreğen, ivegen,...vb.)<sup>10</sup>

**Paşgirên -Gın/-Gun:**

Ev paşgire bara pitir dikevîte ser karên ji êk birge pêk dihên. Wek: (dalgin, yorgun, üzgün, bezgin, yaygın, düşkün çoşkun, bitkin,...vb.)<sup>11</sup>

**Paşgirên -I/-U:** (çatı, çeki, dolu, duru, sürü, veri,...vb.)<sup>12</sup>

**Paşgirê -mA:** (yazma, kabartma, asma, dönme,...vb.)<sup>13</sup>

---

<sup>1</sup>Erol Öztürk,....., Hüseyin Taş, hb., r. 62.

<sup>2</sup>Banguoğlu, hb., r. 173.

<sup>3</sup>Banguoğlu, hb., r. 177.

<sup>4</sup>Banguoğlu, hb., r. 236.

<sup>5</sup>Banguoğlu, hb., r. 251.

<sup>6</sup>Banguoğlu, hb., r. 273.

<sup>7</sup>A. Necip Hatiboğlu, hb., r. 84.

<sup>8</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r. 39.

<sup>9</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hc.

<sup>10</sup>Demir, hb., r. 133.

<sup>11</sup>Banguoğlu, hb., r. 243.

<sup>12</sup>Erol Öztürk,....., Hüseyin Taş, hb., r. 68.

<sup>13</sup>Demir, hb., r. 152.



**Paşgirê -(I)nç:** (gülünç, iğrenç, kıskanç, korkunç,...vb.)<sup>1</sup>

**Paşgirên (-a/-e):** (sapa, kısa,...vb.)<sup>2</sup>

**Paşgirên -Dık/-Duk:** (tanıdık, görülmedik,...vb.)<sup>3</sup>

**Paşgirên -mİş/-mUş:** (okumuş, çökmüş, geçmiş, yanmış,...vb.)<sup>4</sup>

**Paşgirê -An:** (gören, görünen, bekleyen, kırılan,...vb.)<sup>5</sup>

**Paşgirên -r, -Ar> -Ir/-Ur:** (çalar, içilir, yıkanır, oturulur,...vb.)<sup>6</sup>

**Paşgirê -mAz:** (ölmez, dayanılmaz,...vb.)<sup>7</sup>

**Paşgirê -AcAk:** (içecek, oturacak, söylenecek,...vb.)<sup>8</sup>

**Paşgirê -IcI:** (aldatıcı, satıcı, ağlatıcı,...vb.)<sup>9</sup>

Evên li xarê jî hindek paşgirên dîne yên li ser regên karan dihêne zêdekirin:

**Paşgirê -(e)nek:** (gelenek, tutanak, seçenek,...vb.)<sup>10</sup>

**Paşgirê-geç:** (utangaç, bilgiç,...vb.)<sup>11</sup>

**Paşgirê-giç:** (bilgiç, dalgıç, yüzgüç, sorguç,...vb.)<sup>12</sup>

**Paşgirê-in:** (basın, ürün, dizin, sökün, uzun,...vb.)<sup>13</sup>

**Paşgirê-(İn)ç:** (korkunç, iğrenç, kıskanç,...vb.)<sup>14</sup>

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 343.

<sup>2</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 280.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 344.

<sup>4</sup>Demir, hb., r. 154.

<sup>5</sup>Gencan, hb., r. 230.

<sup>6</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r. 263.

<sup>7</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hc.

<sup>8</sup>Banguoğlu, hb., r. 228.

<sup>9</sup>M. Kaya Bilgegil, hb., r. 192.

<sup>10</sup>Demir, hb., r. 136.

<sup>11</sup>M. Kaya Bilgegil, hb., r. 192.

<sup>12</sup>Banguoğlu, hb., r. 242.

<sup>13</sup>Demir, hb., r. 147.

<sup>14</sup>M. Kaya Bilgegil, hb., r. 192.

**Paşgirê-meç:** (yırtmaç, germeç, demeç,...vb.)<sup>1</sup>

## 2. 2. 3. Hevalnavên Lêkdayî (Birleşik Sıfatlar)

Hevalnavên lêkdayî ew hevalnav in yên ku bi kêmî ji du peyvên lêkdayî pêk dihên, ev peyvên watadar dema hatine lêkdan dê watayeka nû dirust ken.

Hevalnavên lêkdayî ser du tayan dabeş dibin: (**Hevalnavên Lêkdayî yên Têkhel (Kaynaşmış Birleşik Sıfatlar, Hevalnavên Lêkdayî yên Birêzik (Kurallı Birleşik Sıfatlar)**)<sup>2</sup>

### 2. 2. 3. 1. Hevalnavên Lêkdayî yên Têkhel (Kaynaşmış Birleşik Sıfatlar)

Ev curê hevalnavên lêkdayî ji layê nivîsînê ve pêk ve dihêne nivîsîn:

1. Yên ji du navên sade pêk hatî (iki yalın addan yapılmış olanlar)

cin + göz → cingöz

pala + bıyık → palabıyık

kepçe + kulak → kepçekulak<sup>3</sup>

2. Pêkhatina wê di awayê raveka navî ya nediyar da (Belirtisiz ad tamlaması şeklinde yapılmış olanlar)<sup>4</sup>

“Çiçek bozuğu adam, uluslararası gerginlik, kuşbaşı kar...”<sup>5</sup>

3. Lêkdana du hevalnavan (İki sıfat kaynaşması)

Biraz, birçok, birkaç,...vb.)<sup>6</sup> (herhangi,...vb.)

4. Ewên ji navekî û karekî yan kirnekê pêk hatîn (Bir adla bir eylem yada eylamsiden yapılmış olanlar):

hak + sever → haksever

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 153.

<sup>2</sup>Gencan, hb., r. 249-250.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 312.

<sup>4</sup>Demir, hc.

<sup>5</sup>Gencan, hb., r. 249.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 345.

çal + çene → çalçene

vatan + sever → vatansever<sup>1</sup>

(konuksever,...vb.)

5. Yê di awayê raveka hevalnavî da dihêne dirustkirin (Sıfat takımı şeklinde yapılmış olanlar:

boş + boğaz → boşboğaz

dilli + düdük → dillidüdük<sup>2</sup>

6. Yê ji du karan yan jî kirnan dihêne dirustkirin (İki eylem yada eylamsiden yapılmış olanlar:

vurdum + duymaz → vurdumduymaz

okur + yazar → okuryazar<sup>3</sup>

7. Yê bi awayê Hevalnavên Lêkdayî yê birêzik dihêne dirustkirin (Kurallı bileşik sıfat şeklinde yapılmış olanlar)<sup>4</sup>

(ikiyüzlü, dörtkaşlı, başıboş,...vb.)<sup>5</sup>

### 2. 2. 3. 2. Hevalnavên Lêkdayî yê Birêzik (Kurallı Birleşik Sıfatlar)

Ev curê hevalnavên lêkdayî jêk cuda dihêne nivîsîn peyv li dîv yasayên diyarkirî dihêne dirustkirin ji wana:

1. Hevalnavêk + navêk + paşgirên (+II /+ IU /+ sIz /+ sUz) (Bir sıfatla +II /+ IU /+ sIz /+ sUz sıfat eki almış addan oluşan;<sup>6</sup> ve -ci eki getirilir<sup>7</sup>

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 312.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 313.

<sup>3</sup>Demir, hc.

<sup>4</sup>Demir, hc., r. 313.

<sup>5</sup>Gencan, *Dilbilgisi*, s. 249.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 344.

<sup>7</sup>Gencan, hb., r. 250.

(açık sözlü, beyaz tenli, kalın kafalı, uzun boylu, beş parasız,<sup>1</sup> sağlam kuduracı,<sup>2</sup>...vb.)

2. Raveka hevalnavî beruvajî bibît, cihnavê kesê sêyê tak -i; nîşanên rewşî -i, -e, -de, -den bihêne ser navî (Sıfat takımı ters çevrilir, isme III. tekil kişi iyelik eki -i; durum ekleri, -i, -e, -de, -den getirilir:

kısa boy → boyu kısa çocuk

yakın can → cana yakın insan

sakat kafa → kafadan sakat yapımcı

kolay dil → dile kolay iş)<sup>3</sup>

3. Raveka hevalnavî yên bi jimarên bingehîn pêk dihên bi paşgirê –lik dibine lêkdayî (Asıl sayılarla kurulmuş sıfat takımları –lik ekiyle bileşik olur:

Kırk yıllık arkadaş, iki aylık ödenek, iki gömleklilik kumaş,...vb.)<sup>4</sup>

4.Cot peyv û yên wekî cot peyvan bo her êk ji wan pêveka -li dibine hevalnav (İkizlemeler ve ikizleme değerinde çift sözcüklerin her ikisi de -li eki olarak sıfat olur:

saçlı sakalı, kapalı bacalı, derli toplu, irili ufaklı,...vb.)<sup>5</sup>

5. Nav + nav + II /+ IU pêvekên hevalnavî pêk dihên (Ad + ad + II /+ IU sıfat ekinden oluşan:

aslan yürekli, ipek saçlı, taş yürekli,...vb.)<sup>6</sup>

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 344.

<sup>2</sup>Gencan, hb., r. 250.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 314.

<sup>4</sup>Gencan, hb., r. 250.

<sup>5</sup>Gencan, hb., r. 251.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, s. 344.

6. Pitiriyâ peyvên wekî êk ew cot peyv bi pêveka –siz dibine hevalnavên lêkdayî û paşgirê -lik (ikizlemelerin birçoğu da çifte –siz ekiyle bileşik sıfat olur;<sup>1</sup> ve –lik ekiyle<sup>2</sup>

evsiz barksız, ipsiz sapsız,....vb.)<sup>3</sup>

günlük güneşlik,....vb.)

7. Hevalnavên rengî bi hindek hevalnavên dîtir bihêne wesifkirin û pêvekê wernegirît dibine lêkdayî (Renk sıfatları başka sıfatlarla nitelenerek ek almadan bileşik sıfat olur:

Açık mavi gözler, koyu siyah saçlar, parlak kırmızı bir lale,...vb.)<sup>4</sup>

8. Xortkirin weko hevalnav di bikarînanê da dihêne hijmartin hevalnavên lêkdayî yên bi rêzik (İkilemeler sıfat olarak kullandıklarında kurallı bileşik sıfat sayılırlar:

İnce ince dallar, kırık dökük eşya, iyi kütü günler,...vb.)<sup>5</sup>

9. Pêkînanâ ravekan ji jimarên bingehîn û digel jimarên dabeşkirî bêy ku pêvekê werbigirît komeka hevalnavên diyarkirî pêk dînin (Asıl sayılar ve üleştirme sayıları ile kurulan takımlar ek almadan belirtici bir sıfat öbeği oluştururlar:

on metre kumaş, ikişer kilo makarna ,beş çuval buğday,...vb.)<sup>6</sup>

### 2. 3. Hevalnav ji Layê Pileyê ve (Sıfatları Derecelendirme)

Bi giştî pileyên hevalnavî ew in ku çewayiya du tiştan yan zêdetir bihêne hevberkirin di wesifdanê da ev nav e yan zêdeyî yan jî kêmi yan jî wekheviya wan bihête diyarkirin. Bi giştî ji layê dabeşkirinê ve pileyên hevalnavî bi çend curên jêk cuda hatîne dabeşkirin anku rêkeftin li ser dabeşkirina wê nîne û hindek li ser sê pılan hindek li ser çar pılan û hindek jî li ser (pênc)<sup>7</sup> pılan da beş kirîne:

<sup>1</sup>Gencan, hb., r. 251.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 314.

<sup>3</sup>Gencan, hb., r. 251

<sup>4</sup>Gencan, hc.

<sup>5</sup>Demir, hb., r. 315.

<sup>6</sup>Demir, hb., r. 314.

<sup>7</sup>Meric, hb., r. 110-111.

### 2. 3. 1. Pileyâ Hevalnavên Taybet (Derecesiz Sıfatlar)

Hevalnavên taybet (bê pile - çspaw) ew hevalnav in yên bi hevalnavên çewayî dihêne hijmartin. Ev hevalnav e çî hevberkîrnê di navbera tiştî da naketin tinê çewayîya tiştî didete diyarkirin. Bo nimûne:

“yeşil (ağaç), aç (insan), büyük (iş)...”<sup>1</sup>

Ewên reştir hatîne nivîsîn hevalnavên taybet in.

### 2. 3. 2. Pileyâ Hevalnavên Wekheviyê (Eşitlik Derecesi)

Ev hevalnave di hevberkîrnê da wekheviya du tiştan nîşan didet “Di hevalnavî da pileyên wekhevî, çewayîyê di navbera hebûna du tiştî da di wekheviyê yan di yeksaniyê da nîşan didetin.”<sup>2</sup> Ev pile ye jî bi amrazên “**kadar, gibi**”<sup>3</sup> dihêne bikarînan. Bo nimûne:

“Benim **kadar** akıllı çocuk, Saray **kadar** büyük ev, Ali **gibi** iyi insan...”<sup>4</sup>

Di pileya wekheviyê da amrazên pileya wekheviyê her dem li berî hevalnavî dihêne bikarînan wekî di nimûnên serîda diyar bûn û bo pitir rûn bibît ev nimûne hatîne wergirtin:

“Ali, benim **kadar** akıllı bir çocuktur.

Ben, senin **kadar** akıllı bir çocuk görmedim.

Şunun **kadar** uzun bir atkı istiyorum.

Ben, Ayşe **kadar** güzel bir kadını.

Bursa, Ankara **kadar** güvenli bir şehirdir.”<sup>5</sup>

“Bunun **gibi** geniş bir ev almak istiyorum.”<sup>6</sup>

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 246.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, s. 363.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, s. 381.

<sup>4</sup>Deniz Meric, *Temel Türkçe Dilbilgisi*, s. 111.

<sup>5</sup>Gülsün, hb., r. 298.

<sup>6</sup>Gülsün, hb., r. 297.

“Ayşe **gibi** başarı bir avukat olmayı çok isterim.”<sup>1</sup>

“Zehir **gibi** acı sözler söyledi bana.”<sup>2</sup>

Ji van ristan diyar dibît wekhevî û yeksaniya du navan yan cihnavan di êk tişt da didete diyarkirin. Ev nave yan cihnav e bi şeweyên curawcur dihêne bikarînan her du nav yan cihnav di bikarînanê da li berî hevalnavî dihên ew navê hevbeşiya wan diyar diket li piştî hevalnavî dihêt. Wek:

“Bursa, Ankara kadar güvenli bir **şehirdir**.”

Navên (Bursa, Ankara) her duk hevbeş in di navê (**şehirdir**) da yan jî navek yan cihnavêk li berî amrazên (**kadar, gibi**) dihên yê dîtir jî piştî hevalnavî dihên. Wek:

“Zehir gibi acı sözler söyledi bana”

Yan jî her du nav û cihnav û paşî amrazên (**kadar, gibi**) paşî hevalnav. Wek:

“Bursa, Ankara kadar güvenli bir şehirdir”

“Ben, senin kadar akıllı bir çocuk görmedim.”

Ew nav yan cihnavê dihêne bikarînan digel amrazê (kadar) dişêt nişana peywendiyê jî werbigrît. Wek:

“Sizin kadar çalışkan insanlar az bulunur.

Ankara bir bozdolabı kadar soğuk bir şehirdir.”<sup>3</sup>

Hindek caran amrazê (kadar) nahête bikarînan û li cihê wî hindek peyvên dî pileya wekheviyê didene diyarkirin wekî (**derece, denli**)<sup>4</sup> û hindekên dî. Bo nimûne:

“Bu **derece** candan bir karşılama daha önce görmedim.”<sup>5</sup>

“Siz bu yazınızla **ne** iyi bir hizmet yaptınız doğrusu.

---

<sup>1</sup>Gülsün, hb., r. 296.

<sup>2</sup>Gülsün, hc.

<sup>3</sup>Gülsün, hb., r. 298.

<sup>4</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 364.

<sup>5</sup>Gülsün, hb., r. 299.

Bu **denli** güzel kumaşı nerede buldunuzki.”<sup>1</sup>

Paşgirê (**ça**)<sup>2</sup> nîşana awayê wekhevîyê didete diyar kirin di çarçovê hindek peyvan da dihête bikarînan:

“Böylece çocuk**ça** nazlanmalar neyin nesi?”<sup>3</sup>

### 2. 3. 3. Pileya Hevalnavên Hevberkirinê (Beriztiriyê) (Üstünlük Derecesi)

Ev pileye hevberkirina navekî digel navekê dî yan tişteki digel tişteki dî diket û ev hevberkirine yan dê zêdeyiya wê yan kêmatiya tiştî digel yê dî didete diyar kirin “beriztirîn yan jî pileya hevberkirmê, wesifkirina tişteki digel tişteki dîtir yan jî li gorî tiştên dî pileya pitir, beriztir, kêmtir, xartir nîşan didetin. Bi giştî hevalkarê (**daha**) tête berî hevalnavî.”<sup>4</sup> Kortiya vê pinasê ewe hevberkirina du navan yan tiştan ne wekî êk bin diyar diketin, ca çi pileya wê zêdetir yan jî kêmtir. Bo nimûne:

“Ayşe, Nazlı‘dan **daha** düzenli bir kızdır.”<sup>5</sup>

“Mehmet, Ayşeden **daha** çalışkandır.

Bu ev, sizin evden **daha** güzeldir.

Fatma, Serpil‘den **daha** akıllıdır.

Fil, tavşandan **daha** büyüktür.”<sup>6</sup>

Her wekî di nimûnan da û di pinasê jî da diyar bûy hevalkarê (daha) li berî hevalnavî dihête bikarînan û her du navên hevberkirî li dîv êkra û li berî hevalkarê (daha) dihête bikarînan û navê duyê yê hevberkirî nîşanên cudabûnê (**dan, den, tan, ten**) werdigrîtin û pileya hevberkirî dirust dibît.

Hindek caran jî ev hevberkirine bêy hevalkarê (daha) dihête bikarînan bi harîkariya nîşanên cudabûnê (**dan, den, tan, ten**). Bo nimûne:

“Köpek kediden sadıktır.

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 364.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 364.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 365.

<sup>4</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 365.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Gramer Terimleri Sözlüğü*, r. 98.

<sup>6</sup>Hengirmen, hb., r. 134.



Evlilerin sevdası bekarlardan ziyde.”<sup>1</sup>

Her wesan (paşgirê **ki** pila hevberkirnê dirust diketin:

Bugünkü hava dünkünden soğuk.

Benim arabam seninkinden eski)<sup>2</sup>

### 2. 3. 4. Pileya Hevalnavên Bala (En Üstünlik Derecesi)

Ev pileya hevalnavî cudahiya hevberkirinê di navbera du tiştan zêdetir diketin ku ew jî tiştê di wesifkirinê da ji hemî tiştên dî yên hevtoxmên xwe bi pileya herî bilind nîşan didetin. Ev pileya hevalnavê bala bi îmana hevalkarê (**en**)<sup>3</sup> ku dikevîte berî hevalnavî û pileya hevalnavê bala dirust dibîtin. Bo nimûne:

“Bence **en** zeki hayvan köpektir.

**En** eğlenceli ders, konuşma dersidir.”<sup>4</sup>

“Mehmet **en** çalışkan öğrencidir.

Tanıdığım **en** güzel kız sensin.”<sup>5</sup>

Her dem hevalnav dikevîte piştî hevalkarê (**en**) yê ku pileya hevalnavê bala dirust diketin. Ji layê bikarînanê ve jî (**en**) hem li dest pêka ristê û hem jî li nîva ristê dihête bikarînan. Ew navê yan tiştê ji hemî navên dî yan tiştên dîtir bi pileya beriztirîn dihête nîşanandan navên taybet in hevberkirîne digel navekê giştî ku ew jî hevberker in, wekî di nimûnên serî da diyar bîn, navên hevberkirî û navên hevberker dikevne piştî hevalnavî yan jî navê hevberkirî dê li berî hevalkarê (**en**) hêtin û navê hevberikirin digel dihête kirin dikevîte piştî hevalnavî. Di nimûna êkê da navên hevberker (hayvan) û hevberkirî (köpek) piştî hevalnavî (**zeki**) hatine bikarînan. Di nimûna duwê jî da navên hevberker (ders) û hevberkirî (konuşma ders) piştî hevalnavî (**eğlenceli**) hatine bikarînan. Di nimûna sêyê da navê hevberkirî (Mehmet) berî hevalkarê (**en**) hatiye û navê hevberker (öğrenci) piştî hevalnavî (**çalışkan**)

<sup>1</sup>Banguoğlu, hb., r 347.

<sup>2</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r. 75.

<sup>3</sup>Hengirmen, hb., r. 134.

<sup>4</sup>Gülsün, hb., r. 301.

<sup>5</sup>Hengirmen, hb., r. 134.

hatiye bikarînan, di nimûna çarê da navê hevberker (kız) û cihnavê hevberkirî (sen) piştî hevalnavê (**güzel**) hatine bikarînan.

Hindek caran jî bi vî şêweyê dirust dibît eger bi tinê navê hevberkirî bihête gotin û navên hevberker nehête gotin ca hevalnav çî nîşanên karî werbigrît yan jî wernegrît bivî rengî dê hête diyarkirin:

“Yusuf en yaşlı- **dır**, Zeynep en genc... ”<sup>1</sup>

Di van nimûnên serî da tinê navên hevberkirî hatîne gotin. Yan jî eger em navê hevberkirî digel wan navên hevberkirin digel dihête kirin bi kar bînin ku ew jî bara pitir navekê komê dihête bikarînan. Wek:

“Yusuf **çocukların** en yaşlısıdır. Zeynep **kardeşlerin** en gencidir.”<sup>2</sup>

Eger nav yê diyarkirî bî hevalnav nîşanê xawendarêtiyê werbigrît dêkevîte piştî nîşana komê:

“Yusuf en yaşlılarıdır. Zeynep en gençleridir.”<sup>3</sup>

Eger navê hevberkirin hate ladan ji ristê nîşana kmê dê kevîte ser hevalnavî. Wek:

“Yusuf en yaşlılarıdır.”<sup>4</sup>

Hindek caran jî pileya bala bêy bikarînana hevalkarê (en) dihête dirustkirin:

“Yusuf kardeşlerin yaşlısıdır.”<sup>5</sup>

Her wesan bi van rengan jî dirust dibin:

“**En** yaşlı Yusuftur. Çocukların **en** yaşlısı Yusuftur. **En** yaşlıları Yusuftur. Çocukların yaşlısı yusuftur.”<sup>6</sup>

---

<sup>1</sup>Banguoğlu, hb., r. 347.

<sup>2</sup>Banguoğlu, hc.

<sup>3</sup>Banguoğlu, hc.

<sup>4</sup>Banguoğlu, hb., r. 347.

<sup>5</sup>Banguoğlu, hc.

<sup>6</sup>Banguoğlu, hc.

Ji van nimûnan diyar dibît ku hevalkarê (**en**) peyva dirustkera pileya bala ye û her wesana şêwê dirustkirina vê pileyê ya curawcur e bi gelek awayan axiftinker dişêt vê pilêyê derbibrît û ji layê rêzimanî ve çî kimasî têda nîn in.

### 2. 3. 5. Pileya Hevalnavên Zêdeyîyê (Aşırılık Derecesi)

Di hevalnavan da pileya zêdeyî, ev piley e kêmi û zêdeyîya tiştî yê bi hevalnavê çewayî hatiye weskirin didete diyarkirin. Ev peyvên hêzdar “çok, pek, çok fazla, çok az, pek çok, pek az, fazlasıyla, epey, fevkalâde, gayet, hayli, harikulade,...”<sup>1</sup> dikevne berî hevalnavê çewayî û pileya zêdeyîyê dirust diken û ramana zêdeyîyê dibexşînê belê “hevberkîrnê naken.”<sup>2</sup> Ji vê dihête zanîn ev peyvên hêzdar dema bikevne berî hevalnavên çewayî hevalnavên çewayîyê pitir xort diken, tiştê hevberî êk naken. Bo nimûne:

“**Çok** büyük bir binanın önünde durduk.”<sup>3</sup>

“Sınav **çok** başarılı öğrencileri üzdü.”<sup>4</sup>

Dema “amrazê (**kadar**) bikevîte di navbera hevalnavên çewayî û peyvên (bu, o, ne) erkê pileya hevalnavên wekhevîyê diyar naken, êk êke wataya “bu kadar çok”, “o kadar çok”, “ne kadar çok” pileya zêdeyîyê pêk diînin.”<sup>5</sup> Ji eva serî diyar dibît dema peyva (**kadar**) kevte di navbera hevalnavê çewayî û peyvên (bu, o, ne) dê bi wataya pileya zêdeyîyê dihêne diyarkirin ne bi pileya hevalnavê wekhevîyê:

“Pek az şey bu **kadar** acıklı ve güzel olabilirdi.

O zaman insanları ne **kadar** garipmiş.”<sup>6</sup>

Eger peyva (**kadar**) digel peyva (**ne**) nehêt jî yan (**ne**) raste rast digel navî bihête bikarînan dîsan hevalnavê pileya zêde pêk dihêt Wek:

“Rüyalarım bende devam ediyor **ne** korkunc şey.

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 366.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 308.

<sup>3</sup>Demir, hc.

<sup>4</sup>Seylan – Çelikbağ, hb., r.183.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 367.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 367.

Fakat **ne** nefis küçük tavrıları var.”<sup>1</sup>

Di van her du nimûnan da peyva (kadar) ne hatîne bikarînan û nav êkser bi peyva (ne) ve hatîne girêdan û pileya zêdeyîyê diyarkiriye. (Weku şewazekê taybetî bi dubarekirina hevalnavî ku paşgirê “-mı/-mu” ku erkê pirsyariyê ji dest daye kevîte navbera hevalnavê dubarekirî û wan pêkve girê didet û pileya hevalnavên zêdeyîyê dirust diket. Wek:

Canlı **mi** canlı bir tabiat; iyi **mi** iyi bir iş! Ama bir şey eksik.)<sup>2</sup>

Bi giştî evro di zimanê tirkî da di pileyên hevalnavî da “Amrazên **gibi, kadar** di pileya wekhevîyê da, hevalkarên **daha** di pileya hevberkîrî da û **en** di pileya bala da dihêne bikarînan: güzel, daha güzel, en güzel...”<sup>3</sup>

### **3. Biçûkkirina Hevalnavan (Küçültme Sıfatları)**

Biçûkkirin yan bixwe tiştêkê biçûke yan jî ji ber viyanê mirov biçûk diketin yan jî ji ber neviyanê. Di hevalnavî da biçûkkirin “Dibêjîne wan havalnavan hevalnavên biçûkkîrî yê çewayîya wan bi pileyeka daketî û sivik diyar diken.”<sup>4</sup>

Ew hevalnav in yê çewayîya tiştî kurt û kêr nîşan diden “Ka çewan bi rêka pileyan û xortkîrî wataya hevalnavan bi hêz dikevît wesan bi rêka paşgiran hevalnav dihêne biçûkkirin.”<sup>5</sup> Ew paşgirên hevalnav pê dihêne biçûkkirin her êk ji van serçawên me bi kar înayîn bi kêr û zêdeyî xwe di van paşgiran vedibînin “+CA, +CANA, +cAK, +cIK/ +cUK, +sII +sU, msI / +msU, mtrak ve +rak”<sup>6</sup> ev paşgir e digel dengên bizwên yê kurt û dirêj ji birga dûmahiyê ji peyvê dihêne gohurîn anku xwe digoncînin. Paşgirên biçûkkîrî piştî hevalnavî tîn anku dikevne ser hevalnavî wataya hevalnavî nîşan didet û watayeka nû yan jî nêzîkê wê yan jî wekhevîyê didetê. Bo nimûne:

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 367.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 368.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Grammer Terimleri Sözlüğü*, r. 98.

<sup>4</sup>Banguoğlu, hb., r. 346.

<sup>5</sup>Gencan, hb., r. 182.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 368.

“temizce bir ev”<sup>1</sup> dema em vê dibêjîn merem pê eve ye ew jî “temize yakın bir ev (tam temiz değil)”<sup>2</sup>

Ew paşgirên bi paşgirên biçûkkirnê dihêne niyasîn heman ew paşgirin yê peyvan darêjin “Paşgirên biçûkkirnê paşgirên wişe darêjin”<sup>3</sup> bo pitir diyarkirina van paşgiran dê hem hindek nimûnan û hem jî hindek ristan bi kar înin:

Paşgirê (+**ca**): ev paşgir e dema bikevîte ser hevalnavî wataya nêzîkiya wê peyvê digehînt:

“alaca karanlık, büyükçe bir ev, çokça iş, ekşice bir meyve”<sup>4</sup>

“Yeni evlilere genişçe bir ev hediye etti.”<sup>5</sup>

Paşgirê (**ca**) dema diçîte ser hevalnavî û digel navan pêkve taybetmendiya hizirkirin û xînşirînî û paşnavî diyar diken weko hevalnavên çewayî dihêne bikarînan. Bo nimûne :

“akça ağaç (akça+ağaç), bozca ada(bozca+ada), Karaca Ahmet”<sup>6</sup>

Paşgirê (+**cana**): pitir di zimanê axiftinê da diyar dibît paşgirê + **ca** digel paşgirê + **na** dihête lêkdan û pitir berfirehtir dibît û her du wek paşgirekê lêkdayî xwe dibînin. Wek:

“Onun bu işe peki demesi aptalcana bir hareket sayılır.

“Karşımızda güzelcene bir kız oturuyordu.”<sup>7</sup>

Paşgirê (+**cak**): ev paşgir e bi vî rengî dihête bikarînan:

(büyücek bir bina, ısıcak bir ekmek,...)<sup>8</sup>

---

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r. 136.

<sup>2</sup>Hengirmen, hc.

<sup>3</sup>Meric, hb., r. 112.

<sup>4</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 369.

<sup>5</sup>Seylan – Çelikbağ, hb., r. 184.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 369.

<sup>7</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 369.

<sup>8</sup>Demir, hb., r. 306.

“Eğilip ayaklarını çaya soktuğunda ılı**cak** bir su aktığını fark etti.”<sup>1</sup>

Paşgirên (+**cık**/**cak**):

(kısac**ık** saç, ufac**ık** çocuk, azı**cık** yemek)<sup>2</sup>

Hindek caran peyvên dûmahîka wan pîta (**k**) bît dema paşgirin biçûkkirnê diçine ser ev pît e ji peyvê dikevît wekî (ufak +cık= ufacık) û di hindek peyvan da pîtên (i, e)<sup>3</sup> dikevne navbera paşgirî û hevalnavî ev pît e jî dihêne gohurîn digel pîtên bizwên yên peyvê anku xwe digoncînin digel peyvê. Wek (az+ı+cık= azı**cık**).

“Ben bu ufac**ık** odada oturuyorum.

Bu mektubu biric**ık** eşime yolluyorum.

Küçüc**ük** çocuk, kocaman bir taşı kaldırdı.”<sup>4</sup>

Paşgirên (+**sı**/**su**, +**msı**/**msu**):

Ev paşgire bi rêka hevberkîrnê yan jî wekheviyê erkê biçûkkîrnê dibînin:

(çocu**su** yüz, hayvans**ı** duygular, kadıns**ı** ses,...)<sup>5</sup>

Her wekî Korkmaz dibêjît: (Ev paşgir e ji êk bine kok in bitinê cudahî (+**sı**/**su**) piştî nebizwênan tên û (+**msı**/**msu**) piştî bizwênan dihên. Wek:

(acı**msı**, ekşim**si**, incem**si**, küylü**msü**, tuzl**msu**,...)<sup>6</sup>

“Kireç**si** topraklar ziraate elverişli değildir.

Üzerinde kadıns**ı** zarafet hiç eksik olmuyor.

Üzerinde kahve rengi bir etekle yeşilim**si** bir ceket vardı. Bazı kimseler acı**msı** ve ekşim**si** yiyecekleri pek severler.”<sup>7</sup>

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 370.

<sup>2</sup>Meric, hb., r. 112.

<sup>3</sup>Gencan, hb., r. 183.

<sup>4</sup>Hengirmen, hb., r. 134.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 371.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 371.

<sup>7</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 372.

“Karda ilk defa gördüğüm morumsu çiçekler çok güzel kokuyordu.”<sup>1</sup>

Paşgirê (+**mıtrak**):

Ev paşgir e bara pitir dihête ser peyvên girêday rengî yan jî tamê û wekheviyê nîşan diden.

(sarım**tıtrak**, ekşim**tıtrak**, acım**tıtrak**,...)

“Bu salatalıkların acım**tıtrak** bir tadı var.”<sup>2</sup>

“Aldığım morum**tıtrak** kumaşı herkes çok beğendi.

“Bu ekşim**tıtrak** elmalar diğerlerinden daha lezetli.”<sup>3</sup>

Paşgirê (+**rak**): ya rastî paşgirekê hevberkîrnêye di hevalnavan da pileya bala diyar diketin. Belê di tirkî da bi borîna demî weko paşgirekê biçûkkîrnê dihête bikarînan.

(Acı-**rak**, ufa(k)-**rak**, küçü(k)-**rek**, ekşirek,...)<sup>4</sup>

“Muhlis’i diğerlerine nisbeten küçü**rek** bir odaya soktular.”<sup>5</sup>

Her wekî di nimûnan jî da diyar bî eger peyv bi pîta (k) bi dumahîk hat û paşgirê (rak) bikevîte ser dê ew pît ji peyvê kevît.

Paşgirên dikevne ser hevalnavî û biçûkkîrina hevalnavî diyar diken hemî wekheviyê yan jî nêzîkiya wê didene diyarkirin bi rêka vê wekheviyê erkê biçûkkîrnê dibînît.

#### 4. Xortkirina Hevalnavan (Pekiştirme Sıfatları)

Hevalnavên çewayî bi rêkên curawcur dihêne bihêzkin. Mebest ji xortkirina hevalnavan ewe ku wata û ramana wan bihêztir biken, ev xortkirne, bihêzkirne di

---

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r. 137

<sup>2</sup>Demir. Hb., r. 306.

<sup>3</sup>Hengirmen, hb., r. 137.

<sup>4</sup>Gencan, hb., r. 184.

<sup>5</sup>Gencan, hc.

hevalnavên çewayî da xwe dibînin dema hevalnavên çewayî wesfa navekî biken bo pitir hêzdar bît ev hevalnav e penayê bo çend rêkekan dibetin ji wan:

1. Xortkirin bi pîtên nebizwên “**m, p, r, s**”<sup>1</sup>

Ev rêk e ji birga êkê heta pîta bizwên ji hevalnavê çewayî dê hête rakirin û êk ji pîtên nebizwên “**m, p, r, s**” ku digel wê peyvê bigoncît dêkevîte ser wê birga hatiye rakirin û dê kevîte ser hevalnavî ve û dê hevalnav hête xortkirin. Yan jî em dişeyn bi vî rengî bêjîn birga êkê ji hevalnavê çewayî heta pîta bizwên dê rabît û dê êk ji van pîtên nebizwên “**m, p, r, s**” danîne dinavbera birga rakirî û peyva bineret (eslî) û hevalnav dê hête xortkirin. Bo nimûne:

(te-**r**-temiz = tertemiz su

sa-**p**-sarı = sapsarı ayva

ma-**s**-mavi = masmavi adam

ye-**m**-yeşil = yemyeşil çayır)<sup>2</sup>

Ew hevalnavên bi pîtên bizwên dest pê diken pîta “**p**”<sup>3</sup> werdigrît bo xortkirnê. Bo nimûne:

(acı → **a**pacı ; apacı ekmek

aydın → **a**paydın ; apaydın insan

ıslak → **i**pıslak ; ıpslak elbise)<sup>4</sup>

Hindek caran jî pîtên zêde dikevne navbera peyva bineretî (eslî) û birga hatiye rakirin ku “Hevalnavên xortkirî **sapsağlam, güpgündüz, yapıyalız, çırçıplak, sırsıklam, çepçevre, düpdüz** bi **e, a** yan jî **-il** wergirît careka dî xort dibine ve.

Ev xortkirm e wataya wan ji yên dîtir pitir bihêz in.

<sup>1</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 184.

<sup>2</sup>Meric, hb., r. 111.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 303.

<sup>4</sup>Hengirmen, hb., r. 135.



sapsağlam	→	sapasağlam
güpgündüz	→	güpegündüz
yapyalnız	→	yapayalnız
cepçevre	→	çepeçevre
sırsıklam	→	sırılısıklam
çırçıplak	→	çırılçıplak
düpdüz	→	düpedüz” <sup>1</sup>

Ev birgên ji hevalnavî dihêne rakirin digel pîten nebizwên “**m, p, r, s**” dema dikeve ser peyva bineretî wekî pêşgir dihêne bikarînan. “Di tirkî da pêşgir bi tinê di xortkirina hevalnavan da dihêne dîtin.”<sup>2</sup> Ev hevalnave wekî hevalnavên dî yên çewayî berî navî û piştî navî dihêne bikarînan “Bi vî awayî berî navî hatin dê raveka hevalnavî çêken.”<sup>3</sup> Wek:

tertemiz su, masmavi adam.

Belê (Hevalnavên xortkîrnê wekî hevalnavên dî yên çewayî piştî navan dihên û digel nîşanên karî ristê pêk diînin û hindek caran nîşanên karî piştî hevalnavî nahêne gotin. Wek:

Sıfat	Cümle
masmavi gökyüzü	Bugün gökyüzü masmavi.
tertemiz ev	Bizim ev tertemiz <b>dir</b> ) <sup>4</sup>

Eve jî hindek riste:

“Ders, iş, spor ve eğlence ile **dopdolu** bir hayatı vardı.

Bütün vücudum **kaskatı**.

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 304.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 134.

<sup>3</sup>Hengirmen, hc.

<sup>4</sup>Hengirmen, hb., r. 134.

**Koskoca** dünyanın içinde **yapayalnız** kalmış gibiyim.”<sup>1</sup>

2. Dubarekirina hevalnavan<sup>2</sup>

Bi dubarekirina hevalnavan xortkirina hevalnavan çêdibît, wekî:

“**iri iri** karpozlar, **kara kara** gözler, **kocaman kocaman** köpekler...”<sup>3</sup>

Ew navên piştî hevalnavan tên bi awayê ko xortkirina wan hevalnavan bi hêz diêxît

3. Dubarekirina navan<sup>4</sup>

Bi dubarekirina navan hevalnav xort dibin. Wek:

“**takım takım** elbiseler      **kucak kucak** hediyeler      **çeşit çeşit** yolcular  
**öbek öbek** çalılar      **yer yer** lekeler”<sup>5</sup>

Eve jî wekî xala berê bi giştî nav di şêwê komê da dihêne bikarînan her wekî di nimûnan da diyar.

4. Înana morfîma “**mi**”<sup>6</sup> di navbera hevalnavên du bare kirî:

Her wekî di jimare (2) da hatî ku bi dûbarekirina hevalnavan hevalnav xort dibin û bi hêz dikevin, belê bi bikarînana morfîma “**mi**” di navbera hevalnavên du bare kirî dîsan careka di hevalnavî xort diken. Bo nimûne:

(temiz **mi** temiz bir kadın, güzel **mi** güzel bir kız, büyük **mü** büyük bir yılan,...)<sup>7</sup>

5. Dûbarekirina hevalnavên jêk cuda<sup>8</sup>:

Peyvên wataya wan nêzîkî êk yan jî wataya wan dijî êk, yan jî dengên wan wekî êk bi dubarekirina wan xortkirin dihête dirustkirin. Bo nimûne:

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 346.

<sup>2</sup>Banguoğlu, hb., r. 349.

<sup>3</sup>Gencan, hb., r. 191.

<sup>4</sup>Meric, hb., r. 112.

<sup>5</sup>Banguoğlu, hb., r. 349.

<sup>6</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 185.

<sup>7</sup>Demir, hb., r. 304.

<sup>8</sup>Demir, hb., r. 601.

(irili ufaklı meyveler, iri yarı bir genc, ipsiz sapsız sözler, kırık dökük bir keltuk,...)<sup>1</sup>

yan jî:

(doğru dürüst söz

yalan yanlış haber

tatsız tuzsuz yemek)<sup>2</sup>

6. Hevalnavên nişaneyî bi peyva “**işte**” dihêne xortkirin<sup>3</sup>.

Ev peyve pitir li berî hevalnavên nişaneyî dihête bikarînan û hevalnav pê dihêne xortkirin. Wek:

“**İşte** şu kitap!

**İşte** şu ev!

Senin aradığın **işte** bu adam!”<sup>4</sup>

Peyvên xortkirinê ne bitinê wekî hevalnav wekî hevalkar û nav jî dihêne bikarînan û erkê xwe dibînin (Eger wesfa navî kir hevalnave eger wesfa kerekî kir hevalkare û eger hate tewandin nav e.)<sup>5</sup> Wek:

“**Masmavi** gözleriyle etrafa baktı. (sıfat)

**Kıpkırmızı** kesildi çocuğun yüzü. (zarf)

Bahçedeki elmalar **sapsarıydı**. (isim)”<sup>6</sup>

---

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 374.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 600.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 305.

<sup>4</sup>Demir, hc.

<sup>5</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 185.

<sup>6</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 185.

## 5. Hevalnavên Navdariyê (Nav û Nîşan) (San, Unvan Sîfatlar)

Dibêjne wan peyvan hevalnavên navdariyê yê digel navên mirovan dihêne bikarînan ji bo rêzgirtin, pile, cih, niyasîn û nasnavê wan diyar diken û wekî hevalnavên çewayî dihêne bikarînan “Hevalnavên navdariyê berî, piştî, hindek caran jî hem berî û hem piştî navan dihên.”<sup>1</sup> Mebest ji hem berî û hem piştî navan ewe ku hindek ji wan peyvan li berî navî jî dihêne bikarînan û li piştî navî jî dihêne bikarînan. “Ku peyvek bibîte hevalnav pidviye berî navan bihêt.”<sup>2</sup> Ca ew hevalnavên piştî navan dihêne bikarînan erkê pêveberî werdigrît anku eger karê serekî di ristê da nebît. Ji eva serî bo me diyar dibît ku bi sê rêkan hevalnavên navdariyê dihêne bikarînan ji wan:

### 1. Hevalnavên navdariyê yê berî navî tên:

Ew peyvên weko nasnav berî navî dihêne bikarînan (**Inek Şaban, Güdük Necmi,...**)<sup>3</sup> û kortkerên (piroffisor (prof), diktora (dr)) û gelekên dî berî navan dihêne bikarînan. Wek:

“**Sayın Ayşe Işık**

**Maraşal Fevzi Çakmak**

**Bay İsmail Yücel**

**Hoca Ahmet Yesevi**

**Bayan Serpil Öztürk**

**Yüksek Mühendis Erdem Güngör**

**Prof. Dr. Cahit Kavcar**

**Sayın Cumhurbaşkanı Süleyman Demirel**

**Genel Müdür Ali Acar**

**Kraliçe Elizabeth**”<sup>4</sup>

### 2. Hevalnavên navdariyê yê piştî navî dihên:

Peyvên “Bey, Paşa”<sup>5</sup> bitinê dişên piştî navî bihêne bikarînan, peyvên dî yê piştî navî dihêne bikarînan:

“**Özgür Bey**

**Oğuz Kağan**

**Zeyneb Hala**

---

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 303.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 137.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 303.

<sup>4</sup>Hengirmen, hb., r. 138.

<sup>5</sup>Hengirmen, hb., r. 138.

Filiz **Hanım**                      Şehriban **Hatun**                      Fatma **Nine**  
Hasan **Efendi**                      Mete **Han**                      Ali **Amca**  
Fevzi Çekmak **Paşa**    Babür **Şah**                      Ahmet **Dede**”<sup>1</sup>

3. Hevalnavên navdariyê yên berî navî û piştî navî dihên:

Gelek ji hevalnavên navdariyê li gorî cihê berî navî yan jî piştî navî dihêne bikarînan. Wek:

“Nesrettin **Hoca**                      Orhan **Gazi**                      Hasan **Çavuş**  
**Hoca** Nesrettin                      **Gazi** Orhan                      **Çavuş** Hasan”<sup>2</sup>

## **6. Bikarînana Hevalnavan li Cihê Navî (Sıfatların Ad Yerine Kullanılması)**

Her wekî di xalên bûrî da jî amaje pê hatiye kirin eger hevalnavî nîşane wergirtin wekî nîşanên kom, nîşanên tewandinê û nîşanên xweyîbûnê (xawenderetiyê)...htd, dê weko nav erkê xwe gêrît di ristê da. Li bin vî ser navî dê behsê bikarînana hevalnavî weko navî keyn di ristan da “Hevalnav demê girêdayî navî bin û ji navan vebîn bi tena serê xwe man dişê nîşanên xawendarêtiyê, komê û tiyan werbgirît belê wî demî dê ji hevalnavî derkevît û çîte di nava celebên navî da.”<sup>3</sup> Mebest ji derkeftina hevalnavî ewe ku dê ji erkê hevalnavî kevît û dê taybetmendiyên navî wergirît û wekî navî dê hête bikarînan di ristan da. Bo nimûne:

“Karşuya geçerken **büyük** öğrenciler, **küçük** öğrencilerin elinden tutsun.”<sup>4</sup>

Di vî ristê da peyvên (**büyük, küçük**) hevalnav in wesfa navên (öğrenci) kirîne. Lê belê her ev riste eger bi vî rengî bihête nivîsîn “Karşuya geçerken **büyükler, küçüklerin** elerinden tutsun.”<sup>5</sup> Peyvên (**büyükler, küçükler**) nav in, ne hevalnav in çonkî êk ji nîşanên navî yên wergirtin ew jî nîşana komê (**ler**) û weko nav erkê xwe di ristê da dibînin.

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r. 138.

<sup>2</sup>Hengirmen, hc.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 366.

<sup>4</sup>Demir, hb., r. 309

<sup>5</sup>Demir, hc.

Di rista “**Tatlı** sözlerle beni kandırdı.”<sup>1</sup> Peyva (tatlı) hevalnave çonkî wesfa navekî ya kirî, belê di rissta “**Maviyi** sevmem, **yeşili** severim.”<sup>2</sup> Peyvên (**Maviyi**, **yeşili**) nav in, çonkî êk ji nîşanên navî yên wergirtin ku ew jî hatîne kêşandin yan tewandin û wekî navî erkê xwe di ristê da yên gêray. Belê ew erkê nav di ristê da dibînît dema hevalnav wekî navî dihête bikarînan heman erkên navî dibînît. Bo nimûne:

(1. Biker:

“**büyük** buyurur, **küçük** yapar”

Peyvên (**büyük**, **küçük**) nav in erkê bikerî gêrayne. Belê çî nîşanên navî wernegirtîne weko navekê giştî hatîne bikarînan.

2. Berkar:

“**Yaramazı** gördünüz mü? ”

3. Di raveka navî da di bîte timamkrî:

(**Çalışkanın** notu, **binin** yarısı...)

4. Di raveka navî da di bîte timamker:

(Sınıfın **çalışkanı**, dünya **güzeli**,...)

5. Dibête pêveber di ristê da.

Dema nîşanên karî wergirtin yan jî piştî navî hat dê ristê dirust ket ca çî nîşanên karî diyar bin yan jî diyar ne bin dê erkê pêveberî bînît:

(Pek **naziksiniz**, Orhan **beşincidir**...) <sup>3</sup>

## 7. Erkê Hevalnavî di Ristê da (Cümle İçinde Sıfatın Görevleri)

Di xala berê da behsê bikarînana hevalnavî weko nav hate kirin, di vê xalê da erkê hevalnav weko hevalnav ka çî erkan di diristê da digêrît:

---

<sup>1</sup>Meric, hb., r. 106.

<sup>2</sup>Meric, hb., r. 113.

<sup>3</sup>Bk., Gencan, r. 190.

## 1. Diyarkeyê navî:

Her weko berê jî amaje pê hatiye kirin hevalnav di zimanê tirkî da her dem li berî navî dihêne bikarînan. Dema hevalnav û nav pêkve bihên raveka hevalnavî pêk diînin ku ew jî diyarkirî û diyarker in yê berê diyarkirî û yê dîv ra diyarker anku hevalnav diyarkirî û nav diyarker. Nnav parça bineretiye di raveka hevalnavî da. Wek:

**kara tavuk, , şu yollar, üç çocuk...**"

Raveka hevalnavî weko navek jî di ristê da dihête bikarînan "Ev wesfandine weku navan dibine kom, dihêne tewandin, cihnavên likandî jî werdigirin. Eve wê digehînit ew nîşanên dihêne dumahîka navan dihêne ser raveka hevalnavî:

yanlış hesaplar eski dostum bu arsaya hangi gözde...."<sup>1</sup>

Di van nimûnên serî da parçeyên reştir hatîne nivîsîn nîşanên navî e di zimanê tirkî da û raveka heval navî ev nîşan e wergirtîne. "Di ravekeka hevalnavî da, di pêkînana ravekeka dî ya hevalnavî da pişka hevalnavî yan jî nav dişêt bikevîte nav."<sup>2</sup> Wek:

"üç günlük / siyah bir ekmek parçası

üç / günlük: sıfat tamlaması

siyah / bir ekmek parçası: sıfat tamlaması

bir / ekmek parçası: sıfat tamlaması

ekmek / parçası: isim tamlaması"<sup>3</sup>

Her weko ya diyar di ravekeka hevalnavî da em dişêyn ravekan di nav wê ravekê da çêbikeyn wekî di nimûna serî da ku (3) ravek di ravekeka hevalnavî da hatîne dirustkirin. "Belê ravekên hevalnavî wekî navî hevalnav paşgirî wergirî yan jî di erkê hevalnavî da wekî navek bikevîte berî navekê dîtir careka dî dibîte hevalnav:

---

<sup>1</sup>Banguoğlu, hb., r. 343.

<sup>2</sup>Karahan, hb., r. 51.

<sup>3</sup>Karahan, hc.

uzun etek / uzun etekli kız, kumral saç / kumral saçlı çocuk,...”<sup>1</sup> Eve ji layekî ve û ji layekê dî ve (hindek nav ewên tişt jê dihêne dirustkirin weko hevalnav dihêne bikarînan û raveka hevalnavî dirust diken:

**demir** kapı **altın** kalem **gümüş** şekerlik...)<sup>2</sup>

Her navek dişê bi çend hevalnavan bihête timamkirin anku navek dişê çend hevalnavekan li dîv êk ra werbigrît û di navbera her êk ji wan hevalnavan (**vîrgîl**)<sup>3</sup> dihête bikarînan û berî hevalnavê dumahîkê amrazê lêkdanê (**ve**) dihête bikarînan. Wek:

“**uslu, terbiyeli, genç ve bilgili** bir adam.”<sup>4</sup>

Eger hevalnavên diyarker jî bêne bikarînan digel hevalnavên çewayî bo timamkirina navekê dê hevalnavê diyarker kevîte berî hevalnavê çewayî. Wek:

(**şu** büyük bahçe, **her** yiğit asker, **karşıdaki** kırmızı ev...)<sup>5</sup>

Hevalnavek dişê wesfa çend navekan biket di ristê da. Wek:

“Bize **taze meyveler, sebzeler** getirirdi her seferinde”<sup>6</sup>

sıfat isim isim

Her wesan çend hevalnavek dişên wesfa çend navekan biketin. Wek:

“**Bakımlı, geniş caddeler, bulvarlar** hemen dikkatimizi çekmişti.”<sup>7</sup>

sıfat sıfat isim isi

Ji layê hêzê ve hêz dikevî te ser hevalnavî “Di raveka hevalnavî da hêz herdem ya li ser hevalnavî yan hevalnavan:

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 347.

<sup>2</sup>Banguoğlu, hb., r. 343.

<sup>3</sup>Gencan, hb., r. 186.

<sup>4</sup>Gencan, hc.

<sup>5</sup>Gencan, hc.

<sup>6</sup>Demir, hb., r. 308

<sup>7</sup>Demir, hb., r. 309.



son soru, **temiz** su, **ince** ve **zeki** adam, **tatlı** ve **solu** meyveler,...”<sup>1</sup>

2. hevalnav dibête pêveber: Vegeryan bo babetê bikarîna hevalnavî weko nav jimare (5) lapere (106).

## 8. Hevalnavên Karî (Sıfat-Filler, Ortaçlar)

Hevalnavên karî weko ji navî diyar ew kar in yên weko hevalnavî têne bikarînan. “Bikarîna karî wekî hevalnavî dibêjnê hevalnavên karî.”<sup>2</sup> Ev hevalnavên karî ji regên karî dihêne dirustkirin ku dumahîk birga karî jê dihête rakirin anku nîşanên (**mak-mek**) û bi ser ve berdana hindêk paşgirên taybet dihêne dirustkirin. Hevalnav ji ber ku ji xaneya navîne di heman dem da hev beşiyeka wan ya hey ku wekî navî cihnavên likandî, nîşanên komê û nîşanên duxê tiyan werdigrin. Hevalnavên karî dema berî navî dihêne bikarînan erkê hevalnavî digêrin û dema girêday navên piştî xwe nebin û digel bikarîna wan nîşanên di erkê navî dane, ji ber vê çendê hevalnavên karî ji hevalnavên dîtir taybetmendiyên cuda nîşan diden, hevalnavên karî li gorî demî dabeşî sêyan dibin:

### 2. 9. 1. Hevalnavên Karê Borî (Geçmiş Sıfat Fiilleri)

Ev hevalnave bi ser ve berdana paşgirên “**-dik, -miş**”<sup>3</sup> dihête dirustkirin ku ev paşgir e jî digel dengên bizwên yên regên karî xwe digoncînin “**-miş (-miş, -muş, -müş), -dık (-dik, -duk, -dük)**”.<sup>4</sup>

#### Paşgirê **-dık (-dik, -duk, -dük)**:

Ev paşgire di şewê erê da bi kêmî dihête bikarînan. Wek:

“**Tandık** insanlar, **Bidik** konu”<sup>5</sup>

“Yabancı ülkelerde **tandık** yüzler, insana daha sıcak görünür.”<sup>6</sup>

---

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 309.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 251.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 460.

<sup>4</sup>Hengirmen, hb., r. 253-254.

<sup>5</sup>Meriç, hb., r. 155.

<sup>6</sup>Demir, hb., r. 460.

Ev hevalnav e bara pitir di şêwê nerê da û bi nîşanê nerê “-ma (-me)”<sup>1</sup> dihêne bikarînan.

“**tanımadık** kadın, **bilmedik** biri, **okunmadık** kitap”<sup>2</sup>

“**Olmadık** yerde karşıma çıkıyordu”<sup>3</sup>

“Yar yoluna **dökülmedik** dilleri neyleyim.

Derdine derman bulmak için **çalmadık** kapı bırakmadı.”<sup>4</sup>

Hevalnavên karî ewên bi paşgirê (-**dık**) dihêne dirustkirin di raveka hevalnavî da cihnavên likandî werdigrin û navê piştî têt çi nîşanan wernegirît dê di ristê da erkê bikerî bînin. Wek:

“**Yazdığım** hikâye benden ziyade sevdiğim insanların hayatına aitti.”<sup>5</sup>

Belê eger di raveka hevalnavî da navî nîşan wergirt dê erkê berkarî bînin. Wek:

“Evimize ilk **geldiği** akşamı hatırlıyorm

Ben de anama gösteririm **öldürdüğüm** yılımı.”<sup>6</sup>

**Paşgirê -mış (-miş, -muş, -müş):**

Ev paşgir e “Hem dişêt bihête ser karên têper hem jî têneper belê pêkînana hevalnavan digel karên têneper û veğerandî û karên ne çalak pitir ber belav in”<sup>7</sup>  
Anku ev paşgir e bara pitir digel karên têneper dihêne bikarînan û ber belavtir in.

---

<sup>1</sup>Hengirmen, hb., r. 253.

<sup>2</sup>Hengirmen, hc.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 786.

<sup>4</sup>Demir, hb., r. 460.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 786.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 877.

<sup>7</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 795.

## 1. Geçişli Fiillerle (Digel Karên Têper):

Ew jî regê karî ji çawigî dihête wergirtin. Wek:

“okumuş kimse, pişmiş aş, görmüş adam,...”<sup>1</sup>

“yazılmış mektupları bana getirin.

Bana söylenmiş sözler değil, hiç söylenmemiş sözler söyle.”<sup>2</sup>

Paşgirê (-miş) bi nîşana nerê (-ma, -me) dihête nerêkirin û dikevîte ser regê karî û paşan paşgirê (-miş) dîv ra dihêt û peyvê dikete şêwê nerê. Wek:

“ukumamış kimse, pişmemiş aş, görmemiş adam,...vb”<sup>3</sup>

“Okunmamış kitapları okumak için zaman ayıralım.”<sup>4</sup>

## 2. Geçişsiz Fiillerle (Digel Karê Têneper):

Ev beşe yê cudaye ji beşê berê çonkî “Yên kevne di nav vî gorupî, digel reg yan jî yên bi regê karên têneper dihêne hijmartin, paşgirên +Ar-, -Aş-, -Iş-/-Uş-, -n- û -II-/-Ul- vegerandinê yan jî yên neçalak karî dirust diken.”<sup>5</sup>

2. 1. paşgirên digel karî (-ş-, -Iş-/-Uş-, + Ar):

“gelişmiş güzeliğini, koyulaşmış yeşil gözleri, kızarmış domatesi, çiçekleşmiş bir mantardı, kokuşmuş bir batağın”<sup>6</sup>

2. 2. paşgirê -n-:

“bağlanmış bir ip, sulanmış toprak”<sup>7</sup>

---

<sup>1</sup>Banguoğlu, hb., r. 272

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 254.

<sup>3</sup>Banguoğlu, hb., r.272.

<sup>4</sup>Hengirmen, hb., r. 254.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 795.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 796-797.

<sup>7</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 797.

2.3. pařgirê -II-/-UI-:

“örtölmüş kapaklar, **durulmuş** yataklar, **alıřılmış** şeyler, **kemirilmiş** dallar, **bükölmüş** bir gazete,...”<sup>1</sup>

## 2. 9. 2. Hevalnavên Karê Niha (řimdiki Zaman Sıfat Fiilleri)

Ev hevalnave bi harîkariya sê pařgirên jêk cuda dihêne dirustkirin, dikevne ser regên karî çî têper çî têneper bin ew jî pařgirên:

“-ar (-er, -ır, -ir, -ur, -ür)

-an (-en)

-ıcı (-ici, -ucu, -ücü”<sup>2</sup>

**Pařgirê -ar (-er, -ır, -ir, -ur, -ür):**

“**akar** su **yenir** ayva **olur** iş **güler** yüz **görür** göz **anlaşılır** sebep...”<sup>3</sup>

Ev curê hevalnavan bi nîřana (-maz (-mez)) dihête nerêkirin ku dikevîte dûmahîka regê karî. Wek: “**tüken-mez** kalem”<sup>4</sup>

“Erken uyanmak için **çalar** saati kurdum.

**Güler** yüzlü insanları herkes sever.

Çalışırsınız **bitmez** iş olmaz.”<sup>5</sup>

**Pařgirê -an (-en):**

“**gel-en** otobüs **yat-an** aslan”<sup>6</sup>

“Dedikodu **yapmayan** insanlar, **sevilen** insanlardır.”<sup>7</sup>

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 798.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 251.

<sup>3</sup>Banguođlu, hb., r.260.

<sup>4</sup>A. Necip Hatibođlu, hb., r. 144.

<sup>5</sup>Hengirmen, hb., r. 252.

<sup>6</sup>A. Necip Hatibođlu, hb., r. 144.

<sup>7</sup>Hengirmen, hb., r. 252.

“**Bekleyen** derviş muradına ermiş”<sup>1</sup>

Bi nîşanê (**-ma (-me)**) dihête nerêkirin û dikevîte piştî regê karî paşan paşgirê hevalnav çêker li dîv ra dihêtin. Wek:

“Gördüklerimiz azdır, **görünmeyen** şeyler daha çoktur.”<sup>2</sup>

**Paşgirê -ıcı (-ici, -ucu, -ücü):**

“**üzücü** haber **yyıyıcı** adam **yırtıcı** hayvan **gezici** öğretmen,...”<sup>3</sup>

“Size **sevindirici** haberlerim var.

Sizlere **üzücü** haberler vermek istemem.”<sup>4</sup>

### 2. 9. 3. Hevalnavên Karên Neborî (Gelecek Sıfat Fiilleri)

Ev hevalnave bi zêdekirina paşgirên “**-ecek, -esî**”<sup>5</sup> dihêne dirustkirin û dikevne ser regên karî:

**Paşgirê -ecek(-acak):**

(Hevalnavên karî yên bi paşgirê **-AcAk** dirust dibin dema dihêt û kevîte ser karekî livînekê diêxîte di barê hevalnavekî da û lêkdana wê digel navekî raveka hevalnavî dirust diketin û di ristê da erkê timamkerî digêrîtin.)<sup>6</sup> Dirustkirina wan. Wek:

“**yatacak** yer **ıçecek** su **kaçacak** delik **yapacak** iş...”<sup>7</sup>

“Sınavda **uygulanacak** kuralları açıklıyorum.

Bunları **görecek** göz gerekir”<sup>8</sup>

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 462.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 252.

<sup>3</sup>Banguoğlu, hb., r. 425.

<sup>4</sup>Hengirmen, hb., r.252.

<sup>5</sup>Demir, hb., r. 461.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 828.

<sup>7</sup>Banguoğlu, hb., r. 426.

<sup>8</sup>Demir, hb., r. 461.

Her wesan (Hevalnavên karî yên bi **-ecek** dihêne dirustkirin cihnavên likandî werdigirin.)<sup>1</sup>

“**Evleneceğim** erkek sensin.

**Alacağım** sözlük bu mu?”<sup>2</sup>

Ev paşgire dema kefte ser regê karî û kefte berî navî her du pêkve di ristê da dewrê bikerî dibînin.<sup>3</sup>

“On beş sene evvelki gibi daha **konusacak sözler** bitmemişti.”<sup>4</sup>

Her wesan paşgirê (-AcAk) dema dikevîte ser regên karê têper û bikevîte berî navekî pêkve raveka hevalnavî dirust diken, çi sade yan jî di timamkirnê da nav nîşanan werbigrît di ristê da dê dewrê berkarî bînît.<sup>5</sup>

“Otelciye **gidilecek yer** sordum”<sup>6</sup>

Ev hevalnav e bi nîşanê (**-ma (-me)**) dihête nerêkirin û dikevîte navbera regê karî û paşgirê **-ecek**. Wek:

“Yeterki sen çalış **çözülemez** soru yuktur, dedi.

**Olmayacak** duaya amin denmez.”<sup>7</sup>

---

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 461.

<sup>2</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r. 263.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 830.

<sup>4</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r.831.

<sup>5</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 831.

<sup>6</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 831.

<sup>7</sup>Demir, hb., r. 461.

**PIŞKA SÊYÊ**  
**HEMBERKIRINA HEVALNAVÎ DI NAVBERA ZIMANÊ**  
**KURDÎ KURMANCIYA SERÎ Û TIRKÎ DA**

## **PIŞKA SÊYÊ**

### **HEMBERKIRINA HEVALNAVÎ DI NAVBERA ZIMANÊ KURDÎ KURMANCIYA SERÎ Û TIRKÎ DA**

Di vî beşî da layenên hemberkirina hevalnavî ji layê wekhevî û cudahiyan ve hatîne berçavkirin, ew ên li pişkên (1, 2) hatîne behskirin. Di her du zimanan da li gorî wan xalan û wan nimûnan yê di her du pişkan da bi kar hatî.





## 1. Pênaseyên Hevalnavî di Kurdî û Tirkî da

Ji layê zaravî ve di her du zimanan da bi giştî cudahiyeke dihête dîtin ji layê jimara zaravan ve, di zimanê kurdî devoka behdînî da zaravê (hevalnav) dihête bikarînan û di zimanê tirkî da zaravên (sîfat) , (ön ad – önad)

Pênase: Hevalnav di zimanê kurdî da wesf û pesna navekî yan cihnavekî diketin. Hevalnav pidviye digel navekî yan cihnavekî da bihête bikarînan heta ku weko hevalnav erkê xwe bibînît. Bo nimûne:

(qesra **spî**, çiyayê **bilind**, ewê **zîrek**, ezê **hejar**, qotabiyê **pêncê**, diyariya **çewan**,...hwd).

Belê di zimanê tirkî da wesf û pesna navî diketin, wesfa cinavî naketin. Hevalnav pidviye her dem digel navekî bihête bikarînan. Bo nimûne:

(**yeşil** ağaç, **aç** insan, **süzme** bal, **bu** ağaç, **iki** dağ, **kaç** öğrenci,...vb)<sup>1</sup>.

Ji layê bikarînanê ve hevalnav di zimanê kurdî da bigiştî piştî navan yan cihnavan dihêne bikarînan bi harîkariya amrazên palvedanê (a, ê, ên-êd-êt). Wek:

“xwendekarê **jêhatî**, xwendekara **jêhatî**, xwendekarên **(êd-êt) jêhatî**, ewa ciwan,...htd.↓

amraz

amraz

amraz

riste: “Gula **sor** ji destê min keft.”

↓  
amraz

Hevalnav di zimanê tirkî da herdem berî navî dihête bikarînan bêy ku amrazek bikevîte di navbera hevalnavî û navî da. Wek:

(**ince** parmak, **yuvarlak** masa, **beyaz** göz,...vb)<sup>2</sup>.

Riste: “**Beyaz**, **yuvarlak**, **temiz** bir masada akşam yemeğini yedik.”<sup>3</sup>

<sup>1</sup>Kolcu, hb., r. 144.

<sup>2</sup>Kolcu, hc.

<sup>3</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 176.

## 2. Cureyên Hevalnavan ji Layê Hebûnê ve

Curên hevalnavan di her du zimanan da weko êk in, dabeşî ser du beşan dibin ku ew jî ji layê (watayê) û ya dîjî ji layê (binyadê) ve,

### 2. 1. Hevalnav ji Layê Watayê ve

Hevalnav ji layê watayê ve di navbera her du zimanan da cudahî diyar dibît, weko vî xiştê li xarê:

zimanê kurdî	zimanê tirkî
1. hevalnavên çewayî	1. niteleme sıfatları
	2. belirtme sıfatları
2. hevalnavên nîşaneyî	2. 1. işaret (gösterme) sıfatları
3. hevalnavên pirsyariyê	2. 2. soru sıfatları
4. hevalnavên nediyariyê	2. 3. belgisiz sıfatları
5. hevalnavên jimareyî	2. 4. sayı sıfatları
6. hevalnavên rêjeyî	
7. hevalnavên karî	

Hevalnav ji layê watayê ve di zimanê kurdî da dabeşî ser heft curên ser bexwe bûne lê belê di zimanê tirkî da ji layê watayê ve dabeşî ser du curan bûye, paşî curê duyê dabeşî ser çar beşan bûye ku ew jî (hevalnavên rêjeyî) weko babetekê ser bexwe ku sernav bo hatibîte danan nîne. Lê belê (hevalnavên karî) weko babetekê ser bexwe cuda ji curên hevalnavî ji layê watayê ve hatiye bikarînan.

#### 2. 1. 1. Hevalnavên Çewayî

Hevalnavên çewayî di zimanê kurdî da wesf, pesn, çewayî û xasyetên navî û cihnavî diket, wekî: (reng, kêmasî, araste, sîfet, nîşan, şêwe û qebare, tam,...hwd).  
Wek:

(sêva **sor**, korê **zîrek**, mirovên (êd-êt) **zîrek**, ezê **hejar**,...hwd.)

Hevalnavên çewayî di kurdî da dibine bersiv bo peyva pirsyarî (**çewa**). Wek:

Te sêveka çewa xar?            Min sêveka **sor** xar.

Hevalnavên çewayî di zimanê tirkî da wesf, pesn, çewayî û xasyetên navî diket. Wek: (reng, kêmasî, araste, sîfet, nîşan, şewe û qebare, tam,...hwd.) Wek:

(**yeşil** ağaç, **çalışkan** çocuk, **geniş** ev, kötü adam,...vb.)<sup>1</sup>

Hevalnavên çewayî di tirkî da bi bersivdana peyva “**nasıl**” diyar dibin. Wek:

(**Nasıl** ağaç?            **Yeşil** ağaç.

**Nasıl** ev?            **Geniş** ev.)<sup>2</sup>

Hevalnavên çewayî di kurdî da bi giştî piştî navan yan cihnavan dihên û biharîkariya amrazên palvedanê ku ew jî amrazên (**a, ê, ên-êd-êt**) in ku ew jî nav li dîv regezî van amrazan werdigrîtin.

Hevalnavên çewayî di tirkî da hergav berî navî dihêne bikarînan û bêy ku amrazek bihête bikarînan. Bo nimûne:

Kurdî

Tirkî

Kiça **ciwan**

**güzel** kız

Korê **baş**

**iyi** erkek

Mirovên (êd-êt) **qelew**

**Şişman** insanlar

Nav	Amraz	Hevalnavên çewayî	Hevalnavên çewayî	Nav	Nîşana komê
Kiç	A	Ciwan	Güzel	Kız	
Kor	Ê	Baş	İyi	Erkek	
Mirov	ên(êd-êt)	Qelew	Şişman	İnsan	lar

<sup>1</sup>Hatiboğlu, hb., r. 127.

<sup>2</sup>Hatiboğlu, hc.

Di kurdî da çêdibît hindek caran jî hevalnav berî navan bihêne bikarînan wî demî pêdvî bi amrazan naket. Wek:

“hindî sipehî ye to xo dibêjî **sor** gul e.”

Di tirkîyê da hindek caran jî hevalnavên çewayî di bikarînana helbestê da piştî navî dihêne bikarînan. Wek:

“Bir şarkısın sen **ömür boyu sürece**”

Di tirkîyê da heke hevalnavên çewayî kefte piştî navî çî kar di ristêda bîtin yan jî ew nîşanên kar werdigirtin hatibine bikarînan yan jî nehatibine bikarînan dê wî demî riste dihête dirustkirin. Wek:

Ev **büyük**. Ev **büyük**tür. → nîşana karî

Her wesan hevalnavên çewayî di kurdî da nîşanên pileya (berawirdiyê (tir) û bala (tirîn)) werdigirin. Wek: (baştir, baştirîn).

Di tirkî da nîşanên pileyên (berawirdiyê û bala wernagirin.

Hevalnavên çewayî di kurdî û tirkî da şêwê gerdankirî (cihnavên nisandî) werdigirin. Wek:

ciwan <b>im</b>	ciwan <b>în-in</b>	güzelim	güzeliz
ciwan <b>î</b>	ciwan <b>in</b>	güzelsin	güzelsiniz
ciwan <b>e</b>	ciwan <b>in</b>	güzeldir	güzeller

Ew peyvên dibine hevalnavên çewayî di kurdî da eger wesfa kiryarekê kir dê bîte hevalkar û eger nîşanên navî wergirtin dê wekî nav erkê xwe bînît. Wek:

Kiça **ciwan** hat. **Ciwanê** mal paqij kir. Nazdarê mal **ciwan** paqij kir.

Healnav Nav Hevalkar

Ew peyvên dibine hevalnavên çewayî di tirkî da, eger wesfa kiryarekê kir dê bîte hevalkar û eger nîşanên navî wergirtin dê wekî nav erkê xwe bînît. Wek:

**Tatlı** sözlerle beni kandırdı. **Tatlıyı** çok severim. Benimle **tatlı** konuştu.

Sıfat

İsim

Zarf

Hindek ji rêzimanzan û zimanzanên tirk hevalnavên (biçûkkirnê, xortkîrnê, pileyên hevalnavî û hevalnavên navdariyê) diêxine jêr hevalnavên çewayî.

## 2. 1. 2. Hevalnavên Nîşaneyî

Di her du zimanan da hevalnavên nîşaneyî ew hevalnav in yên bi rêka destnîşankirinê navan dene diyarkirin.

Peyvên dibine hevalnavên nîşaneyî di zimanê kurdî da bi giştî ji van her du hevalnavên nîşaneyî pêk dihên ku ew jî “ev, ew” in.

Hevalnavê nîşaneyî (ev), ligel navên nêr û mê yên kitê nêzîk bi kar dihên.

Wek:

Ev kor xandevan e.

Ev kiç xandevan e.

Hevalnavê nîşaneyî (ew) ligel navên nêr û mê yên kitê dûr bi kar dihên. Wek:

Ew kor xandevan e.

Ev kiç xandevan e.

Ew peyvên di zimanê tirkî da dibine hevalnavên nîşaneyî peyvên (**bu, şu, o**) ne belê ev hevalnavên nîşaneyî bo her du regezan û kit û kom dihêne bikarînan.

Wek:

Bu → ligel navên nêr û mê yên kit û kom yên nêzîk dihêne bikarînan. Wek:

“**Bu** çocuk sınıfın en çalışkan öğrencisidir.

Yarın gelerseniz size **bu** kitapların hepsini vereceğim.

Şu → ligel navên nêr û mê yên kit û kom yên pîçek dûr dihêne bikarînan.

**Şu** çocuğu tanıyor musun?

Polisler, **şu** hırsızları bir türlü yakalayamadılar.

O → ligel navên nêr û mê yên kit û kom yên dûr dihêne bikarînan.

O adam eskiden çok iyi spor yapardı.

O adamlar eskiden çok iyi spor yaparlardı.”<sup>1</sup>

Belê ji berko di kurmancî da navî nîşanên regezî yên taybet bi xwe ve yên heyn, ji ber vê jî li dîv regezên navî (nêr, mê) jimara navî (kit, kom) û dûrî û nêzîkiya wan, hevalnavên nîşaneyî (ev, ew) dihêne tewandin. Li dîv vî xiştê li xarê:

	ligel navên nêr û mê yên kit û kom yên nêzîk				ligel navên nêr û mê yên kit û kom yên dûr			
	Nêrê kit	Mêyê kit	Nêr û Mêyê kit	Nêr û Mêyê kom	Nêrê kit	Mêyê kit	Nêr û Mêyê kit	Nêr û Mêyê kom
Hevalnavên nîşaneyî	Evî – vî ...î,	Evê – vê ...ê,	Ev, Ev ...e	Evan – van ...an,	...êhe, Wî ...êhe	Ewê – wê ...ê, Ew...ahe, Wê	Ew	Ewan – wan ...an, Ew ...êhe, Wan ..... êhe

Peyvên (öteki, beriki, öyle, böyle, şöyle, karşı, öbür, oradaki, şuradaki, buradaki, aşağı, yukarı...hwd.) wekî hevalnavên nîşaneyî dihêne bikarînan, her wesan hevalnavên nîşaneyî çî nîşanên rêzimanî wernagirin ji ber vê nav nîşanê komê werdigrîtin wekî:

“**Bu** arabalar bir harika.”<sup>2</sup>

hevalnav

<sup>1</sup>Hengirmen, r. 139.

<sup>2</sup>Gülsün, hb., r. 280.

Belê eger nîşanên rêzimanî wergirtin dêbine cihnavên nîşaneyî. Wek:

“**Bunlar** bir harika.”<sup>1</sup> cihnav

Her wesan morfîmên darêjtinê (-ki, -deki) demê dikevne dumahîka navî cihî diyar diken û weko hevalnavên nîşaneyî rolê xwe dibînin. Wek: (sokaktaki çöp).

Peyva “işte” weko hevalnavê nîşaneyî dihête bikarînan. Wek:

“**işte** şu bahçe, **işte** bu adam...”<sup>2</sup>

Peyvên ku cihî û arastey diyar diken wekî hevalnav dihêne bikarînan. Wek: “ön”, “arka”, “üst”, “alt”, “iç”, “yan”, “karşı”, “bitişik”, “orta”, “ara”, “sağ”, “sol”

“Kasaba **karşı** sırtın **öbür** tarafındaydı.”

Ji xasyet û taybetmendiyên hevalnavên nîşaneyî di zimanê kurdî da ew e ku herdem li berî navî dihêne bikarînan, ca çî li destpêka ristê yan nîveka ristê bihên. Wek:

**Vê** zeriye pirça xwe şeker. → li destpêka ristê

Mamostay gote **vî** korî derkeve. → li nîveka ristê

Di zimanê tirkî da jî hevalnavên nîşaneyî herdem li berî navî dihêne bikarînan çî di destpêkê da çî di nîvekê da bin. Wek:

“**Şu** korkuluk gibi dimdik duran herif mi paşa. → li destpêka ristê

Küçük sultan açık saçık / uyur diye geceleri

Kapatılmış **şu** ufacık / odasının her bir yeri.”<sup>3</sup> → li nîveka ristê

Hevalnavên nîşaneyî di zimanê kurdî da dema wesfa navekî biket dibine hevalnavên nîşaneyî belê demê li cihê navekî hatin dibine cihnavên nîşaneyî. Bo nimûne:

**Evan** kiçan mal paqij kir. → Hevalnavê nîşaneyî

<sup>1</sup>Gülsün, hb., r. 280.

<sup>2</sup>Gencan, hb., r. 173.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 375-376.

**Evan** mal paqij kir. → Cihnavê nîşaneyî

Di zimanê tirkî da jî wekî zimanê kurdî ye eger ew navê li piştî hevalnavê nîşaneyî rabibît hevalnavê nîşaneyî dêbine cihnavên nîşaneyî. Wek:

“**Bu** arabanın fiyatı yüksek. → Hevalnavê nîşaneyî

**Bunun** fiyatı yüksek.”<sup>1</sup> → Cihnavê nîşaneyî

Hevalnavên nîşaneyî di zimanê kurdî da dibine bersiva peyva pirs “**kîj(k)**”. Wek:

Te **kîj** gol divêt? Min **ev** gole divêt.

Peyva pirsyarî (**hangî**) dema di ristê da pirsyar ji navekî kir bersiva wê dê bi hevalnavê nîşaneyî hête dan. Wek:

“**Hangî** çocuk senin kardeşin? **Bu** çocuk benim kardeşim.”<sup>2</sup>

### 2. 1. 3. Hevalnavên Pirsyariyê

Di her du zimanan da pêname wekî êk in ku ew jî bi rêka peyvên pirs pirsyarê ji navekî diken û li dûmahîka her risteyekê nîşana pirsyarî (?) dihête danan.

Ew peyvên dibine hevalnavên pirs di kurmançî da ev in (kîj – kîjk, kîjan, çi, çewa – çewan, çiqas, çend, çendemîn, yê çendemîn).

Peyvên dibine hevalnavên pirsyarî di zimanê tirkî da bi giştî even e (**kaç, kaçar, kaçınıcı, hangî, ne, nasıl, ne kadar, nice, ne gibi, ne biçim, ne türlü, neden, neredekî**).

Wekî ku diyar dibît jimara peyvên dibine hevalnavên pirsyarî di zimanê tirkî da pitirin ji yên kurdî.

Hevalnavên pirsyariyê di zimanê kurdî da li berî navî û piştî navî dihêne bikarînan. Wek:

To li pola **çendê yî**? → piştî navî

---

<sup>1</sup>Gülsün, hb., r. 280.

<sup>2</sup>Gülsün, hb., r. 278.



Wî **çend** sêv xarin? → berî navî

Di zimanê tirkî da hevalnavên pirsyarî hem li berî navî hem jî li piştî navî dihêne bikarînan. Wek:

“Ormanın **ne kadarı** yanmış? → piştî navî

**Hangi** dosyayı istiyorsunuz?”<sup>1</sup> → berî navî

Hevalnavên pirsyariyê di zimanê kurdî da dema berî navî bihên pêdvî amrazên palvedanê nîn e. Wek:

Te **kîj** beran girt?

Belê eger nav li berî hevalnavên pirsyarî hatin nav dê amrazên palvedanê (a, ê, ên (êd-êt) wergirîtin. Bo nimûne:

Ew pertoka **çendê**ye to dixînî?

Di zimanê tirkî da li gel hevalnavên pirsyarî nav amrazan wernagirî.

Di her du zimanan da peyvên pirs dema wesfa navekî biken dibine hevalnavên pirsyariyê û dema li cihê navekî bihên dibine cihnavên pirs û dema wesfa kiryarekê biken dibine hevalkarên pirs. Bo nimûne:

kurdî

tirkî

Te beranekê **çewa** kirî? “Ne ağlarsın benim zülfü siyahım? Hevalnavê pirs

**Kî** hat? Ne gün döneceksin eve? Cihnavê pirs

To **çewa** hatî? Ne aldın arabadan? ”<sup>2</sup> Hevalkarê pirs

#### 2. 1. 4. Hevalnavên Nedyariyê

Di her du zimanan da hevalnavên nediyar navan bi şêweyekê nediyar û nepenî didene diyarkirin.

<sup>1</sup>Gülsün, hb., r. 287-288.

<sup>2</sup>Seylan - Çelikbağ, hb., r. 204.

Ji layê rêjeya bikarînanê ve hevalnavên nediyar di her du zimanan da jimareka zor bikar tên, wekhevîyek ya di jimaran da hey.

Hevalnavên nediyar di zimanê kurdî da bara pitir li berî navan dihêne bikarînan û amrazên palvedanê wernagirin. Bo nimûne:

**Her** berek li cihê xwe yê bi qedr e.

Wî **birek** pez firot.

Di zimanê tirkî da hevalnavên nediyar berî navan dihêne bikarînan û amrazan wernagirin. Bo nimûne:

**Bir** adam dün bize geldi.

Di zimanê kurdî da hindêk ji hevalnavên nediyar piştî navan dihêne bikarînan û amrazên palvedanê bikar dihên. Bo nimûne:

Min mirovên **wesa** li bajêrî nedîtîne.

Jiyana **bitinê** geleka nexoş e.

Hindêk ji wan hevalnavên nediyar ewên li pişka tirkî da bikar hatîn dema nav piştî wan hat ew nav nabine kom. Lê belê hindêk ji wan jî ewên piştî hevalnavaên nediyar hatîn bi giştî bi kom dihêne bikarînan. Hindêk jî ji wan bi her du rengan bi kar dihênên. Wek:

**Hiçbir** zaman onu anlayamadık.

**Birtakım** insanlar dün gece olay çıkarmışlar.

**Çok** kitap okudum.

Bu sevaşlar **nice nice** ocaklar söndürdü.

Di zimanê kurdî da peyvên nediyar eger wesfa navekî kir dê bine hevalnavên nediyar û eger li cihê navekî bi kar bihên dê bine cihanvên nediyar. Wek:

**Hemî** mirovan azadî divêt. → hevalnavê nediyar

**Hemiya** azadî divêt. → cihnavê nediyar

Di zimanê tirkî da Peyvên nediyar dema wesfa navekî diken dibine hevalnavên nediyar dema li cihê navekî bihên dibine cihnavên nediyar û dema wesfa kiryarekê diken dibine hevalkarên nediyar, wekî:

“**Bir** gün size gelirim.”<sup>1</sup> → hevalnavê nediyar

“Dün okulda **biri** sizi soruyordu.”<sup>2</sup> → cihnavê nediyar

“Her şeyden **bir bir** ayrılıyorz.” → hevalkarê nediyar

Peyva “**bir**” di zimanê tirkî da dişê bi şêş erkên jêk cuda rabîtin eve jî xaleka cudaye li gel zimanê kurdî da. Wek:

Oradan **biri** gelsin. (cihnavê nediyar)

Siz **bir** kendinizi düşünürsünüz. (amrazê peywendî)

Her şeyden **bir bir** ayrılıyorz. (hevalkar)

**Bir** size **bir** bize anlatıyormus. (amrazê lêkder)

Sırada güzel **bir** araba duruyor. (hevalnavê nediyar)

Sınav **bir** saat sürecekmış.(hevalnavê jimareyî)

## 2. 1. 5. Hevalnavên Jimareyî

Ew hevalnav in yên ku ji bo hijmartina navên kesan yan jî tiştan dihêne bikarînan. Ev hevalnave berî navî dihêne bikarînan. Dema keftine berî navî dê jimare diyar ken. Wek:

Çiyay **sê** sêv kirin.

Di zimanê tirkî da pênsa hevalnavên jimareyî her heman mebestê digehînt, ewa di zimanê kurdî da gehandî.

Hevalnavên jimareyî jimare navan didete diyarkirin. Hevalnavên jimareyî

berî navî dihêne bikarînan. Wek:

“Bana **üç** soru sordu.

---

<sup>1</sup>Meric, hb., r. 108.

<sup>2</sup>Hengirmen, hb., r. 155.

Babasıyla **üç** gündür görüşemiyor.”<sup>1</sup>

Hevalnavên jimareyî ji layê dabeşkirnê ve di her du zimanan da:

zimanê kurdî	zimanê tirkî
Hevalnavên jimareyî	Sayı Sıfatları
1. Hevalnavên Jimara Bingeîn	1. Asıl Sayı Sıfatları
2. Hevalnavên Jimara Rêzîn	2. Sıra Sayı Sıfatları
2. 1. Hevalnavên Jimara Dabeşkirnê	3. Üleştirme Sayı Sıfatları
2. 2. Hevalnavên Jimara Şikestî	4. Kesir Sayı Sıfatları
2. 3. Hevalnavên Jimara Piçjimar	
	5. Topluluk Sayı Sıfatları

Hevalnavên jimareyî di zimanê kurdî da dabeşî du beşên serekî dibin, paşan beşê duyê dabeşî sê beşan dibît. Lê belê di zimanê tirkî da hevalnavên jimareyî êk ser dabeşî ser pênc beşan dibin. Cudahiya hevalnavên jimareyî di her du zimanan da ji layê curan ve hevalnavên jimara komê (Topluluk Sayı Sıfatları) ku di kurdî da nin e, beramber wê jî di zimanê tirkî da (Hevalnavên Jimara Piçjimar) nîn e.

### 2. 1. 5. 1. Hevalnavên Curê Xurî (Jimarey Esî – Bingeîn- Bincî)

Ev hevalnae di zimanê kurdî da berî navan dihên û hijmara navan diyar diken. Wek:

Te **dû** nan xarin.

Di zimanê tirkî da jî hevalnavên jimara bingeîn berî navan dihêne bikarînan. Wek:

“Küçük çocuk için **üç** litre süt aldım.

Eşimle tam **kırk** yıl mutlu bir hayat yaşadık.”<sup>2</sup>

<sup>1</sup>Yılmaz, hb., r. 116.

<sup>2</sup>Doğan, hb., r. 18.

Hevalnavên jimareyî di her du zimanan da ji jimara du û pêhel derbirînê ji komê diken. Xandina jimarên di her du zimanan da wekî êk in, ji jimara mezin berev jimara biçûk dihête xandin. Wek:

(pênc hizar û pênc sed û pêncî û pênc) → kurdî

(beş bin beş yüz eli beş) → tirkî

Di zimanê kurdî da hevalnavên jimareyî navî bi ketê didene diyarkirin. Wek:

Min sê sêv kirin.

Belê eger navekê dî li ser navê wesfa wî hatiye kirin hate zêde kirin dê amrazên palvedanê yên kom (ên-êd-êt) wergirîtin eger karê ristê **boriyê (têper û teneper)** û **karê bêhêz** bîtin û dê nav bi kom hête diyarkirin û navê hatiye îzafekirin jî dê nîşanên regezî wergirîtin. Wek:

Çar korên gondê me yarîzan in.

Belê eger karê ristê **neboriyê têper û daxaziyê têper** bîtin ew navên piştî hevalnavên jimareyî yên xurî dihên dê nîşana komê (**an**) wergirît. Wek:

Sobehî sê kew**an** bikire.

Sobehî dê sê kew**an** kirim.

Di zimanê tirkî da hevalnavên jimara bingehîn bi giştî dema berî navî dihên, nav nabîte kom yan nîşanên komê wernagirin. Wek:

Küçük çocuk için **üç** litre süt aldım.

Belê her zimanekî nawêzeyên xwe yên heyn, zimanê tirkî jî yê bêbehîr nîne ji van nawêzeyan, evca hindêk nav nîşana komê werdigrin yan nîşana komê diçête ser. Wek:

(Üç silahşörler, kırk haramiler, üç ahbab çavuşlar,...)<sup>1</sup>

Hevalnavên jimareyî di zimanê kurdî da bi amrazê (**û**) dihêne lêkdan. Wek:

---

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 295.

(çil **û** pênc, bîst **û** sê,...hwd)

Belê di zimanê tirkî da hevalnavên jimareyî bêy amraz dihêne lêkdan Wek:

(kırk beş, yirmi üç,...)

Hevalnavên jimara bingehîn di zimanê tirkî da weko jimare jî dihête bikarînan, lê belê di zimanê kurdî da weku jimare nahête bikarînan. Wek:

Ben **3** gül aldım. → tirkî

Di her du zimanan da dema du hevalnavên jimareyî êk li dîv êk li berî navî bihên, pena bo texmînî dihête birin li cihê jimareka vebir. Wek:

Ew dê **çar pênc** rojan mînin. → kurdî

Onlar **dört beş** gün kalacaklar. → tirkî

Di zimanê kurdî da Hevalnavên jimareyî dibine bersiva peyva pirsyarî (**çend**) . Wek:

Wî **çend** bira hene? Wî **sê** bira yên heyn

Hevalnavên jimara bingehîn di zimanê tirkî da dibine bersiva peyva pirsyarî “**kaç**” ev peyve li berî navî dihêt. Wek:

Onu **kaç** abisi var? Onu **üç** abisi var.

## 2. 1. 5. 2. Hevalnavên Curê Payedar (Tertîbî – Rutbî) Rêzîn- Rêkxistin

Ev hevalnave di zimanê kurdî û tirkî da rêzbendiya navan didene diyarkirin. Hevalnavên jimara rêzîn di zimanê kurdî da ji (**jimarê + ê**) dirust dibîtin. Wek:

êk + **ê**, Pênc + **ê**, şeş + **ê**,... hwd

Şêwê dirustkirina hevalnavên jimara rêzîn di zimanê tirkî da jî wekî kurdî ye ji **jimarê + (-inci(-inci, -uncu, -üncü))** bitinê nîşane cudane. Wek:

Bir + **inci**, beş + **inci**, altı + **ncı**,...

Hevalnavên jimara rêzîn di zimanê kurdî da dîv navan ra dihêne bikarînan. Ew navê berî hevalnavên rêzîn dihên amrazên danepal werdigrin û di awayê kit da bikar dihên. Wek:

Qotabiyê **çarê** gelekê zîrek e.

Hevalnavên jimara rêzîn di zimanê tirkî da berî navan dihêne bikarînan. Ew navên piştî hevalnavên jimara rêzîn tên, eger pêdvî bît dibît dişewê ko da bêtin. Wek:

“Bu sınava yalnız onuncu sınıflar katılacak.”<sup>1</sup>

Hevalnavên jimara rêzîn di zimanê kurdî da dibine bersiva hevalnavê pirsyarî (**çendê**). Wek:

Mala hewe li kolana **çendê** ye?      Mala me ya li kolana **sêyê**.

Hevalnavên jimara rêzîn di zimanê tirkî da dibine bersiva hevalnavê pirsyarî (**kaçıncı**) û li berî navê dihête danan. Wek:

“**Kaçıncı** sınıfa gidiyorsun? – **Üçünü** sınıfa gidiyorum.”<sup>2</sup>

peyvên wekî (**ilk, son, sonucu**) û “**ortanca**” jî wekî hevalnavên jimara rêzîn dihêne bikarînan. Wek:

“**İlk** gün işler yolunda gitti.

Ailenin **ortanca** çocuğu olan ağbeyim Almanya’ya gitmiş.”<sup>3</sup>

## 2. 1. 5. 2. 1. Hevalnavên Jimara Parkir (Dabeşkirnê- Ducarkirî)

Ev curê hevalnavî di zimanan kurdî da jimarên wekî êk dabeş diketin, anko bi êksanî da beş diketin. Şewê serekî dirustkirina wê di kurdî da bi dubarekirina jimarê dirust dibîtin. Wek:

(êk êk, sê sê, şeş şeş,... hwd)

Xoxan **dû dû** belav biken.

---

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 296.

<sup>2</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r.79.

<sup>3</sup>Demir, hb., r. 296.

Hindek cara paşpirta (**e**) bi ser hijmara duwê ya du car kirî ve dihête berdan.  
Wek:

(êk êke, sê sêye, şeş şeşe,... hwd)

Xoxan **sê sêye** belav biken.

Hindek caran jî (**bi**) ek dikevîte navbera jimara dubare kirî û li dîv navan û cihnavan ra dihên. Wek:

(êk bi êk, sê bi sê, şeş bi şeş,... hwd)

Xoxan **du bi du** belav biken.

Hevalnavên jimara dabeşkirinê di zimanê tirkî da jimaran bi wataya wekhevî da beş diket, belê ne wekî zimanê kurdî jimare dubare dibît, şewê dirustkirina hevalnavên jimara dabeşkirinê di zimanê tirkî da bi paşgirên “-ar(-er), -şar(-şer)” dihêne dirustkirin ev paşgir e dikevne ser jimara bingehîn. Wek:

(üçer, beşer, dukozar,...)

“Herkes üçer elma yedi.”<sup>1</sup>

Hevalnavên jimareyî yên lêkdayî yên dabeşkirinê di zimanê tirkî da bi du curan dirust dibin:

“a. Beş yüz –er, elli bin –er...

b. beş-er yüz, elli –şer bin...”

“Bizden yüzer bin (yüz biner) lira istediler.”<sup>2</sup>

Di Kurmanciya Serî da li cihê (êk êk, êk êke), ( ket ket yan ket kete) û li cihê (du du, du duwe), (cot cot yan cot cote) dihêne bikarînan. Wek:

Azadî mazî **cot cote** dikirin.

---

<sup>1</sup>Yılmaz, hb., r. 118

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 297.



peyvên “yarımşar, azar, çifter, teker, birkaçar” wekî hevalnavên dabeşkirnê dihêne bikarînan. Bo nimûne:

“Yarımşar şeftali yedik.

Hevalnavên jimara dabeşkirnê di zimanê tirkî da berî navî dihên û navên piştî jimara dabeşkirî dihên nabine kom. Wek:

“Her çocuğa ikişer hediye verdik.”<sup>1</sup>

Ev hevalnave dibine bersiva peyva pirsyarî “kaçar”. Wek:

“Kaçar lahmacun yediniz? – Üçer. (her birimiz üç tane lahmacun yedik.)”<sup>2</sup>

## 2. 1. 5. 2. 2. Hevalnavên Jimara Komzîk (Jimara Şikestî - Kertî )

Di zimanê kurdî da ev hevalnave parçekirina tiştî diyar diketin. Hevalnavên jimara şikestî herdem berî navî dihêne bikarînan. Şêwê dirustkirina wê **jimare + paşgirê (êk)** dirust dibîtin. Wek:

(sê **êka** xanî, çar **êka** malî,...hwd

Wî **sê êka** parê xwe da hejaran.

Di zimanê tirkî da ew hevalnav in yên navên diyarkirî, hijmara wan bi şikestî nîşan didetin. Hevalnavên jimara şikestî berî navî dihên. Şêwê dirustkirina wê **jimara bingehîn + paşgirên (te, ta, de, da) paşî jimara şikestî** dihêt û her du pêkve di şêwê komepeyvê da dihêne bikarînan. Ew navên piştî hevalnavên jimara şikestî dihên nabine kom. Wek:

**Üçte bir** (ekmek), **dörtte üç** (elma),...htd

Şirketin **dörtte bir** oranında hisesi satışa çıkarılacak.”<sup>3</sup>

Ev hevalnave dibine bersiv bo peyvên pirsyarî “**kaçta kaç, ne kadar**” dema pirsyar ji navî dihête kirin. Wek:

<sup>1</sup>Gülsün, hb., r. 282.

<sup>2</sup>I. Ersen-Rasch; Onası, hb., r.79

<sup>3</sup>Gülsün, hb., r.283.

“Kaçta kaç hisse?, Ne kadar pay?”<sup>1</sup>

### 2. 1. 5. 2. 3. Hevalnavên Jimara Piçjimar

Ew hevalnav in yên piç piçi û pirt pirtiya navî diyar diketin, şêwê dirustkirina vî curî (**jimara bingehîn** + **ek** yan **yek**) dirust dibîtin. Belê ev beş e di zimanê tirkî da nîn e. Wek:

(sêyek, pêncyek,...hwd)

### 2. 1. 5. 2. 4. Hevalnavên Jimara Komê

Ev beşe di zimanê kurdî da nîn e.

Belê di zimanê tirkî da ew hevalnav in yên navî bi komê dene diyarkirin. Şêwê dirustkirina wan ji (**jimara bingehîn** + ((**1**) **z** / (**u**) **z**)) dirust dibît. Wek: (**ikiz** çocuk,...vb)

New York'un **ikiz** kulelerine yapılan saldırı... ”<sup>2</sup>

Ew navê piştî hevalnavên jimara komê dihên dişet nîşana komê jî werbigrît (**lar, ler**), wekî: (üçüz kardeşler,...vb)

Her wesan (hindek caran jî bi paşgirê **-li** dihête dirêjkirin. Wek:

(ikizli badem).

Hindek caran jî raste rast paşgirê **-li** dihêt û hevalnaê jimara komê dirust dibîtin:

Beşli tabanca,...vb

### 2. 1. 6. Hevalnavên Nisbî (Rêjeyî)

Hevalnavê nisbî ew hevalnav in yên ku peywendiya wan bi tiştekê dî ve diyar dibît. Ew diyarên hevalnavê nisbî pê diyar dibin hindek ji wan ev in “cîh -û war, ’eşî, dîn, mezheb, zanist”.

---

<sup>1</sup>Demir, hb., r. 297.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 299.

Hevalnavên nisbî di zimanê kurdî da bi harîkariya paşgirên “-î, -okî, -în) û pêşgirê (-bê) û amrazê **ne**” dihêne dirustkirin, Paşgirên (anî, dar) jî li ser navî dihêne zêdekirin û hevalnavên nisbî dirust diken. Wek:

Zêr	→	zêrîn	xem	→	xemokî
Cwan	→	cwanî	birîn	→	birîndar
Sax	→	nesax	mal	→	bêmal
zêlam	→	zêlamkanî			

Belê di zimanê tirkî da çî babet jêr vî nav û nîşanî nîn in ku behsê hevalnavên rêjeyî hatibête kirin. Belê hindêk nav ewên tişt jê dihêne dirustkirin weko hevalnav dihêne bikarînan û raveka hevalnavî dirust diken:

“**demir** kapı, **altın** kalem”

## 2. 1. 7. Hevalnavên Karî

Hevalnavên karî di zimanê kurdî da dibine du beş: hevalnavên biker, hevalnavên kiraw. Lê belê di zimanê tirkî da hevalnavên karî li gorî demî dabeşî sê tayan dibin.

Belê di zimanê tirkî da ev babete ne keftiyê jêr navê hevalnavî ji layê hebûnê ve û nekeftiyê bin beşê hevalnavên diyarker ve, wekî babetekê serbexwe behs jê dihête kirin.

### 2. 1. 7. 1. Hevalnavên Biker

Hevalnavên bikerî di zimanê kurdî da ew peyv in ku sîfetekê berdewam didene bikerî û delaletê ji bikerî diken. Ev hevalnavên bikerî nebinê ji çawigî dihête wergirtin belkî hindêk ji wan ji navan jî dirust dibin, hevalnavên biker du cur in:

#### 2. 1. 7. 1. 1. Hevalnavên Bikerê Darêjtî

Ev curê hevalnavî bi şêweyekê giştî ji çawigan û navan dihêne dirustkirin, demê ji çawigan dihêne dirustkirin dê qedê çawigî yan regê çawigî wergirîn digel pêşgirekî yan paşgirekî yan jî herdukan, navên sade jî digel paşgirekî dê vî curî dirust ken. Jimareka zor ji paşgiran dikevne ser navan.

(mirî, xandevan, xewte, wergirtî, nezan, gerok, dahêner,...hwd.)

### **2. 1. 7. 1. 2. Hevalnavên Bikerê Lêkdayî**

Ev hevalnave bi kêmî ji du peyvan pêk dihên ku xodanê helgirên watayekê bin.

Ji çend yasayekan pêk dihên ew jî li jêr vî navî di pişka êkê da behis jê hatiye kirin. Wek:

(ziksofî, geşbîn, kêmxor, dilber, destkird, xofiroş,...hwd.)

### **2. 1. 7. 2. Hevalnavên Kiraw**

Ew peyv in ku kiryarek serda hatibît û ji encamê wê kiryara serda hatî sîfetekê berdewam didete wî navê keftiye pal bi harîkariya amrazên palvedanê (**a, ê, ên-êd-êt**), eve jî dibine du beş:

Hevalnavên kirawê darêjtî, hevalnavên kirawê lêkdayî

#### **2. 1. 7. 2. 1. Hevalnavên kirawê darêjtî**

Ew hevalnav in “Ji çawigê têper û têneper biladana nûna çawigî û zêdekirina paşgirê (î)” dirust dibîtin. Wek:

(nivîsî, sofî, xarî, şikestî,...hwd.)

#### **2. 1. 7. 2. 2. Hevalnavê Kirawê Lêkdayî**

Ew hevalnav in bi kêmî ji du peyvan pêk dihên ku xodanê helgirên watayekê bin. Ji çend yasayekan pêk dihên ew jî li jêr vî navî di pişka êkê da behis jê hatiye kirin. Wek:

(dilgirtî, jinmirî, sorkirî, şêlîbûyî, serjêkirî,...hwd.)

Belê hevalnavên karî di zimanê tirkî da wekî ji navî diyar ew kar in yên wekî hevalnavî dihêne bikarînan, ev hevalnavên karî ji regên karî dihêne dirustkirin ku dûmahîk birga karî ku nîşanên (**mak-mek**) jê dihête rakirin, digel ser ve berdana hindêk paşgirên taybet dihêne dirustkirin.

Hevalnavên karî di zimanê tirkî da li gorî demî dabeşî sê tayan dibin:

### 1. Hevalnavên Karê Borî

Ev hevalnave bi ser ve berdana paşgirên “**-dik, -miş**” dihête dirustkirin ku ev paşgir e jî digel dengên bizwên yên regên karî xwe digoncînin, ev paşgir e di şewê erê da bi kêmî dihête bikarînan. Wek:

(**Tanıdık** insanlar, **Bildik** konu,...vb.)

Ev hevalnave bara pitir di şewê nerê da dihêne bikarînan û bi nîşanê nerê “**-ma (-me)**”. Wek:

(**tanımadık** kadın, **bilmedik** biri,...vb.)

Hevalnavên karî ewên bi paşgirê (**-dik**) dihêne dirustkirin di raveka hevalnavî da cihnavên likaw werdigrin û navê piştî têt çî nîşanan wernegirît, dê di ristê da erkê bikerî bînin. Wek:

**Yazdığım** hikâye benden ziyade sevdiğim insanların hayatına aitti.

Belê eger di raveka hevalnavî da navî nîşan wergirt dê erkê berkarî bînin. Wek:

Evimize ilk **geldiği** akşamı hatırlıyorum.

**Paşgirê -miş (-miş, -muş, -müsh):**

Ev paşgire hem dişet bihête ser karên têper hem jî teneper, belê ev paşgire bara pitir digel karên teneper dihêne bikarînan û ber belavtir in.

**digel karên têper**

Ew jî regê karî ji çawigî dihête wergirtin. Wek:

(**ukumuş** kimse, **pişmiş** aş,...vb)

Paşgirê (-miş) bi nîşana nerê (**-ma, -me**) dihête nerêkirin û dikevîte ser regên karî û paşan paşgirê (-miş) dîv ra dihêt û peyvê dikete şewê nerê. Wek:

(**ukumamış** kimse, **pişmemiş** aş,...vb)

## **digel karê têneper**

Ev beşe yê cudaye ji beşe berê çunkî “Yên kevne di nav vî gorupî digel reg yan jî yên bi regê karên têneper dihêne hijmartin paşgirên +Ar-, -Aş-, -Iş-/Uş-, -n- û -Il-/Ul- vegerandinê yan jî yên neçalak karî dirust diken.”. Wek:

(**gelişmiş** güzeliğini, **koyulaşmış** yeşil gözleri, **bağlanmış** bir ip, **kızarmış** domatesi, **örtülmüş** kapaklar, **alışılmış** şeyler,...vb)

## **2. Hevalnavên Karê Niha**

Ev hevalnave bi harîkariya sê paşgirên jêk cuda dihêne dirustkirin û dikevne ser regên karî çî têper çî têneper bin, ew jî paşgirên:

“-ar (-er, -ır, -ir, -ur, -ür)”. Wek:

(**akar** su, **yenir** ayva, **olur** iş, **güler** yüz,...vb.)

Ev curê hevalnavan bi nîşana (-maz (-mez)) dihête nerêkirin ku dikevîte dûmahîka regên karî. Wek:

(bitmez, çalmaz,...vb)

“-an (-en), wekî:

(**gel-en** otobüs, **yat-an** aslan,...vb.)

-ıcı (-ici, -ucu, -ücü)”. Wek:

(**üzücü** haber, **yiyci** adam, **yırtıcı** hayvan,...vb.)

Ev her du jî bi nîşanê (-ma (-me)) dihêne nerêkirin û dikevîte piştî regên karî paşan paşgirê hevalnav çêker li dîv ra dihêtin. Wek:

(görünmeyen, sönmeyen,...vb.)

## **3. Hevalnavên Karên neborî**

Ev hevalnave bi zêdekirina paşgirên “-ecek, -esî” dihêne dirustkirin û dikevne ser regên karî:

**Paşgirê -ecek(-acak).** Wek:

(**inecek** yolcular, **verilecek** cevap,...vb)

Hevalnavên karî yên bi **-ecek** dihêne dirustkirin cihnavên likaw werdigin.

Wek:

“ödeyeceğiniz vergi, yapacağı indirim, karşılaacağım güçlük,...vb”<sup>1</sup>

Ev paşgir e dema kefte ser regên karî û kefte berî navî her du pêkve di ristê da dewrê bikerî dibînin. Wek:

“En beş sene evvelki gibi daha **konusacak sözler** bitmemişti.”

Her wesan paşgirê (-AcAk) dema dikevîte ser regên karê têper û bikevîte berî navekî pêkve raveka hevalnavî dirust diken, çî sade yan jî di timamkirinê da nav nîşanan werbigrît di ristê da dê dewrê berkarî bînît. Wek:

“Otelciye **gidelecek yer** sordum.”

Ev hevalnave bi nîşanê (**-ma (-me)**) dihête nerêkirin û dikevîte navbera regê karî û paşgirê **-ecek**. Wek:

(**çözülemeyecek** soru, **olmayacak** duaya,...vb)

**Paşgirê-esi**

Eve paşgire wekî paşgirekê kevin yê hevalnavên karî dihate bikarînan û bi ramana paşgirê (**ecek**) dihête bikarînan. Wek:

“Yıkılası su dağların ardına

Aşıp gider bir gözleri sürmeli.”<sup>2</sup>

## **2. 2. Hevalnav ji Layê Binyadê (Pêkhatinê) ve**

Ji layê pêkhatinê ve di her du zimanan da bi giştî ser sê beşan dabeş dibin:

### **2. 2. 1. Hevalnavên Sade (Xweru)**

---

<sup>1</sup>Banguoğlu, hb., r. 427.

<sup>2</sup>Demir, hb., r. 461.

Hevalnavên xweru di her du zimanan da wekî êk in, ji peyveka ramandar pêk dihên bêy pêşgirekî yan paşgirekî dirust dibin. Wek:

kurdî	tirkî
sor	kırmızı
şirîn	tatlı
ker	sar
dirêj	uzun

## 2. 2. 2. Hevalnavên Darêjtî

Di zimanê kurdî da ew hevalnav in yên ji peyveka ser bixwe û digel pêşgirekî yan paşgirekî yan jî digel herdukan pêk dihên, merem ji pêşgir û paşgiran ew morfîmin (gîrekin) yên peyvan darêj in, ev morfîmên peyvan darêj in, dema digel peyveka ser bixwe bi kar hatin yan divêt pişka axiftinê bigohorît yan jî divêt watayê bigohorît û peyveka nu dirust biket. Wek:

( **negirtî**, **bêser**, **bişerm**, **bikuj**, **nesax**,...hwd.)

Hevalnavên darêjtî di zimanê tirkî da ew hevalnav in yên ji binyatê navî yan jî karî û paşgiran pêk dihên, di zimanê tirkî da pêşgir û nîvgir nîn in.

Ew paşgirên di tirkî da dihêne bikarînan li ser du xalan dihêne dabeşkirin:

ya **êkê** ew paşgirên dikevne ser navan û hevalnavî dirust diken. Wek:

(**turşuluk**, **kumarcı**, **erkekçe**,...vb)

Ya **duyê** jî ew paşgirên dikevne ser regên karan û hevalnavên darêjtî dirust diken. Wek:

(**korkak**, **yırtık**, **çatı**, **yazma**, **korkunç**,...vb)



## Pêşgirên Hevalnavên Darêjtî Dirust Diken

Ew pêşgirên di zimanê kurdî da hevalnavên darêjtî dirust diken jimareka dest nîşankirîne digel (nav, hevalnav, regê karî û qedê çawigî) dihêne bikarînan, bi çend yasayekan di beşê êkê da ji lapere (35 - 39) hatîne bikarînan. Wek:

/ne<sup>7</sup>/ + mêr → nemêr

/ne<sup>7</sup>/ + baş → nebaş

/ne<sup>7</sup>/ + zan → nezan

Belê ev pêşgirên hevalnavê darêjtî dirust diken hemî ne wekî êk çalak in di dirustkirina hevalnavên darêjtî da.

Her wesan peyvên (ber, ser, pêş, bin, jêr) wek pêşgir dihêne bikarînan û hevalnavên darêjtî ji dirust dibîtin. Wek:

(berdest, **serdest**, **bindest**, **jêrdest**, **pêşçav**,...hwd.)

## Paşgirên Hevalnavên Darêjtî Dirust Diken

Wekî di pêşka êkê da bo me diyar bûy, ku di zimanê kurdî da jimara paşgiran zortirin ji jimara pêşgiran, ew paşgirên di Badînî da dihêne bikarînan li pişka êkê hatîne diyarkirin, ev paşgire bi curên cuda cuda bikar dihên, hindek ji wan dikevne ser (navî, hevalnavî, qedê çawigî û regê karî), bo pitir zanîn zivrin bo hevalnavên darêjtî di zimanê kurdî da ji pişka **êkê** lapere (39 - 48).

Ew paşgirên di zimanê tirkîyê da dihêne bikarînan li ser du xalan dihêne dabeşkirin ya **êkê** ew paşgirên dikevne ser navan, ya **duyê** jî ew paşgirên dikevne ser regên karan û hevalnavên darêjtî dirust diken, bo pitir zanîn zivrin bo hevalnavên darêjtî di zimanê tirkî da ji pişka **duyê** lapere (85 - 90).

Her wesan ji layê jimarên ve jî ew paşgirên di zimanê tirkî û kurdî da dihêne bikarînan nêzîkî êk in.

### **2. 2. 3. Hevalnavên Lêkdayî**

Hevalnavên lêkdayî di her du zimanan da ew hevalnav in ku bi kêmî ji dû peyvên watadar yên serbexwe yan zêdetir pêk hatibît yan jî êk ji wan peyvên helgirên wataya peyveka serbexwe bîtin.

Hevalnavên lêkdayî di zimanê kurdî da ji çend yasayekan pêk dihên ew yasa jî di pişka êkê da yên hatîne diyarkirin ji lapere (49 - 51).

Hevalnavên lêkdayî di zimanê tirkî da ji çend yasayekan pêk dihên ew yasa jî di pişka duyê da yên hatîne diyarkirin ji lapere (90 - 93).

Belê xala cudahî di hevalnavên lêkdayî da di navbera zimanê tirkî û zimanê kurdî da ewe ku hevalnavên lêkdayî di zimanê kurdî da bi êk rêk û pêkve dihêne nivîsîn û di zimanê tirkî da bi dû rêkan, ku ew jî hindek pêkve û hindek jî cuda dihêne nivîsîn.

Hevalnavên lêkdayî di zimanê tirkî da ser dû curan da beş dibin: (**Hevalnavên Lêkdayî yên Têkhel, Hevalnavên Lêkdayî yên Birêzik**)

#### **2. 2. 3. 1. Hevalnavên Lêkdayî yên Têkhel**

Ev beşê hevalnavên lêkdayî ji layê nivîsînê ve pêk ve dihêne nivîsî. Her wesan ji çend yasayekan pêk dihên ku ew jî di pişka duwê da yên hatîne diyarkirin. Wek: (vurdumduymaz, ikiyüzlü, boşboğaz, haksever,...vb)

#### **2. 2. 3. 2. Hevalnavên Lêkdayî yên Birêzik**

Ev beşê hevalnavên lêkdayî ji hindek yasayan dirust dibin ku ew jî jêk cuda dihêne nivîsîn, her wekî di pişka duwê da diyar bîn. Wek:

(beyaz tenli, cana yakın, iki aylık, derli toplu, ipek saçlı,...vb)

### **2. 3. Hevalnav ji Layê Pileyê ve**

Di zimanê kurdî da pileyên hevalnavî li ser sê beşan hatîne da beş kirin. Lê belê di zimanê tirkî da rêkeftinek li ser nîne hindek dikene sê û hindek çar, hindek jî dikene pênc beş.

zimanê kurdî	zimanê tirkî
Pileya Hevalnavên Taybet (Çespayî )	Derecesiz Sıfatlar
	Eşitlik Derecesi
Pileya Hevalnavên Hevberkirinê	Üstünlük Derecesi
Pileya Hevalnavên Bala	En Üstünlük Derecesi
	Aşırılık Derecesi

### 2. 3. 1. Pileya Hevalnavên Taybet

Ev pileya hevalnavî di zimanê kurdî û di zimanê tirkî da wekî êk in, ew jî ew hevalnav in yên di her du zimanan da bi hevalnavên çewayî dihêne nîyasîn. Ev cure çî nîşanên taybet wernagirin. Wek:

kurdî	tirkî
zarokê <b>cwan</b>	<b>güzel</b> çocuk
sêva <b>şirîn</b>	<b>tatlı</b> elma
mala <b>dur</b>	<b>uzak</b> ev
Hemdiyê <b>Kore</b>	<b>Kör</b> Hamdi

### 2. 3. 2. Pileya Hevalnavên Hevberkirinê

Pileya hevalnavên hevberkirinê di her du zimanan da ew hevalnav in, yên hevberkirina du navan yan du tiştan beramberî êk diketin û pileya êkî ji ya dîtir pitir yan jî kêmtir nîşan didetin.

Şêwê dirustkirina wan di her du zimanan da bi vî rengî ye:

zimanê kurdî	zimanê tirkî
Ji amrazê ( <b>ji</b> ) û paşpirtika ( <b>tir</b> ) dirust dibît.	Ji hevalkarê ( <b>daha</b> ) û nîşanên cuda bûnê ( <b>dan, den, tan, ten</b> ) dirust dibît.

Ev cur di zimanê kurdî da bi harîkarîya amrazê (ji) ku dikevîte berî navê duyê yê hevberkirî û paşan paşpirtika (tir) dikevîte ser hevalnavî.

Belê ev cur di zimanê tirkî da hevalkarê (**daha**) tête berî hevalnavî û navê duyê yê hevberkirî nîşanên cudabûnê (**dan, den, tan, ten**) werdigrîtin û pileya hevberkirinê dirust dibît. Wek:

zimanê kurdî

zimanê tirkî

Ev mal **ji** mala hewe cwantir e.

Bu ev, sizin evden **daha** güzeldir.

Fatma **ji** Serpîlê aqiltir e.

Fatma Serpil'den **daha** akıllıdır.

Fîl **ji** kêrvîşkê mezintir e.

Fil, tavşandan **daha** büyüktür.

Hindek caran jî ev hevberkirne bêy hevalkarê (daha) dihête bikarînan bi harîkariya nîşanên cudabûnê (**dan, den, tan, ten**), wekî:

“Köpek kediden sadıktır.”

Her wesan paşgirê (**ki**) pila hevberkirinê dirust diketin:

“Benim arabam seninkinden eski.”

### 2. 3. 3. Pileya Hevalnavên Bala

Ev curê pileya hevalnavî di her du zimanan da, (nav yan tişt) ê hevberkirî ji nav du navan yan tiştan yan jî zidetir ya pila wî bala tir dete aşkirakirin.

Şêwê dirustkirina wan di her du zimanan da:

zimanê kurdî	zimanê tirkî
ji paşpirtika ( <b>tirîn</b> )	hevalkarê ( <b>en</b> )
ji peyva ( <b>ji hemî, ji hemiyan</b> ) û digel paşpirtika ( <b>tir</b> )	

Ev hevalnav e di zimznê kurdî ku di pişka êkê da hatiye diyarkirin bi giştî ji dû yasayan dirust dibîtin ya êkê ku paşpirtika (**tirîn**) dikevîte ser hevalnavî û ya dîjî bi rêka peyva (**ji hemî, ji hemîyan**) ku bara pitir dikevîte berî (nav yan tişt) ê hevberkirin digel dihête kirin û paşpirtika (**tir**) dikevîte ser hevalnavî.

Belê di zimanê tirkî da yasaya dirustkirina wê bi giştî ev e ku hevalkarê (**en**) dikevîte berî hevalnavî û pileya hevalnavê bala dirust dibîtin. Wek:

zimanê kurdî

zimanê tirkî

Daybab baş**tirîn** kes in bo mirov î.

“Bence **en** zeki hayvan köpektir.”

Bihar **ji hemî** werzan xwe**tir** e.

“Mehmet **en** çalışkan öğrencidir.”

Ev e **ji hemîyan** nerim**tir** e.

“Tanadığım **en** güzel kız sensin.”

### 3. 4. Hevalnavên Wekheviyê

Ev cure di zimanê kurdî da wekî babetek ji babetên pileyên hevalnavî nehatiye behiskirin. Lê belê Kadrî yildirim ev babete bikar înaye. Wek:

1. Azad **bi qasî** Ferhad zîrek e.

2. Ferman **hindî** te ye.

3. Koçer **wekî** Esmerê ya ciwan e.

4. Sîver **temetî** sîpelê pare wergirtin.

Ji encamê vekolînê di pileyên hevalnavî da di zimanê kurdî da, ew çend diyar bû û bi ber çavkirina nimûnan û selmandina wan nimûnan ku pileya hevalnavê wekheviyê yê di zimanê kurdî da hey.

Ev pileya hevalnavî wekheviyê di zimanê tirkî da di navbera hebûna du navan yan du tiştan da, wekheviyê yan yeksaniyê nîşan didetin. Bi harîkariya amrazên (kadar, gibi) dihêne dirustkirin û herdem dikevne berî hevalnavî.

“Benim **kadar** akıllı çocuk, Saray **kadar** büyük ev,...vb”

“Ali, benim **kadar** akıllı bir çocuktur.”

“Şunun **kadar** uzun bir atkı istiyorum.”

Peyvên wekî (derece, denli, ne) jî vê pileyê dirust diken.

“Bu **derece** candan bir karşılama daha önce görmedim.”

“Siz bu yazınızla **ne** iyi bir hizmet yaptınız doğrusu.”

“Bu **denli** güzel kumaşı nerede buldunuz ki”

Her wesan paşgirê (**ça**) jî dikevîte ser hevalnavî û pileya wekheviyê diyar diketin.

“Böylece çocuk**ça** nazlanmalar neyin nesi?”

### 2. 3. 5. Hevalnavên Pileya Zêdeyîyê

Ev piley e di zimanê kurdî da nîn e. Belê ev piley e di zimanê tirkî da kêmi û zêdeyîya tiştî yê bi hevalnavê çewayî hatiye wesfkirin didete diyarkirin. Ev peyvên hêzdar “çok, pek, çok fazla, çok az, pek çok, pek az, fazlasıyla, epey, fevkalâde, gayet, hayli, harikulade,...vb” dikevne berî hevalnavên çewayî û pileya zêdeyîyê dirust diken û raman zêdeyîyê didenê. Wek:

“Elinde büyük bir şairin **harikulade** kitabı var.”<sup>1</sup>

Belê “hevberkirmê naken.” dema peyva (**kadar**) kefte di navbera hevalnavên çewayî û peyvên (bu, o, ne) dê bi wataya pileya zêdeyîyê hêne diyarkirin, ne bi pileya hevalnavên wekheviyê. Wek:

“Ne hoş, ey güzel tanrım, ne hoş! / iller, göller, kıt’alar aşmak

Ne hoş deniz deniz dolaşmak / düşünceler gibi başıboş.”<sup>2</sup>

Her wesan dubarekirina hevalnavî û paşgirê “-mı/-mu” bikevîte navbera hevalnavên dubarekirî û wan pêkve girê didet û pileya hevalnavên zêdeyîyê dirust diket. Wek:

“Güzel mi güzel, tatlı mı tatlı bir çocuk,...vb”<sup>3</sup>

<sup>1</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 367.

<sup>2</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 367.

<sup>3</sup>Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, r. 368.

### 3. Biçûkkirina Hevalnavan

Di zimanê kurdî da hevalnav biçûkkî, nazikî bo viyanê yan neviyanê ya tiştî dihêne bikarînan bi harîkariya hindêk paşgiran, paşgirên wekî “-ek, -ik, -ok, -kok” ew jî bi du rêkan dirust dibin:

1. Dikevne ser regên karî:

(sojek, kojek, xapînok,...hwd)

2. Dikevne ser hevalnavan:

(Kirêtok, kinik, zerik, reşik,...hwd)

Di zimanê tirkî da biçûkkirina hevalnavan wekhevîyê yan jî nêzîkiya wî navî didene diyarkirin yê pê dihêne wesifkirin bi rêka vê wekhevîyê erkê biçûkkirî dibînît.

Ew paşgirên hevalnav pê dihêne biçûkkirin “+CA, +CANA, +cAK, +cIK/ +cUK, +sII +sU, msI / +msU, mtirak ve +rak” ev paşgire digel dengên bizwên yên kurt û dirêj ji birga dûmahiyê ji peyvê dihêne guhorîn, paşgirên biçûkkirî dikevne ser navî û hevalnavî û watayeka nû yan jî nêzîkê wê yan jî wekhevîyê didetin, eve jî bi dû rêkan çêdibin:

1. Dikevne ser navan:

(askerce, insanca, kadınsı, erkeksi,...vb)

2. Dikevne ser hevalnavan:

(sarımtirak, ekşirek, acımsı,...vb)

Paşgirên biçûkkirî di her du zimanan da, ew paşgiran yê peyvên darêjtî dirust diken.

### 4. Xortkirina Hevalnavan

Di zimanê kurdî û zimanê tirkî da mebest ji xortkirina hevalnavan ewe ku ramana hevalnavî xortir û bihêztir bibît.

Hevalnav di zimanê kurdî da bi giştî bi van rêkan dihêne xortkirin. Wek:

1. Bi rêka peyvên radê ku dikeve berî hevalnavî, peyvên radê (zor, pir, hind, hinde, gelek, zehif, pîçek, çend, çi,...hwd). Wek:

Ew kiça **gelek** ciwan bo derçûya êkê.

2. Bi dubarekirina hevalnvî. Wek:

Befra **sipî sipî** ya keftî.

3. Bi lêkdana peyveka watadar digel peyveka bê wata û bi pêş û paşkirina her dukan. Wek:

Ew mirovekê **rep û rît** e.

4. bi lêkdana dû peyvan ku ramana wan nêzîkî êk bin. Wek:

Mirovên **nerm û helîm** kê in.

Xortkirina healnavan di ziamnê tirkî da bi vî rengê li xarê dirust dibin:

1. Xortkirin bi pîtên nebizwên “**m, p, r, s**”. Wek:

(te-**r**-temiz = tertemiz su

sa-**p**-sarı = sapsarı ayva

ma-**s**-mavi = masmavi adam

ye-**m**-yeşil = yemyeşil çayır)

2. Dûbarekirina healnavan. Wek:

“**iri iri** karpuzlar, **kara kara** gözler,...vb”

3. Dûbarekirina navan. Wek:

“**takım takım** elbiseler **kucak kucak** hediyeler,...vb”

4. Înana morfîma “**mi**” di navbera hevalnavên du bare kirî. Wek:

“temiz **mi** temiz bir kadın, güzel **mi** güzel bir kız,...vb”



5. Dubarekirina hevalnavên jêk cuda ku peyvên ramana wan nêzîkî êk yan jî ramana wan dijî êk, yan jî dengên wan wekî êk bi dubarekirina wan xortkirin dihête dirustkirin. Wek:

“**irili ufaklı** meyveler,**iri yarı** bir genç, **doğru dürüst** söz, **yalan yanlış** haber,...vb”

6. Hevalnavên nişaneyî bi peyva “**işte**” dihêne xortkirin. Ev peyve pitir li berî hevalnavên nişaneyî dihêne bikarînan. Wek:

**İşte** şu ev!

## 5. Hevalnavên Navdariyê

Ji van jêderên hatîne bikarînan di zimanê kurdî da. Ev babete weko hevalnav ji layê rêziman nivîsan ve vekolîn li ser nehatîne kirin di kurdî da.

Lê belê eger em baş hizra xwe bikeyn rojane em ji bo rêzgirtin, pile û postan, cih û niyasînê peyvên (**berêz, hêja, paşa, axa, beg, mîr**,...hwd) û kortkerên (pirofîsor (**prof**), dîktor (**dr**)) digel navên mirovan bikar diînin. Wek:

**Berêz** Barzanî, **Dr.** Mehmod Osman, Mehmîd **Paşa**, **Mîr** Celadet, **Şêx** Seîd Pîran, Dêwalî **Axa**, Serheng **Beg**,...hwd.

**Dr.** Mehmod Osman siyasetmedrekê kurd e.

Dêwalî **Axa** serokê hoza doskiyan bû.

Peyvên (**Paşa, Beg, Axa**) piştî navan dihêne bikarînan. Lê belê peyvên (**Berêz, Dr, prof, Hêja, Mîr, Şêx**) berî navan dihên e bikarînan.

Her êk ji van peyvên li serî hatîne bikarînan ligel navekî pesna wî navî ya kirî, anku her êk ji wan di cihê xwe da di bikarînanê da hevalnave.

Peyvên (**Paşa, Beg, Axa, Berêz, Dr, prof, Hêja, Mîr, Şêx**,...hwd) raste navin û navên pişeyane lê dema em li gel navan bi kar binîn wesfa wan nava diken yên li gel bi kar hatî, evca ji ber hindê em dişeyn van cure peyvan ligel bikarînanana wan weku hevalnav diyar bikeyn her wesana weku hevalnavên navnişaneyî bi kar binîn.

Eve jî wê çendê diyar diket ku ev babete di zimanê kurdî da yê hey, lê belê dibît vekolînên hûr li ser nehat binekirin.

Belê di zimanê tirkî da ew peyvên digel navên mirovan dihêne bikarînan ji bo rêzgirtin, pile, cih, niyasîn û nasnavê wan diyar diken wekî hevalnavên navdariyê dihêne bikarînan, hevalnavên navdariyê bi sê rêkan dihêne bikarînan. Wek:

1. Hevalnavên navdariyê yên berî navî tên. Wek:

“**Sayın** Ayşe Işık, **Maraşal** Fevzi Çakmak, **Bay** İsmail Yücel,...vb”

2. Hevalnavên navdariyê yên piştî navî tên. Wek:

“**Özgür** **Bey**, **Oğuz** **Kağan**, **Zeynep** **Hala**,...vb”

3. Hevalnavên navdariyê yên berî navî û piştî navî tên. Wek:

Nesrettin **Hoca**                      Orhan **Gazi**                      Hasan **Çavuş** →      berî navî

**Hoca** Nesrettin                      **Gazi** Orhan                      **Çavuş** Hasan →      piştî navî

## 6. Bikarînana Hevalnavan Wekî Nav

Dema hevalnav weko nav bikar bihêt pêdviye hevalnav wan taybetmendiya werbigirît yên nav werdigrin. Di vî barî da hevalnav dê wekî navî bikar dihêtin.

Di her du zimanan da hevalnav weko nav bikar dihên û ew taybetmendiyan nav werdigrît di her du zimanan da hevalnav wan taybetmendiya werdirît. Wek:

zimanê kurdî		zimanê tirkî	
Hevalnav	Nav	Sıfat	İsim
Biçîk	<b>Biçîkan</b>	küçük	<b>Küçükler</b>
Mezin	<b>Mezinan</b>	büyük	<b>Büyükler</b>
Biçîk	<b>Biçîkî</b>	tatlı	<b>Tatlıy</b>
Mezin	<b>Mezinî</b>	mavi	<b>Maviyi</b>
Korekê <b>biçîk</b> ji mal derkeft.	<b>Biçîkek</b> ji mal derkeft.	<b>Akıllı</b> insanlar kendine güvenir.	<b>Akıllılar</b> kendine güvenir

Her wesan dema hevalnav li cihê navî hate bikarînan dê erkên navî wergirît, ew erkên nav werdigrît di her du zimanan da. Wek:

### **zimanê kurdî**

**Biçîkek** ji mal derkeft. → biker

Wî **biçîkek** girt. → berkar

### **zimanê tirkî**

**Büyük** buyurur, **küçük** yapar. → biker

**Yaramazı** gördünüz mü → berkar

Ji layekê dî ve di zimanê kurdî da gelek ji hevalnavên çewayî weko navên taybetên mirovan dihêne bikarînan. Wek:

(**zîrek, ciwan, esmer, delel, nazik, şîrîn**,...hwd)

## **7. Erkê Hevalnavî di Ristê da**

Di zimanê kurdî da hevalnav van erkan di ristê da digêrît. Wek:

### **7. 1. Diyarkerên Navî**

Hevalnav bi giştî di zimanê kurdî da berî navî dihêne bikarînan bi harîkariya amrazên danepalê (**a, ê, ên, êd, êt**). Wek:

Kiça **bejinzirav** dilê min sot.

Korê **bejinzirav** keft.

Mirovên **bejinzirav** gelek law in.

Her wesan nav dişêt çendîn hevalnavan êk li dîv êk werbigrît bi harîkariya amrazê lêkdanê (û). Wek:

Amêdiyê bajêrekê bilind **û** ciwan **û** nazik **û** biçîk e.

Yan jî li cihê amrazê lêkdanê (û) bêhnok (,) dihête danan, ji bilî (û) ya li dumahîkê dihête bikarînan. Wek:

Amêdiyê bajêrekê bilind, cwan, nazik **û** biçîk e.

### 7. 2. Diyarkerên Cihnavî

Cihnav jî wekî navî di zimanê kurdî da dibine diyarker her bi harîkariya amrazên danepalê. Wek:

Ewa **bilind** hevala min e.

Ezê **feqîr** çî ji siyasetê nizan im.

### 7. 3. Diyarkerên Karên Bêhêz

Hevalnav di zimanê kurdî da dibine diyarker bo karê bêhêz, dema dibine diyarker bo karê bêhêz amrazên palvedanê wernagirin. Wek:

Pirça befrînê ya **zer** e.

Gohîşk **sor** bûn.

Mirovê xandevan yê **bibiha** ye.

Di zimanê tirkî da erkê hevalnavî wekî hevalnav di ristê da:

### 7. 4. Dibîte Diyarkiryên Navî

Dema hevalnav dikevîte piştî navî di zimanê tirkî da dibine diyarkiryên navî. Wek:

**kara** tavuk, **şu** yollar,...

Di zimanê tirkî da navek dişê çend hevalnavan êk li dîv êk werbigrît anko çend hevalnav li dîv êk bihên û di navbera her êk ji wan hevalnavan da (**vîrgîl**) dihête bikarînan û berî hevalnavê dûmahîkê amrazê lêkdanê (**ve**) dihête bikarînan. Wek:

“**uslu, terbiyeli, genc ve bilgili** bir adam.”

### 7. 5. Dibîte pêveber

Dema nîşanên karî wergirtin yan jî piştî navî hat dê ristê dirust ket, ca çi nîşanên karî diyar bin yan jî ne diyar bin dê erkê pêveberî bînît:

(Pek **naziksiniz**, Orhan **beşincidir...**)





**ENCAM**

## ENCAM

Piştî diyarkirina hevalnavî di pişka êkê da li ser zimanê kurdî û diyarkirina pişka duwê li ser zimanê tirkî hatiye diyarkirin, ji encamê van her du pişkan pişka siyê jê dirus bûye ku ew jî hemberiya van herdu pişkane ji layên wekhevî û cudahiye ve.

Sereray wê çendê jî ku her du ziman ne ji êk xêzan in. Ser encam çen xalekên giring ji hemberkirina van her du pişkan bi dest keftin:

1. Ji layê pênasê ve hevalnav di zimanê kurdî da wesf û pesna navekî yan cihnavêkî diketin, lê belê di zimanê tirkî da wesf û pesna navekî diketin.
2. Hevalnav ji layê pêk hatinê ve weko êk in (sade, darêjtî û lêkdayî), ji layê darijtinê ve hevalnavên darêjtî di zimanê kurdî da bi rêka pêşgir û paşgiran ku digel (navan, hevalnavan, qedê çawigî, regên kar û hevalkarî) pêk dihên belê di zimanê tirkî da hevalnavên darêjtî bi rêka paşgiran bi tinê pêk dihên ku dikevne ser navan û regên karan.
3. Di zimanê kurdî da hevalnav pitiriyaya caran piştî navî û cihnavî dihên belê di zimanê tirkî da pitiriyaya caran berî navî dihên.
4. Hevalnavên biçûkkirinê di her du zimanan da bi paşgirên biçûkkirinê dirst dibin.
5. Hevalnavên xortkîrnê di her du zimanan da ne weko êk in, bi rêkên jêk cuda dihêne dirustkirin.
6. Hevalnavên navdariyê di zimanê tirkî da weko babetek hatîne bikarînan, lê belê ev çavkaniyên hatîne bikarînan di zimanê kurdî da li dûr vî babet vekolîn li ser nehatîne kirin. Belê bi dîtina min yê hey wekî di pişka siyê da diyar bûn.
7. Ji encamê vekolînê di pileyên hevalnavî da di zimanê kurdî da, ew çend diyar bû û bi ber çavkirina nimûnan û selmandina wan nimûnan ku pileya hevalnavê wekheviyê yê di zimanê kurdî da hey.
8. Pileya hevalnavê zêdejiyê di zimanê tirkî da he ye, beramber di ziman kurdî da nîn e.

9. Hevalnavên karî di zimanê kurdî da hevalnavên bikerî û hevalnavên kiraw pêk diînin û ji çendîn yasayan pêk dihên. Belê hevalnavên karî di zimanê tirkî da hevalnavên karê borî, hevalnavên karê niha û hevalnavên karê neborî pêk diînin û ji regên karî û paşgirên taybet bi demên karî ve.

10. Hevalnav di zimanê tirkî da bi giştî demê piştî navî hatin dê ristê dirust ken.

11. Di her du zimanan da dema hevalnavî taybetmendiyan navî wergirtin dê weko nav erkê xwe di ristê da bînin.

12. Di zimanê kurdî da pitirîya caran amrazên danepal di navbera navî û hevalnavî dihêne bikarînan belê di zimanê tirkî da amraz di navbera hevalnavî û navî da nahêne bikarînan.

13. Di vê vekolînê da ew peyvên dibine hevalnav di her du zimanan da eger ew peyv wesfa karekî yan kiryarekê kir yan li cihê navekî hate bikarînan dê ji çarçovê hevalnavî derkevît û dê weko hevalkar û nav bikar hên.

14. Di her du zimanan da xalên wekhev û xalên jêk cuda hen e.



# ÇAVKANÎ

## ÇAVKANÎ

- A. Hatibođlu, Necip, *Türk Dili Dersleri Yazılı ve Sözlü Anlatım*, 9. Baskı, Akadami Kitabevi , Ankara, 2005.
- Altun, Mustafa, *Sözcük / Kelime Türleri*, www. Dilbilimi. Net, 2009.
- Amêdî, Sadiq Bihaedîn, *Rêzmana Kurdî Kirmanciya Jorî û Jêrî ya Hev Ber Kirî*, Çapa Yekê, Çapxana Daru'ş-Şûni's-Seqafî el Amme, Bexdad, 1987.
- Badıllı, Kemal, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehcesi)*, Ankara Basım ve Ciltevi – Ankara, 1965.
- Banguođlu, Tahsin, *Türkçenin Grameri*, 9. Baskı, TDK Yay., Ankara 2011.
- Baran, Bahoz, *Rêzmana Kurmancî*, Çapa Yekem, Kayhan Matbaacılık, İstanbul, 2012.
- Bedir-Khan, N., *Nvîsa Min*, Enistutya Kurd Parîs, Parîs, 1965.
- Bedir – Xan, Kamuran: Kolay Kürtçe (Kurmancî) Fransızcadan Türkçeye Çeviren Yakup Karademir, 2. Baskı, Baskı Ceren Matbaacılık, Doz Basım, İstanbul.
- Bedir Han, Emir Celadet & Rocer Lescot, *Kürtçe Grameri (Kurmanci Lehcesi)*, Paris Kürt- Enstitüsü, 1990.
- Bedir-Xan, Celadet Alî, *Elfabêya Kurdî Ê Bingehên giramera Kurmancî*, Çapa Êkê, Çapxana Ceylan, Sitenbul, 1998.
- Bilgegil, M. Kaya, *Türkçe Dilbilgisi*, 3. Basım, Salkımsöğüt Yayınları, Erzurum, 2009.
- Bülbül, Mikail, *Waneyên Rêzmana Kurdî*, Zanîngeha Mardîn Artuklu, Xandina Masterê, Mardîn, 2015.
- Cigerxwîn, *Awa û Destora Zimanê Kurdî*, Cam'a Bexda, Bexda, 1961.
- Çorbacı, Esra, *Babürname'de Sıfatlar*, Adnan Menderes Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, yüksek lisans tezi, Aydın, 2012.
- Demir, Tufan *Türkçe Dilbilgisi*, 3. Baskı, Kurmay Yay., Ankara 2013.
- Dođan, Miray Banu, *Bolvadin İlçesi Merkez İlköretim Okullarındaki 7. Sınıf Öğrencilerinin Yazılı Kompozisyonlarında Kullandıkları Sözcük türleri Üzerine Bir araştırma*, Afyon Kocatepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, Türkçe Eğitimi Anabilim Dalı Türkçe Öğretmenliği, Afyonkarahisar, 2008.

Ebde el Racihî, *Ilim el Loxe el Tetbîqî we Teilîm el Erebiye*, Dar el Meirîfe el Camie, el Eskenderiye, 1995.

Ebdula, Ebdulselam Necmedîn û Selwa Ferîq Salih, *Rêzmana Kurdî (bo Zarokan)*, Çapa Êkê, Çapxana Hecî Haşim, 2010, Hewlêr.

Efendioğlu, Süleyman, *Vâhidî Cinânü'l-Cenân(Giriş, Dil İncelemesi, Metin, Dizinler)*, Fenomen Yay., Erzurum, 2013.

Ehmed, Ehmed Hesên, *Rîzmanî Kurdî*, Çapî yekem, Çapxaney Dar El – Cahiz, Bexda, 1976.

el Bedrawî Zehran, *fî Ilim el Loxe el Teqabilî*, Çapa Êkê, Çapxana Dar el Afaq el Erebiye, el Qahîre, 2008.

Emîn, Nurî Elî, *Rîzmana Kurdî*, Çapa çuwarem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2014.

Ergin, Muharrem, *Türk Dil Bilgisi*, Bayrak Basım/Yayın/Tanıtım, Umut Matbaası, İstanbul, 2013.

Ersen-Rasch, Margarete I.; Erdoğan Onası, *Yabancı Dil Olarak Türkçe Dilbilgisi*, Papatya YayıncılıkEğitim, İstanbul, 2015.

Gencan, Tahir Nejat, *Dilbilgisi*, 4. Baskı, TDK Yayını, Ankara, 1979.

Göknel, Yüksek, *Türkçe Dilbilgisinin Yeni Tertibi*, 2014.

Gülsün, Mehmet, *A1-A2-b1 Yabancılar İçin Türkçe Dil Bilgisi*, Gazi Üniversitesi, Türkçe Öğrenim, Araştırma ve Uygulama Merkezi, Gazi Üniversitesi Tömer, 2. Basım, kalkan Matbaacılık, Ankara, 2014.

Güner, Galip, *Kıpçak Türkçesi Grameri*, Kesit Yay., İstanbul, 2013.

Hacî, Viyan Silêman, *Kereste Betalekan le Riwaney Tiyorî Deslat û Bestinewe ((Şêwezarî Kirmancî Serû ))*, Namey Diktora, Kolîjî Ziman, Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 2007.

Hengirmen, Mehmet, *Türkçe Temel Dilbilgisi*, V. Baskı, Engin yayın evi, Ankara, 2006.

Îbo, Viyan İbrahîm Elî, *Taybetiyên Hevalnavî di Zimanê Kurdî da (Diyalêkta Serî – Govera Behdînî)*, Nama Masterê (Teza Masterê ya Çap Nebûyî), Kolîja Adab, Zankoya Duhok, Duhok, 2008.

Jardine, Captain R. F., *Bahdinan Kurmanji*, Printed at the Government Press, 1922.

Karağaç, Günay *Türkçenin Dil Bilgisi*, 1. Baskı, Erek Matbaası, Akçağ Yayınları, Ankara, 2012.

Karahan, Leyla, *Türkçede Söz Dizimi*, 16. Baskı, Erek Matbaası, Akçağ Yayınları , Ankara, 2011.

Kolcu, Hasan, *Türk Dili*, 4 Baskı, Umuttepe Yayınları, Koceli Üniversitesi, 2013.

Korkmaz, Zeyneb, *Grammer Terimleri Sözlüğü*, TDK yay., Ankara, 1992.

Korkmaz, Zeynep, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, 4. Baskı, TDK Yay., Ankara, 2014.

Kurd, Reşîd, *Rêzman A Ziman Ê Kurmancî*, Çapxaneya Kerem, 1956.

Kurdo, Qenatê, *Zimanê Kurdi Rêzman*, Weşanên Komkar, Frankfurt, 1981.

Kurduyêf, K. K., *Rêzmanê Kurdî be Kerestey Diyalêktî Kirmancî û Soranî*, Wergêranî Kurdistan Mukriyanî, Çapxana el – edîb el – bexdadî, Bexdad, 1984.

Lijnek ji Wezareta Perwerdê, *Ziman û Edebê Kurdî*, bo Pola Heştê Bineret, Çapa Çarê, Çapxana el-Destur ,Ordin.

Lijnek ji Wezareta Perwerdê, *Ziman û Edebê Kurdî*, bo Pola Yazdê Amadeyî, Çapa Duwê, Çapxana Dar Lubnan, Lubnan.

Lijney Ziman û Zanistekanî le Korî Zanyarî Kurd, *Rêzmanî Axawtinî Kurdî*, Çapî Duwem, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2011.

Marif, Ewrehman Hacî, *Rîzmanî Kurdî*, Bergî Yekam (Wişesazî) Beşî Sêyem (Awelnaw) , Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2014.

*Menahic Ilim el Loxe el Hedîse*, li vî lînkî:

[https://www.google.iq/search?source=hp&q=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&oq=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&gs\\_l=psy-ab.3..0i22i30k112.736101.736101.0.741615.1.1.0.0.0.879.879.6-1.1.0....0...1.1.64.psy-ab..0.1.878.fhOcNoUWadY](https://www.google.iq/search?source=hp&q=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&oq=%D9%85%D9%86%D8%A7%D9%87%D8%AC+%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AD%D8%AF%D9%8A%D8%AB%D8%A9&gs_l=psy-ab.3..0i22i30k112.736101.736101.0.741615.1.1.0.0.0.879.879.6-1.1.0....0...1.1.64.psy-ab..0.1.878.fhOcNoUWadY)

Meric, Deniz, *Temel Türkçe Dilbilgisi*, Fono Yayınları, Ekosan Matbaacılık, İstanbul, 2011.

Mihemed, Hatem Wilya, *Firêzî Nawî û Firêzî Karî le Kirmancî Jûrû da*, Namey Macistêr (Teza Masterê ya Çap Nebûyî) , Kolîjî Ziman, Zankoy Silêmanî, Silêmanî, 2000.

Mihemed, Hîdayet Ebdulla, *Rêkewtinî Watayî Naw û Awelnaw le Zimanî Kurdî da*, Namey Diktora (Teza Masterê ya Çap Nebûyî), Kulîjî Ziman, Zankoy Silêmanî, Silêmanî, 2002.

Mihemed, Segvan Cemîl, *Morfîma ( -a ) û taybetmendiyên Wê di Kurmanciya Jorî da*, Nama Masterê (Teza Masterê ya Çap Nebûyî), Kolîja Adabê, Zankoya Duhokê, Duhok, 2008.

Mihyedîn, Baziyan Yunis, *Peywendî Astî Morfolocî be Astî Fonolocî û Sîntaks*, Piley Master (Teza Masterê ya Çap Nebûyî), Zankoy Selahedîn, Kolîjî Ziman, Hewlêr, 2008.

Nazê, Bavê, *Rêzmana Kurdî (Tiyurî û Piraktîk)* , Çapxana Hewar, Duhok, 2012.

Ocek, Nezîr, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Çapa Yekemîn, Kayhan Matbaacılık, İstanbul.

Omer, Fazil, *Çend Awirek li Zimanê Kurdî*, Çapa Êkê, Çapxana Wezaretê Perwerdê, Hewlêr, 2004.

Omer, Fazil, *Gîrekên Zimanê Kurdî*, Çapî Êkem, Çapxana Wezaretê Perwerdê – Hewlêr, Hewlêr, 2005.

Öztürk, Erol, û(komosyon), *Üniversiteler İçin Türk Dili Yazılı ve Sözlü Anlatım*,1. Baskı, Akçağ Yayınları, Ankara, 2013.

Salih, Tarîq, *Çend Serencêkî Zimanewanî*, Çapî Yekem, Çapxaney Mukriyanî, Hewlêr, 2008.

Samwêl Odlî Rey, Vegohaztin ji Elfa Bêya Latînî: Evraz Hisîn, *Zimanê Kurdî Devoka Hekariya* , Çapa Êkê, Çapxana Hecî Haşim, Hewlêr, 2007

Selîm, Zêrîn Xorşîd, *Elomorf di Zimanê Kurdî da*, Çapa Êkê, Çapxaneya Xanî, Duhok, 2012.

Seylan, Mehmet, Feyzullah Çelikbağ, *Türkçe (Dil ve Anlatım) El Kitabı*, Ertem Matbaası, LMT Limit Yayınları, Ankara, tarih yok.

Tan, Samî, *Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çapxane Gün Matbaacılık, İstanbul, 2011.

Taş, Çetîn, *Waneyên Rêziman Û Rastnivîsa Kurmancî*, Çapa Duyemîn, Çap berdan Metbe'sî, İstanbul, 2013.

Tutku, Yılmaztürk, *Sözcük Türleri Sıfatlar ve Zamirler*, 05/12/ 2012, Bilgisayar, Gedik, Nuray.

Ulukan, Gökhan, *Türk Dili ve Edebiyatı Öğrt.*

www. Edebiyat Öğretmeni. Org, *Türk Edebiyatı-Dil ve Anlatım Dersleri için Kaynak site*, 10. Sınıfdil ve Anlatım Ders Notları.

Xorşîd, Xazî Elî, *Rêzmanî Fermî*, Çapî Yekem, Çapxaney Serdem, Silêmanî, 2013.

Xoşnaw, Nerîman, *Rêzmana Kurdî (Kirmacnî Serû)*, Çapa Yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2015.

*Yabancılar İçin Türkçe Dil Bilgisi*, Gazi Üniversitesi Türkçe Öğrenim Araştırma ve Uygulama Merkezi, Gazi Üniversitesi Tömer, Ankara.

Yıldırım, Kadri, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehcesi)*, Çapa Duwê, Berdan Matbaacılık, İstanbul, 2012.

Yıldırım, Yusuf, *Türk Dili ve Anlatım Türleri*, Der Yayınları, İstanbul, 2010.

Yılmaz, Ömer, *Kelime Türleri ile İlgili Yaklaşımlar ( Akademik Eserler-Üniversite Hazırlık Kitapları)*, Sakarya Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yeni Türk Dili, Yüksek Lisans Tezi, 2008.

Yukî Soryadarma, *el Miqarine beyn Ilim el Loxe el Teqabilî we Tehlîl el exta*, li vî lînkî:

<https://www.google.iq/search?q=%D8%B9%D9%84%D9%85+%D8%A7%D9%84%D9%84%D8%BA%D8%A9+%D8%A7%D9%84%D8%AA%D9%82%D8%A7%D8%A8%D9%84%D9%8A&oq=%D8%B9%D9%84%D9%85&aqs=chrome.2.69i57j69i61j69i59j69i6112j0.4564j0j4&sourceid=chrome&ie=UTF-8>

Zaxoyî, İbrahîm Remezan, *Rêzmana Kurdî – Qewaid el – Loxe el – Kurdiye*, Çapa Êkê, Çapxan Xanî, Dohuk, 2008.



جمهورية تركيا

جامعة ارتوكلوماردين

معهد اللغات الحية في تركيا

قسم اللغة و التراث الكوردي

## الصفة ما بين اللغة التركية و الكردية (الكرمانجية الشمالية)

رسالة مقدمة

الى مجلس جامعة ماردين ارتوكلو - معهد اللغات الحية في تركيا-قسم للغة و التراث الكورديكجزء من متطلبات  
نيل شهادة الماجستير في اللغة الكوردي

من قبل الطالب

برقي طاهر بازيد

بإشراف

د.تاهرخان أيدين

2017ماردين



**Republic of Turkey**

**Mardin Artuklu University**

**Institute of Living Languages**

**Dept. of Kurdish Language and Culture**

**The Comparison between Kurdish (The Badini Dialect) and  
Turkish Adjectives**

**A Thesis Submitted**

**To The Council of Mardin Artuklu University – Institute of Living Languages-  
Department of Kurdish Language and Culture.**

**In Partial Fulfillment of The Requirements of Master in Kurdish Language**

**BY:**

**Berqee Taher Bazid**

**Supervised BY:**

**Dr. Tahirkhan Aydin**

**Mardin-2017**





**T.C.**

**Mardin Artuklu Üniversitesi**

**Yaşayan Diller Enstitüsü**

**Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı**

**Yüksek Lisans Tezi**

**KÜRTÇE (KURMANCİ LEHCESİ) VE TÜRKÇE  
SIFATLARIN KARŞILAŞTIRILMASI**

**Berqee Taher Bazid**

**14711043**

**Danışman**

**Doç. Dr. Tahirhan AYDIN**

**Mardin-2017**